K.T.
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

# TEKNÎKA VEGOTINÊ DI ROMANÊ DE (*MÎRNAME* YA JAN DOST WEK MÎNAK)

TEZA LÎSANSA BILIND

Hawkar Mohammed RASHID

VAN – 2016

T.C
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

# JAN DOST'UN *MÎRNAME* ROMANINDA ANLATIM TEKNİĞİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN
Hawkar Mohammed RASHID

DANIŞMAN
Yrd. Doç. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ

VAN-2016

K.T.
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

# TEKNÎKA VEGOTINÊ DI ROMANÊ DE (*MÎRNAME* YA JAN DOST WEK MÎNAK)

TEZA LÎSANSA BILIND

**Amadekar**
Hawkar Mohammad RASHID

**Şêwirmend**
Alk. Doç. Dr. Abdullhadî Timurtaş

VAN – 2016

# NAVEROK

NAVEROK ..... I

Pêşgotin ..... IV

KURTKIRIN ..... VI

1. Destpêk ..... 1

1.1. Têgeh û Tarîfa Vegotinê ..... 1

1.2. Girîngiya Vegotinê ..... 4

1.3. Pêkhateyên Vegotinê ..... 6

1.3.1. Vebêjer(Narrator) ..... 7

1.3.2. Vegotî (Tekst) ..... 8

1.3.3. Jê re Vegotî(Lislener) ..... 8

2. Şêwaz û Nerîngeha Vegotinê ..... 10

2.1. Şêwazên Vegotinê ..... 10

2.1.1. Vegotina Babetî (Objektîv) ..... 10

2.1.2. Vegotina Xweyî ( Subjective ) ..... 13

2.2. Nerîngeha Vegotinê û Cureyên Vebêjer ..... 16

2.2.1. Têgeh û Pênaseya Nerîngehê (Point of View) ..... 16

2.2.2. Cureyên Nerîngehê ..... 18

2.2.2.1. Dîtin ji Paş ve (Vebêjerê Hertiştzan) ..... 19

2.2.2.2. Dîtin Ligel (Vebêjerê Hemantiştzan) ..... 23

2.2.2.3. Dîtin ji Derve (Vebêjerê Kêmtiştzan) ..... 31

3. Dema Vegotinê ..... 34

3.1. Beşên Dema Vegotinê ..... 36

3.1.1. Dema Dîrokî(Historical) ..... 36

3.1.2. Dema Derûnî (Pîskolojî) ..... 40

3.1.3. Dema Efsaneyî (Xurafî) ........ 42
3.2. Dem di Aliyê Rabirdû , Niha û Dahatûyê De ........ 42
3.2.1. Vegerandin(Flash Back) ........ 43
3.2.1.1. Vegerandina Derveyî ........ 44
3.2.1.2. Vegerandina Navxweyî ........ 45
3.2.1.3. Vegerandina Têkil ........ 46
3.2.2. Pêşxistin, Pêşbînî(Prediction) ........ 46
3.2.2.1. Pêşxistina Wan Buyerên Ku di Dahatû de ru Didin ........ 48
3.2.2.2. Pêşxistina Wan Bûyerên Ku di Dahatû de rû Nedin ........ 49
3.3. Dem di Aliya Lezgînî û Sistîyê de ........ 49
3.3.1. Xurtî Yan Lezgînya Dema Vegotinê ........ 49
3.3.1.1. Kurtkirin(Reducing) ........ 49
3.3.1.2. Rakirin, Nehêlan(Cutting) ........ 51
3.3.1.2.1. Rakirina Diyarîkirî (Eşkere) ........ 51
3.3.1.2.2. Rakirin An Nehêlana Diyarnekirî (Veşartî) ........ 52
3.3.2. Sistiya Dema Vegotinê ........ 53
3.3.2.1. Dîmen ........ 53
3.3.2.1.1. Dîmena Wêneyî ........ 54
3.3.2.1.2. Dîmena Panoramayî (Dramî) ........ 54
3.3.2.2. Wesf ........ 57
3.3.2.2.1. Wesfa Karakteran ........ 58
3.3.2.2.2. Wesfa Cih ........ 61
3.3.2.2.3. Wesfa Ruhberan (Heywan) ........ 62
3.3.2.2.4. Wesfa Tişt û Kelûpelan ........ 63
3.4. Dem di Aliyê Pêwendiyên Dubarebûnê de ........ 65
3.4.1. Yekcarê Vegotina Wan Bûyerên Ku Yekcarê rû Ridin ........ 66

3.4.2. Vegotina Çend Carekê ya Wan Bûyerên Ku Çend Caran rû Didin .................... 66
3.4.3. Vegotina Çend Carekê ya Wan Bûyerên Ku Yekcarê rû Didin .......................... 67
3.4.4. Yekcar Vegotina Wan Bûyerên Ku Çend Caran rû Dane .................................. 68
4. Vegotina Bûyerê ........................................................................................ 70
4.1. Têgeh û Pênaseya Bûyerê ........................................................................ 70
4.2. Binyatên Vegotina Bûyerê ........................................................................ 72
4.2.1. Binyata Zincîreyî (Texlîdî) .................................................................... 72
4.2.2. Binyata Têkilîhev ..................................................................................... 75
4.2.3. Binyata Hevterîb (Paralel) ....................................................................... 77
4.2.3.1. Hevterîbî Di Hîkayetê De ..................................................................... 78
4.2.3.2. Hevterîbî Di Vebêjer De ....................................................................... 79
4.2.4. Binyata Têhelkêş (Hêwirandin) ................................................................ 80
4.2.5. Binyata Bazineyî ...................................................................................... 88
ENCAM ............................................................................................................ 95
JÊDER .............................................................................................................. 96
ÖZET ................................................................................................................ 102
PUXTE .............................................................................................................. 103
ABSTRACT ...................................................................................................... 104

**Pêşgotin**

Romana *Mîrname* yek ji berhemên nivîskar Jan Dost e. Cara yekem ev roman bi Kurmancî di sala 2008an de li Stenbolê hate weşandin. Vê romanê zû bala xwîneran kişand û piştî çend salan hate guhastin bo zaravaya Kurmanciya Jêrîn "Soranî" ji layê wegêra mezin Sebah Îsma‘îl ve û dûre ev roman bi zimanê erebî û farsî jî hate çapkirin. *Mîrname* ku behsa pêwendiya navbera desthilat û rewşenbîr dike, wek sembola vê pêwendiyê jî Ehmedê Xanî 1651- 1707z aniye. Ehmedê Xanî di vê romanê de wek deng amadebûna wî kêm e, lê wek statû û girîngî di dirustbûna bûyeran de mîhwera sereke ya romanê pêk tîne. Ev roman ku ji 23 beşan pêk tê, ji bilî beşê yekem û dawî yê romanê, 21 karakter di vegotina bûyerên romanê de beşdar in bi şêweyekî her yek ji van karakteran zanyariyeke nû li ser Ehmedê Xanî û jiyan û rewşenbîrî û bîr û baweriyên wî dide me. Bi tevahî vebêjer wêneyeke rengîn û seranserî li ser Ehmedê Xanî ji me re dikşînin. Di her beşekî de karakterek bi erkê vegotina romanê radibe. Her yek ji van karakteran jî li gor dîtin û bawerî û nerîna xwe li mirina Xanî dinere. Lewra bi xwendina her beşekî romanê re, zanyariyeke nû li ser awayê mirina helbestvan tê bidestxistin.

Neteweya Kurd wek her neteweyeke din a xwedî edebiyateke kevin, ji hilmijîna bîr û baweriyên neteweyên din û henaseya edebiyatên din bêpar nemaye û xwe daye ber şepêla edebiyatên din ên dinyayê bi mebesta nûbûn û guherînê û da ku ji qada edebiyat û ziman û rewşenbîrî û piraniya warên din li paş nemîne. Her ji destpêkê ve Kurd ketin bin bandora edebiyata erebî û farsî û tirkî û dûre jî edebiyata ewropî. Tiştê ku hertim bo edebiyata kurdî cihê şanaziyê ye, ew e ku hembêza xwe bo hilm û bayê edebiyatên biyanî vekiriye. Xuya ye ev jî xaleke girîng e bo pêşketina regezên edebiyatê bi giştî û janra romanê bi taybetî, ku niha cihê girîngiyeke zêde ya nivîskar û rexnegirên edebiyatê ye. Ev jî vedigere wê yekê ku niha ev janr roman, bi mikurhatina piraniya rexnegirên Rojava, pêşenga hemû janrên din ên edebiyatê ye.

Babeta vegotinê tevî hemû girîngiya wê di pêkhatina romanê de, lê heta niha di edebiyata kurdî de, lêkolînên akademî bi zaravaya Kurmancî di vî warî de nayên dîtin. Lewma armanca me ew e bi rêya vê lêkolînê, eger kêmasiyên wê jî hebin, bikarim tiştekî bikim û sûdê bigihînim rexnegir û nivîskarên warê çîrok û romanê, da agahiyan wan li ser pêkhateyên romanê berfirehtir bibin. Çimkî vegotin stûna dirustbûna romanê ye û hebûna hemû regezên din girêdayî vegotinê ye. Vegotin hemû regezên din ên romanê li xwe digre.

Rêbaza lêkolîna me rêbazeke rexneyî ya teorî û pratîk e û me bêhtir hewl daye ji regeza vegotinê derbasî teksta romana *Mîrname* bibin. Yanî li gor regeza vegotinê me mînak ji teksta romanê wergirtine.

Lêkolîna me Teknîka vegotinê di romanê de, *Mîrname* ya Jan Dost wek mînak, li ser destpêkeke teorî û sê beşan dabeş dibe. Di derbasgehê de, me tenê behsa aliyên teorî kiriye ku ji çemik – têgeh - û tarîfa vegotinê, girîngiya vegotinê û pêkhateyên vegotinê pêk tên. Beşê yekem, bi navnîşana şêwaz û nerîngeha "point of view" vegotinê li ser du xalên sereke dabeş dibe, wek şêwazên vegotinê û nerîngeha vebêjer. Di beşê duyem de bi navnîşana dema vegotinê ku me di çend xalên sereke de berhev kirine û me tê de behsa cureyên demê û dem li gor rabirdû û niha û dahatû û dem li gor lezgînî û sistbûnê û dem li gor pêwendiyên dubarekirinê kiriye. Beşê sêyem û dawî, bi navnîşana vegotina bûyerê ye. Ev beş li ser du xalên sereke hatiye dabeşkirin û tê de têgeh û tarîfa bûyerê û binyatên bûyerê hatine behskirin.Di dawî de jî, girîngtirîn encamên ku em di lêkolînê de gihîştine wan hatine diyarkirin. Dûre puxte yan kurtasiya têzê bi zimanê kurdî û bi zimanên tirkî û ingilîzî hatiye nivîsandin.

Di dawî de Ez pir spasiya Dr. Abdulhadî TÎMURTAŞ dikim ku erkê serpereştiya têzê li stûyê xwe girt, wek erkekî pîroz bi min re westiya. Ez hêvî dikim temenê wî dirêj be ji bo xizmetkirina edebiyata kurdî. herweha Ez pir spasiya Dr. Celal Enwer dikim ku her car bi dilekî fireh pêşwaziya min kir û bi rêya mobaylê bersiva hemû pirsên min da. Bi rastî ez çi jî jê re binivîsim nagihe bilindî û rêzdariya wî.

Hawker Mohammed

VAN 2016

## KURTKIRIN

**J** : **Jimare**

**R** : **Rûpel**

**W** : **Wergêr**

**Ç** : **Çap**

**T** : **Tabî‘e**

**TER** : **Terceme**

**S.L.X.** : **Silavên Xudê Lê Bin**

# 1. Destpêk

## 1.1.Têgeh û Tarîfa Vegotinê

Edebiyat biawayekî giştî û roman bi taybetî ji çend aliyan pêk tên ku pêwendiyeke bihêz wan aliyan bi hev re girêdide û her aliyek ji van aliyan dikeve bin bandora aliyên din û bi hev ve tên girêdan. Lê derbarê aliyê vegotinê, ez dikarim bêjim ji bilî ku tuxmekî mezin ê romanê ye, bandoreke berçav jî li ser aliyên din ên romanê dike. Di romana kurdî de, ev diyarde bi awayekî eşkere tê dîtin "*eşkere ye şêweya vegotinê serdê, bi dirêjiya 45 salên borî, ev huner di edebiyata me de û di hemû pileyên derketin û vegeşbûna wê de serdest û serwer bû.*"[1]

Dijanra romanê de meseleya vegotinê pir bi girîngî hatiye dîtin û behskirin. Ev girîngiya binemaya vegotinê di romanê de wiha kiriye ku ji aliyekî ve, bêhtirî tarîfekê ji bo vê têgehê bê kirin û ji aliyê din ve jî ji ber ku vegotin ne wek zanist, lê wek hunera teksta edebî tê dîtin, lewma dikare çend tarîf an pênaseyên cuda li xwe bigre. Ev bi bawerî û mikurhatina piraniya nivîskar û rexnegiran, lewma li gor me jî her heman tişt e. Li vir em dê hewl bidin çend tarîfên girîng û bibandor bo vê têgehê destnîşan bikin.

Vegotin: "*Proseyeke ji wan proseyên ku her yek ji me di jiyana xwe ya rojane de wê bi şêweyeke berfireh û berdewam pratîze dike û pişta xwe pê girêdide û dîroka derketina wê hemdem e ligel dîroka dirustbûna ziman, çimkî vegotin vegotina bûyerekê yan çend bûyeran an nûçeyekê yan bêhtirî nûçeyekê ye ku çavkaniya wê rasteqînan destçêker û afirandina xeyalê be.*"[2], "*di vegotinê de, her mirovekşêwaza wî ya taybet heye.*"[3]

Bi vî rengî girîngiya vê babetê û dîroka derketina vê têgehê zelal dibe ku dîrokeke wê ya kevin heye û ne tenê girêdayî têgeha edebî ye, lê proseyeke şaristanî ye û mirov her ji destpêkê ve û di çaxên kevin de ev têgeh wek hunereke axaftinê û ji bo birêvebirina karûbarên xwe yên rojane bikar aniye "*çimkî mirovê kevin di vegotina ezmûnên jiyana xwe de, tenê*

---

[1] 'Arif, Hisên, " Şêweyên Teknîkê Di Çîroka Salên Piştî 1970 de " ,*Kovara Roşinbîrî Niwê*, j. 63 Îlon û Cotmeha 1970, r. 7.
[2] Mihemed, Mîran Celal, *Binyata Bûyerê Di Romana Kurdî de*, Çapxaneya Renc, Ç. 1 , Silêmanî, 2009, r. 155.
[3] Bubîş, 'Îze ed-Dîn, "Fî Nezeriye es-Serd we Tehlîl al-Xetabe", m.*el-Meuqîf el-Edebî*, dîmeşq, 'Eded (380), 2002, www.awn_dam.org/mokifadabiy/380/mokf380-002.htm.Lênêrîn (17-1-2016).

*behsa dema borî û dema niha dike, em dibînin siberoj wek navçeyeke nediyar di zihniyeta wî de maye.*”[4]

Vegotin (Narrative): “*Yek ji binyatên sereke yên tekstê ye û bi şêweyeke estetîk temamiya tekstê birêve dibe û aliyên hunerî yên din bi hev ve girêdide.Herwiha bûyer û helwestan ji wêneyeke realîst vediguhêze wêneyeke zimanvanî, ku bi awayekî guhdar an xwîner wiha hest bike ku van bûyer û helwestan dibîne û li ber çavên wî diqewimin*.”[5]

Pêwistiyeke berçav a her teksteke edebî bi babeta vegotinê heye û ti teksteke edebî bêyî vê babetê nîne, tew di helbestan de jî heye “*Dema helbestvanhelbestekê dinivîse, dixwaze bi helbestê tiştekî vebêje, wek çawa çîroknivîs jî tiştekî vedibêje lê bi pexşanê*.”[6], lewma em dikarin bêjin teksta edebî di vî warî de ango di warê vegotinê de gelekî dewlemend e.

Vegotin: “*Mebest ji vegotinê ew binemayên sereke û balkêş in ku, mirov her ji destpêka hebûna xwe ve hertim di hewla vegotina wan de ye. Ango vegotin kirdarek e bo derbirîna bûyer û serpêhatiyan*.” [7] Paul Ricœur jî “*Vegotinwek yek ji rêyên afirandin û nasîna wateyê daye nasîn*.”[8]

Çend tarîf û pênaseyên din û cuda bo proseya vegotinê hatine kirin di nav rexnegiran de çimkî ne babeteke cihgirtî ye û her nivîskarekî bi dîtina xwe berê xwe daye vê babetê û bi rengekî ji rengan li gor dîtin û nerîna xwe ev babet daye nasîn. Lê tevî cudahiyên zêde derbarê vê babetê, di dawî de hemû pênase di naverokê de heman tişt in û ti yek ji wan nikare girîngiya vê babetê înkar bike. Çimkî li gor me jî ruhê her romanekê yan başî û xirabiya her romanekê girêdayî şêweya vegotina wê ye, ku bingeha dirustbûna romanê ye. “*Lewma eger romanek ne xwedan vegotineke serkeftî be, nabe romaneke serkeftî, ji ber ku cureya vegotina romanê vedigere ser zihniyeta romannivîs li hemberkêşeya pêwendiya wî bi berhema wî*

---

[4]Sabr, Mehdî Ceber, *Bîna' er-Rîwaye el-'Erebîye Fî el-Kwêt (1962-1988*), Rîsale Macstîr, Kliye el-Adab, Camî'e el-Bera, 1989, r.58.

[5] Bekir, Hîmdad Hisên – Sebrî, Razaw Reşîd, “Têgeh û Regezên Çîroka Zarokan di Edebiyata Kurdî de (1991-2005)”,*Kovara Akademya Kurdî*, j. 7, Kurdistan, Hewlêr, r. 113-114.

[6] Hesen, Hemese'îd,*Hizr û Şêwaz Di Çîroka Kurdî de*, Çapxaneya Aras, Ç. 1 , Hewlêr, 2005, r. 92.

[7] Xidr, Rêzan Rehman, *Teknîka Vegotinê Di Romanên (Ebdulla Serac) de*, Çapxaneya Rojhelat, Ç. 1, Hewlêr, 2012, r. 35.

[8] Ye'qûbî, Ebdilxaliq, *Dengê Bilûrînî yê Tekstê*, Rêveberiya Giştî ya Çap û Belavkirina Silêmaniyê, 2005, r. 73.

*re.*"[9]Meseleya vegotina romanê û romannivîs û xwîner pêwendiyeke bihêz û têkilîhev e û bandorê li ser hevdikin "*wezîfeya vegotinê jî ne tenê ew e, lê vegotin dikare xwedan sihrekê be bo kişandina xwîner li pey wê babeta ku berçav dike.*"[10] wek têgeh jî di edebiyata kurdî de Hejar Mukiryanî di Ferhenga *Henbane Borîne* de dibêje: "*Vegotin, vegotin jî tê wateya behsakirina axaftina gotî.*"[11]

Di nameya masterê ya Celal Enwer Se'îd de *Teknîka vegotinê di romana Êvara Perwaneyê ya Bextiyar Elî*de, vegotin wek têgeheke rexneyî bi vî rengî hatiye pênasekirin "*Wek têgeheke rexneyî vegotin, wek aliyê duyem ji dueta metinê hîkayet/binyata hîkayetê li ba formalîstên rûs, yan aliyê duyem ji dueta çîrok/vegotin li ba binyatgerên nû yên wekTodorov, Jennette, Rikardo û hin kesên din, pêk tê ji rêya yan çawaniya nîşandana (…….) yan zincîreke bi dû hevde hatî ya bûyerên rast û xeyalî ye bi rêya vebêjerekî yan bêhtir, ku armanca wî wênegirtina rewşa dûr û dirêj a bûyer û qeyranan e.*"[12]

Herwekî me îşaret pê da nasandin û pênasekirina teknîka vegotinê ji hêla nivîskaran ve ji bilî ku cuda ne di heman demê de pirreng û curbicur in û tenê pênaseyek tune bo vê têgehê, ligel vê yekê jî amajekirina bi bedewî û başî bo pênaseya vegotinê dibe ku me tûşî çewtiyeke rexneyî bike çimkî her pênaseyek xwedî watedarî û bedewiya xwe ye.

Celal Enwer Se'îd dibêje: "*Dibe ku bedewtirîn danasîna vegotinê ew danasîna Can Lofîf be ku di wê baweriyê de ye vegotin pêk tê ji: her peyvek ku cîhanekê vedigere bo zihn ku ji her du rehendên cîhana şênber û moralî wek cîhaneke rast hatibe wergirtin dikeve cih û demeke destnîşankirî de û piraniya caran jî bi awayekî hilgeriyayî, bi rêya lênerîna karakterekî yan zêdetir tê pêşkêşkirin. Tevî lênerîna vebêjer bi cudahî ligel helbestê.*"[13]

---

[9]Xidr, *Teknîka Vegotinê di romanê*, r. 35.
[10] Bekir – Sebrî, "Têgeh û Regezên Çîroka Zarokan", r. 114.
[11] Mukiryanî, Hejar, *Henbane Borîne, Ferhenga Kurdî-Farsî*, Çapxaneya Tehran, Ç. 5, 1385, r. 741.
[12] Se'îd, Celal Enwer, *Teknîka Vegotinê Di Romana (Êvara Perwaneyê) ya (Bextiyar Elî) de*, Nameya Masterê, Koleja Perwerdeya (Ibn Ruşd), Zanîngeha Bexda, 2006, r. 5.
[13]Se'îd, Teknîka Vegotinê, r. 5.

### 1.2. Girîngiya Vegotinê

Em dixwazin ji vê nerîna Alain Robbe-Grillet derbarê girîngiya vegotinê dest pê bikin ku dibêje: "*Çîroknivîsê rasteqîn ew kes e ku dizane çawa çîrokê vebêje.*"[14] Ji vê nerînê ew yek zelal dibe ku vegotina baş û serkeftî çîroknivîs û romannivîsê serkeftî berhem tîne.

Di hemû janrên edebiyatê de û bi taybetî di romanê de, proseya vegotinê xwedî girîngiyeke mezin e. Çimkî eger em binerin her metinek derbirîn e ji bîr û bawerî û lênerîna nivîskarekî li hember bûyer û diyardeyên curbicur ên di metineke edebî de, yan bo derbirîna hesta derûnî ya nivîskarekî li hember bûyer û diyardeyên curbicur "*Îro vegotin wek yek ji girîngtirîn binemayên hunerî yên teksta her çîrokekê tê hejmartin û mercê serkeftina her karekî edebî jî heta radeyeke mezin tê girêdan bi cureyê wê rêya ku hevokên wê pê tên rastkirin û vegotin, çimkî di edebiyatê de em rastî tişt û bûyeran di şêweya wan a seretayî de nayên, lê bi şêweyeke destnîşankirî tên pêşkêşkirin.*"[15]

Divê nivîskarê teksta romanê, pir bi hişyarî û miqateyî girîngiyê bide vegotinê. Çimkî wek me berê jî got, têkiliyeke bihêz di navbera nivîskar û şêwaza wî ya vegotinê de heye. Di edebiyata kurdî de pir in ew romanên ku xwîner ji xwendina wan bêzar û bêtaqet dibin û hêj zû û di destpêkê de dev ji xwendina wan berdidin. Divê em zanibin ku nivîsandina romanê ne karekî wiha hêsan e û xwendina romanê jîbi hêsanî pêk nayê "*Ev rewş di xwendina romanên sedsala 19an de xuya dikir ku her romanek bi çend cildan dihat nivîsandin û çapkirin. Lê di romanên sedsala bîstan de ev rewş kêmtir bû û diyardeya romana kurt derkete holê. Lê di hemû rewşan de xwendina romanê wek karekî hêsan nayê dîtin, lewra em dibînin ku romannivîsê brîtanî Somerset Maugham tekeziyê li ser wê yekê dike kuEger xwendina romanê karekî giran be, êdî nexwendina wê baştir e.*"[16]

Divê ew rastî li ber çav bê girtin ku romana baş û xwedî xwîner qet ne girêdayî mezinî û qebareya romanê ye. Lê tiştê ku ast û pileya romanê bilind dike tenê şêwaz û teknîkên din ên vegotinê ne. Xuya ye li tenişta wê mebesta Somerset Maugham bo xwîner ku divê di

---

[14]Burinuf, Rulan û Ewîliye, Riyal, *'Alem er-Rîwaye*, Ter. et-Tekerlî, Mirace'e : Fuad et-Tekerlî û D.Muhsîn el-Musewî, Dar eş-Şiwn es-Seqafîye el-'Ame, T. 1, Bexdad 1991, r. 37.
[15] Sabir, Perêz, *Bînaya Hunerî ya Çîroka Kurdî Ji Destpêkê Heta Dawiya Cenga Duyem a Cîhanê*, Dezgeha Çap û Belavkirinê ya Serdem, Silêmanî, 2005, r. 211.
[16] Germiyanî, 'Adil, "Gelo Serdema Romanê Ber bi Nemanê Diçe", *Kovara Karwan*, j.131, 1991, r.2.

xwendina romanê de xwedî sebr û bêhneke fireh be, nabe em wê yekê jî ji bîr bikin ku mercê bêhnfirehiya xwîner bo romanê girêdayî şêwaza vegotinê û girîngîdana romannivîs bi proseya vegotinê ye. Ji bo vê mebestê Hisên Sabir Elî di kitêba *Rengdana Realîzma Sihrî di Romanên Kake Mem Botanîde* dibêje: "*Bi baweriya me vegotin aliyekî girîng ê pêkhateya metinê romanê ye û babeteke serbixwe ye û pêwistiya wêbi lêkolînên serbixwe heye.*"[17]

Herwiha di cihekî din ê vê pirtûkê de, behsa girîngiya vegotinê li Amerîkaya Latîn dike û çawa vegotin bû faktor bo damezrandina nasnameyeke wan a taybet û dûrketina ji bandor û metodên Ewropayê û dibêje: "*Xaleke bihêz a derketina Realîzma Sihrî li Amerîkaya Latîn ji dirustkirina nasnameyeke taybet bi wan pêk dihat û dûrketina ji metod û huner û şêwazên naskirî yên nivîsandina romanê ku ji Ewropayê ji wan re çûbûn. Lewra vegotinê pişkeke mezin a wê dûrketinê ji binemayên naskirî yên romana ewropî wergirt û her zû hunera vegotinê ya Amerîkaya Latîn xwe ji çarçoveya ewropayî rizgar kir û bingeheke taybet ji xwe re damezrand ku kereste û malzemeyên wê yên herî sereke ji awirdana li kelepûra xwe û dûrketina ji bikaranîna rêjeyeke zêde ya diyalogê pêk hatibûn.*"[18]

Bi baweriya min, yekem pirsku rûbirûyî her danerekî romanê dibe ew e ku, kî û çawa romanê vedibêje? Ango vegotina romanê "*ew warê kêrhatî ye ku tê de û bi rêya wê proseya afirandina edebî û helbestvaniya karên wê ji her warekî din bêhtir derdikeve*"[19], kîjan rê di vegotinê de bikar aniye?Ev pirsjî çavkaniya wê di girîngî û naveroka vegotinê de derdikeve, herçiqasî rêyên vegotinê pir in herwek çawa James Joyce dibêje: Pênc milyon rê hene bo vegotina yek bûyerê li gor armanca ku em jê dixwazin.

Ji bo girîngiya vê babetê em dê gotara Roland Barthes bînin ku li jêr navê *Destpêkek bo vekolîna pêkhateyî ya vegotinê*pêşkêş kiriye û derbarê vegotinê û girîngiya wê dibêje: "*Vegotinên dinyayê bê hejmar in. Vegotin pêşî û beriya hertiştî ji janra edebî ya pirreng pêk tê ku di nav babetên curbicur de belav bûye. Wek ku mirov bêje çîrokên mirov ligel her mak û pêkhateyekê digunce……vegotin bi şêwe û dirûvên curbicur û bêhejmar di her serdem û cih û*

---

[17] Elî, Hisên Sabir, *Rengdana Realîzma Sihrî Di Romanên Kake Mem Botanî de*, Çapxaneya Lerya - Silêmanî, 2012, r. 227.
[18] Alî,*Rengdana Reayalîzma Sihrî,* r. 227-228.
[19]Swîdan, Samî, *Ebhas Fî en-Nes er-Rîwayî el-'Erebî*, T. 1, beyrut, 1986, r. 177.

*civakekê de amade ye. Li ti cihekî gelê bê vegotin nayê dîtin….bê awirdana li cudahiya navbera edebiyata baş û edebiyata xirab, babeteke navneteweyî, dîrokî û kultûrî ye: Vegotin rêk wek jiyanê ye, hertim heye.*”[20]

Ji aliyekî din ve, eger em binerin, rexnegir û danerên teoriyan ji kevin de, ji heyama Yûnaniyan û heta niha, vegotinê wek bingeha teksta edebî dibînin. Lê divê ew rastî jî li ber çav bê girtin ku herî kêm taybetmendiyên vegotinê di helbestan de de hene.

“*Derbarê diyarkirina girîngiya vegotinê, rexnegiran hewl daye erk û xwezaya vegotinê diyar bikin û ji wateya wê fêm bikin daku bikarin ast û cureyên wê lêkolîn bikin…. Lewma behskirina vegotinê behskirina ziman û vebêjerê hilgirê vî zimanî ye. Ji bo vê bingehê, pîvanek ji hêla Alain Robbe-Grilletve hatiye diyarkirin bo serkeftina berhemê, lewra dibêje: Nivîskarê rasteqîn ew kes e ku dizane çawa çîrokê vebêje. Bi vî rengî jî, teknîka vegotinê beşekî sereke ye di binyata teksta serkeftî de.*”[21]

### 1.3. Pêkhateyên Vegotinê

Piştî ku me behsa têgeh û pênaseya vegotinê kir, dûre jî me behsa girîngiya vegotinê kir, niha divê pêkhateya me ya vegotinê hebe, yanî kesek hebe teksteke vebêje ku ji wî kesî/ê re Vebêjer tê gotin. Pêwist e tiştek li ber destê wî kesî jî hebe bo vegotinê ku ji wî tiştî re jî vegotî tê gotin. Piştre vebêjer û vegotî arasteyî kesekî tên kirin ku jê re tê gotin jê re vegotî ango ew kesê ku tiştek jê re tê behskirin û vegotin. Ew jê re vegotî jî dibe ku xwînerê rasteqîn be yan xwînerê nav metinê be, yanî karakterekî romanê be. Em dikarin bi rêya vê nexşeyê vê pêkhateyê nîşan bidin:

*“Vebêjer → VegotîJê re Vegotî.*”[22] →

↓

(Roman)

Di vê nexşeyê de derdikeve ku pêwistiya proseya vegotinê bi sê pêkhateyên sereke heye ku em dê bi kurtî behsa her yekê ji wan bikin:

---

[20] Webster, Rager, *Vekolînên Teoriya Edebî*, W : Ebdilxaliq Yaqûbî, Çapxaneya Wezareta Perwerde, ç. 1, 2006, r. 92.
[21] Xidr, *Teknîka Vegotinê*, r. 36.
[22] Se‘îd, *Teknîka Vegotinê,* r. 9.

### 1.3.1. Vebêjer(Narrator)

Vebêjer di proseya vegotinê de bi rola sereke radibe û hokareke bo vekirina meraq û xeyalên xwînerê metineke romanê, û bandoreke wê ya berçav jî li ser rêgeha pêşveçûna bûyerên romanan heye û bi giştî ev pêkhateya romanê hewl dide her di destpêkê de bi çend peyv û hevokên bibandor proseya vegotinê birêve bibe, li vê gorê "*behskirina vegotinê di romanê de erkeke dikeve stûyê vebêjer, ji ber ku guhdana sereke ya karê vebêjer di cureyê vegotina wî de ye. Bi vî rengî jî têkiliya vebêjer bi hemû binyatên metinê romanê re heye. Lewra Todorov dibêje: Vebêjer bikerek e ku di hemû proseyên binyatkirinê de heye*."[23] Herwiha "*ne merc e ku navekî destnîşankirî yê vebêjer hebe. Lê pir caran bi rêya cînavê kesînî derdikeve, ku bûyer li ser zarê wî tên vegotin*."[24] Eşkere ye ku ne merc e nivîskarê romanê bi xwe bibe vebêjer. Dibe ku karakterek wek hemû karakterên din ên romanê bibe vebêjer. Lê tiştekî zelal û eşkere ye ku têkiliyeke xurt di navbera nivîskarê romanê û karakterên romanê de heye. Divê romannivîs agehdarî vebêjer be di kesayetiyê de. "*Vebêjer ruhbereke ji peyvan tê afirandin û tenê di nav bûyerên romanê de dijî. Berevajî nivîskarê romanê, ku ruhberekî rastîn e û ji goşt û hestiyan hatiye afirandin*."[25]

Her derbarê nivîskarê romanê û karakterê romanê di rola vebêjer de Gustave Flaubert di nameyekê de ji Lord Abieh Şantîsî re dibêje: "*Yek ji wan binemayên ku baweriya min pê tê ew e ku erkê nivîskar ew e ji xwe re nenivîse, lê divê şûntiliya hunermend wek a Xwedê be, ne dîtbar be û şiyana wî ya hertiştî hebe, bi awayekî li hemû şûnekêmirov hest pê bikin, lê wî nebînin*."[26] Di rexneya nû ya kurdî de pir caran tekezî li ser nebûna nivîskarê romanê tê kirin, wek rewşeke pêwist dibînin, lewra tê gotin "*romana baş ew roman e ku nivîskar tê de ne amade be. Nivîskarê romanê û vebêjerê romanê du tiştên cuda ne û her yek ji wan hebûneke wî ya serbixwe heye*."[27]

---

[23] Xidr, *Teknîka Vegotinê*, r. 37.
[24] Îbrahîm, Ebidalle, *es-Serdiye al-'Erebiye, Behis Fî el-Bunye as-Serdiye Lîlmewrus el-Hîkaya el-'Erebî*, el-Merekz es-Seqafî el-'Erebî, Dar el-Beyza, T. 1, Beyrut , 1992, r. 11.
[25] Yusa, Mariyu Barxas, *Rîsalet Rewayî eş-Şab*, Ter. Salh 'Elmanî, Dar el-Meda Lîseqafiye we en-Neşir, T. 1, Dîmaşq 2005, r. 44.
[26] Se'îd, *Teknîka Vegotinê*, r. 10.
[27] Se'îd, *Teknîka Vegotinê,* r. 10.

### 1.3.2. Vegotî (Tekst)

Yek ji pêkhênerên vegotinê ye, ku mebest jê metinê hîkayetê yan metinê çîrokê yan metinê romanê bi xwe ye. Pêkhateyeke wê ya şênber heye ku ji hêla vebêjer ve bi nerîneke taybet tê vegotin. Ango vegotin ji hêla vebêjer ve arasteyî jê re vegotî xwîner tê kirin.

"*Ango hertiştek ku ji zarê vebêjer derkeve ji bo pêkanîna çend bûyerên girêdayî çend karakteran, di çarçoveya dem û cihekî destnîşankirî de. Di romana vegotî de herdu aliyên binyat / naveroka hîkayetê ya Formalîstên Rûs bi eşkereyî derdikeve. Bi heman awayî herdu aliyên gotar/hîkayetan vegotin/hîkayet li ba Todorov û Jennettee û Rikardo derdikeve. Li wê gorê ku vegotin forma hîkayetê ye û vegotin û hîkayet jî herdu rûyên vegotî tekstê pêk tînin û bi awayekî pêwistî hev in, nabe di ti romanekê de, yek ji wan bêyî ya din derkeve.*"[28]

### 1.3.3. Jê re Vegotî(Lislener)

Pêkhateya sêyem e di proseya vegotinê de û têkiliyeke wê ya rasterast bi herdu pêkhateyên din ên vegotinê re heye. Ti yek ji van pêkhêneran nikare bêyî pêkhênerên din karê xwe pêk bîne.

"*Vebêjer û jê re vegotî du aliyên pêkhateya vegotinê ne. Ewê ku bi karê vegotinê radibe vebêjer e. Jê re vegotî jî ew e ku vegotin jê re tê arastekirin, ku wek vebêjer yek ji pêkhateyên karê vegotinê ye. Bi vî rengî şandin û arastekirina karê vegotinê di nav metinê de xilas nabe bêyî hebûna vebêjer ku cemserê şandinê ye û jê re vegotî ku cemserê wergirtinê ye. Lewma babeta vegotinê pevguherîneke ku binemaya wê arastekirin û wergirtin e. Lê nabe em rola jê re vegotî tenê wek wergirtin bibînin, çimkî karên wî ji wergirtinê pir zêdetir in.*"[29]

Da proseya vegotina romanê di asteke pir bilind de bimîne divê hersê pêkhênerên romanê tê de beşdar bin û têkiliyeke xurt di navbera wan de hebe. Pir caran ev têkilî digihe astekê ku pevguherîn di navbera vebêjer û jê re vegotî de tê kirin, herwekî çawa Dr. Adil Germiyanî di dersên xwe bo xwendekarên xwendina bilind de behsa wê têkilî û pevguherînê dike û dibêje:

---

[28]Se'îd,*Teknîka Vegotinê*, r. 11.
[29]Cemşîr, Yadgar Letîf, "Aktîviya Vebêjer bi Rêya Binyata Demê di Romana (Xemgîniya Bedew) a Tehsîn Germiyanî de", koleja Ziman, Beşê Zimanê Erebî, Zanîngeha Selahedîn – *Kovara Zanîngehê bo Zanistên Mirovî*, Cildê 18, j. 5, sala 2014, r. 15-16.

"*Di lîstika vegotinê de dibe ku di navbera vebêjer û jê re vegotî de pevguherînek bê kirin. Yanî vebêjer bibe jê re vegotî yan bi berevajî. Ango di romanê de hertim çavê me dikeve ser du cureyên karakteran vebêjer û jê re vegotî.*"[30]

YÖK

[30] Germiyanî, 'Adil, *Dersên Xwendina Bilind Di Warê Hunera Nivîsandina (Çîrok û Romanê) de*, Qonax/Mastera Edebiyata Kurdî, Sala Xwendinê (2014-2015), Bo Xwendekarên Xwendina Bilind, Li Zanîngehên (Germiyan, Çermo û Raperîn), r. 32.

## 2. Şêwaz ûNerîngeha Vegotinê

### 2.1.Şêwazên Vegotinê

Şêwazên vegotinê di nav metinê romanê de pir girîng in. Di romana nû de şêwaza vegotinê cihê guhdan û girîngiyeke berçav e. Çimkî divê em wê rastiyê bizanin ku romannivîs dikare bi saya şêwaza xwe ya vegotinê me bikşîne nav cîhana romana xwe.

Di dinyaya romanê de stîl û şêwazên vegotinê girêdayî cureyên vebêjer û wan bîr û bawerî û lênihêrînan in ku li ba wan hene ji bo vegotina romanan û dûrî û nêzîkbûna wan ji bûyer û cihê wan di romanê de. Rexnegir behsa du cureyên stîl an şêwazên vegotinê dikin:

#### 2.1.1. Vegotina Babetî (Objektîv)

Herwekî me li jor jî qal kir, cureyên şêwaza vegotinê girêdayî cureyê vebêjer û lênihêrîna wî ye ji bo vegotina romanê, ango: "*Eger hat û çîrokvebêj li derveyî çîrokê bû û ji cureyê wî çîrokvebêjî bû ku jê re tê gotin çîrokvebêjê hertiştzan û tenê li gor nerîngeha xwe têbîniya kesayetî û bûyeran bike û têbîniyan araste bike, ev dibe şêwaza vegotina babetî.*"[31] Di rewşeke din de jî şêwaza vegotinê dibe babetî eger "*çîrokvebêjê kêmtiştzan çîrokê vebêje ji ber ku ew tenê ji derve ve tiştan dibîne û kûr nabe nav hundirê kesayetiyan û naçe şûna wan û nizane ew li çi difkirin û hest bi çi dikin, lewra her li aliyê derve yê wan kesan radiweste û bi şêwazeke babetî çîrokê vedibêje.*"[32]

Di vegotina babetî de "*Nivîskar agehdarî hertiştî ye, tew hizr û hestên veşartî yên karakteran jî.*"[33] Bikaranîna vê şêwaz an stîla vegotinê pir caran li ba nivîskar û rexnegiran wek şêwazeke kevin û çavlêkirinê tê dîtin. Her ji ber vê yekê ku "*Vegotina babetî di aliyê dîrokî de cureyê vegotinê yê herî kevin e û çîrok û hîkayetên gelêrî bi vê şêwazê hatine vegotin û pêşkêşkirin. Di vê şêweya vegotinê de, vebêjer hewl dide hemû tiştan vegerîne bo sînorê desthilata xwe bi rêya niştecîbûn û xweveşartina di navbera kesayetiyên romanê de.*"[34] Herwiha stîla babetî "*bi serxwebûna vebêjer tê cudakirin, ji helwest û bûyerên wî yên*

---

[31] Sabir, *Bînaya Hunera Çîroka Kurdî,* r. 242.
[32]Sabir, *Bînaya Hunera Çîroka Kurdî*, r. 242-243.
[33]Fezil, Salh, *Asalîb es-Serdî Fî er-Rîwaye el-'Erbiye*, Dar el-Medî Lîseqafiye we en-Neşir, T.1, Dîmeşq 2003, r. 21.
[34] Mihemed,*Binyata Bûyerê*, r. 158.

*vegotî.*"[35] Piraniya nivîskar û rexnegiran li ser wê yekê li hev dikin ku reh û kokên vê cure û şêweya vegotinê vedigerin destanê. Ev jî bi belgeya ku cureya vebêjerê destanê, vebêjerê hertiştzane. Ev vebêjer jî zana ye û desthilateke wî ya mezin di birêvebirina karakter û bûyeran de heye.

Eger em binerin di şêwaza vegotina dastana *Mem û Zîn* a Ehmedê Xanî de, bi tevahî şêweya vegotina babetî tê de serdest e. Senger Şêx Mihemed Hacîdi pirtûka xwe ya bi navê*Binyata vegotinê di dastana Mem û Zîna Ehmedê Xanî û romana Bajarê Muzîkvanên Spî ya Bextiyar Elî* de vê yekê bi eşkereyî diyar dike û dibêje: "*Ji xeynî helbestvan ku bi xwe hîkayetbêjê dastanê ye, ti dengekî din nayê rabihîstin û helbestvan cînavê ew ê kesê sêyem ê tak bo vegotinê bikar tîne ku alîkariya helbestvan dike da pir bi serbestî û pirrengî behsa hemû kesayetî û malzemeyên di dastanê de bike. Tekdengî wiha li helbestvan dike li derveyî berhemê raweste û bi xwe nebe beşek ji metinê, di heman demê de ew şiyana wî hebe çawa bixwaze bi vê şêwazê metinê binivîse. Çimkî pirdengî û hebûna hîkayetbêjên cuda ligel xwezaya dastanê li hev nake.*"[36]

Bi rengekî giştî ji bo nasîna şêwaza vegotinê di çîrok û romanê de, nivîskarên warê çîrok û romanê ji bo nasîna bikaranîna şêwazên vegotinê, bi rêya bikaranîna cînavan vê babetê şîrove dikin.

"*Ji bo vegotina çîrokê du şêwe hene:*

*1. Şêweya kesê sêyem ê tek.*

*2. Şêweya yekem kesê tek.*"[37]

Ji tiştê li jor diyar dibe ku şêwaza vegotina babetî dikare bê nasandin wek şêweya sêyem ê tek, ango bikaranîna cînavê kesê serbixwe ew di rewşa xwerû de yan wî bo nêr û wê bo mê di rewşa tewandî de. Hêjayî gotinê ye ku ev cînav di Kurmanciya jêrîn Soranî de, ji bo

---

[35]Brinis, Cîrald, *el-Misteleh es-Serdî Mu'cem el-Mistelehat,* Ter. 'Abid el-xiznedar, el-Meclîs el-E'la Lîlseqafe, 2003, r. 163.

[36] Hacî, Senger Qadir Şêx Mihemed, *Binyata Vegotinê Di Dastana (Mem û Zîn) a Ehmedê Xanî û Romana (Bajarê Muzîkvanên Spî) ya Bextiyar Elî de*, Çapxaneya Xanî, Ç. 1, Dihok, 2009, r. 58.

[37] Yûnis, Îbrahîm, *Guldesteyek ji Hunera Çîroknivîsînê*, W: Nebez Cehangîrpur, Çapxaneya Çarçira, ç. 1, Silêmanî, 2005, r.25.

nêr û mê tenê ew tê bikaranîn. Yanî eger hat û romannivîs ev cînav bikar anî, tê wateya ku şêwaza babetî pêrew kiriye "*Eger wiha kir romana xwe bi rêya kesê sêyem vegot, yanî bi rêya pronavê nediyar ê ew yan wî-wê ev tê wateya ku vebêjer li derveyî vî cihî ye ku derbarê wê tê axaftin. Di vê rewşê de, wek di piraniya romanên klasîk de heye, vebêjer hertiştzan e, herwekî Xwedê ye ku hemû şiyanên wî hene, ji ber ku hemû tiştî dibîne, ji mezintirîn tişt heta tiştê herî hûr û biçûk ê cîhana vegotî*."[38]

Lê nabe ew yek ji bîra me here ku ji bilî cînavê serbixwe yê nediyar ê ew, wî- wê, pir caran cînavê serbixwe yê tu di rewşa xwerû de te di rewşa tewandî de bo kesê duyem ê tek tê bikaranîn. Ev cînav jî di Kurmanciya jêrîn de tenê wek to tê danîn. Di vê rewşê de jî, vebêjer şêwaza vegotina babetî pêrew dike. Di bikaranîna vî cînavî de xwîner pir caran wiha hest dike ku berê axaftina karakteran li wî ye. Lê zêdetirîn û belavtirîn cînavê serbixwe di şêwaza vegotina babetî de ji cînavê nediyar ê kesê sêyem ê tek ew, wî-wê pêk tê, çimkî:

"*1. Rêyeke baş e bo ku vebêjer xwe li pişt wê veşêre û bîr û baweriyên xwe yên îdeolojîk nîşan bide.*

*2. Bi rêya bikaranîna vî cînavî xwe ji têkilîbûna bi bûyeran re diparêze û metinê ji wê yekê dûr dixe ku wek jiyanname derkeve.*

*3. Bikaranîna cînavê ew vebêjer diparêze ji tuhmeta derewkirinê girêdayî bûyeran. Çimkî vebêjer tenê pêşkêşvanê bûyeran e û tenê nameber e di navbera bûyerên afirandî û xwîner/wergirê çîrokan de.*

*4. Herwekî çawa bikaranîna vî cînavî derfetê ji romannivîs re peyda dike ku zanyariyên wî yên seranserî derbarê kesayetî û bûyerên di romana wî de hebe, binemaya wan hurdekariya hemû bûyerên pêgihîştiye beriya ku wan vebêje*."[39]

Di dawî de pêwist e em bêjin ku bikaranîna vê şêwazê di nivîsandina romanê de di dema niha de kêmtir tê bikaranîn. Dibe ku xala sereke ji bo serdestî û dîktatoriya vebêjer vegere pêşveçûna bûyerên nav romanê û diyardeya takdengiyê diromanê de. "*Diyar e teoriyên nû yên*

---

[38] Yosa, Mario Vargas, *12 Name Bo Romannivîsekî Genc*, W.Şîrîn. K, Çapxaneya Bînayî, 2008, r. 57.
[39]Mihemed, *Binyata Bûyerê,* r. 158.

*vegotinê di romana nû de biqasî ku li ser pirdengî û pirkesayetî û parçekirina bûyer û zeman de îsrar dikin, bi awayekî şêwaza vegotina klasîk bê rewac dimîne.*"[40]

Wek me li jor jî behs kir, şêwaza vegotina babetî bi herdu cureyên nerîngeha vebêjerê hertiştzan û kêmtiştzan tê pêkanîn. Ango her dema ku vebêjerê hertiştzan beşdarî vegotinê bû, êdî şêwaza vegotinê dibe babetî, ne merce jî ku vebêjerê hertiştzan romannivîs bi xwe be. Lewra pêkan e her karakterek di romanê de bibe vebêjerê hertiştzan. Ji bo vê jî divê rexnegir bi xwe vê binase. Herwiha vebêjerê kêmtiştzan jî şêwaza vegotinê dike babetî.

### 2.1.2. Vegotina Xweyî ( Subjective )

Di metinê romannivîsî yê niha de belavtirîn cureya vegotinê ye ku romannivîs bikar tîne, ew jî di encama bêhêzbûna dengê vebêjerê hertiştzanû bihêzbûn û anîna pêş a dengê hemantiştzan e, ji hêla nivîskaran bi xwe ve. Lewra "*vegotina xweyî binyat û lênihêrînên wê hemecor dibin û mecalê dide kesan rasterast rûbirûyî xwîner bibe û bi xwîneran re biaxive û bêyî ti çavdêrî yan arastekirinekê ji hêla kesên din ve wan biaxivîne û bi serbestiyeke seranserî xwe eşkere bike bêyî ku bendewarê wê yekê be yek aliyekî ji helwest û bîr û baweriyên wî veşêre.*"[41]

Lewma di bikaranîna vê şêwaza vegotinê de, dibe ku roman an bi rêya qehremanê sereke yan her karakterekî din ê nesereke bê vegotin. Nivîskar û rexnegir gihîştine wê baweriyê ku bikaranîna vê şêwaza vegotinê bû sedemê derketina diyardeya pirdengiyê di romanê de. Çimkî tenê rê bi kesekî nayê dayîn li derveyî metinê proseya vegotinê encam bide, diyardeya monopolkirina metinê ji takdengiyê bû pirdengî, lewra pêkan e di encama bikaranîna vê rêyê de çend kes proseya vegotinê pêk bînin. "*Wiha li me dike em hest bi êş û azarên qehreman û karakteran bikin û her bi wan re jî beşdariyê di vegotinê debikin.*"[42]

Pir caran nivîskar başî û xirabiya romanê vedigerînin ser şêwaza vegotina romanê û wê rêya ku nivîskar di vegotinê de bikar aniye, lewma Fredman, di pîvana romana baş û xirab de dibêje: "*Xweşî û başiya romanê ew e ku vegotina babetî nemîne, bi nemana vebêjerê*

[40] Îsma'îl, Rêbîn Resûl, "Razbêjî û Monologa Navxweyî Di Romana (Metamorfos) de", *Kovara Karwan*, j. 157, 2001, r. 11.
[41] Sabir, *Bînaya Hunerî ya Çîroka Kurdî,* r. 116.
[42] Se'îd, *Teknîka Vegotinê,* r. 125.

*hertiştzan re roman zindîtir û bihêztir dibe.*"[43] Di vê rêyê de derbirîna xweyî û behskirina kêşe û azar û karesatên xweyî, bi roleke sereke radibe.

Her derbarê qelsbûna dengê vebêjerê hertiştzan û bilindbûna pirdengiyê "*Di vegotina realîzma sihrî de, tevî dûrketina ji pir bikaranîna diyalogê, nivîskar li gor şiyana xwe ji zimanê vebêjerê kevin hertiştzan dûr ketin û pirdengî pêşkêş kirin. Ev bikaranîn ji hêla Marx jî hatiye tekezkirin û bi ti hawî bi nerîneke reha û taybetî bûyerê venabêje, lê ji devê çend kesan bûyerê bi çend şêweyan berçav dike.*"[44]

Lewra yek ji xasiyetên romana nû piralîbûn e di şêwaza vegotinê de. Li vir pêwist e em îşaretê bi bikaranîna vî cînavê serbixwe bikin ku di vê şêwazê de tê bikaranîn. Ew jî bikaranîna cînavê axêverê serbixwe yê min di rewşa tewandî de û ez di rewşa xwerû de bo kesê yekem ê tak vê proseya vegotinê birêve dibe. Hêjayî gotinê ye ku ev cînav ku di Kurmanciya jêrîn de tenê wek "min" tê bikaranîn. "*Vegotina çîrokê bi cînavê kesê yekem ê tak proseyeke divê bi miqateyî di aliyekî terazûyê de bê danîn daku li hember hemû proseyên din raweste, li aliyê din yê terazûyê.*"[45]

Eger vebêjer bi vî cînavî xeber da êdî "*tê wateya ku vebêjer li vî cihî ligel kesayetiyên nav wê romanê de dijî ku ji me re vedibêje.*"[46] Herwiha bikaranîna vî cînavî di vegotina xweyî de "*dibe ku hêsantirîn şêwe be bo nivîsandina romanê, çimkî tu dikarî ji ber vî karî bi hêsanî bi rêya kesayetiyekê min ji hertiştî nêzîk bibî û nas bikî, ligel vê yekê jî sînordarî li holê heye.*"[47] Herwiha her ji ber bikaranîna vî cînavî "*xwîner hest dike ew tiştên ku jê re tên beshkirin ji çavê kesekî rasteqîn e, bê hebûna nivîskar.*"[48]

Lewma eger em binerin niha roman li cîhanê bi giştî û romana kurdî bi taybetî bi vê şêweya vegotinê tên nivîsandin. Wek eşkere ye jî nivîskar di bikaranîna van her du rêyan de bêhtir yek ji wan bikar anîne. Lê dibe ku carna ev her du rê bên tevlîhevkirin, ev jî wê çaxê

[43]Îbrahîm, Ebidalle, *el-Bîna‘ el-Fenî Fî Rîwaye el-Herb el-‘Erebiye Fî el-‘Iraq (1980-1985)*, Rîsale Macistîr, Kliye el-Edeb, Camî‘e Bexdad 1987, r.195.
[44]Elî, *Rengdana Realîzma Sihrî*, r. 242-243.
[45]Warîn, Ostin û Wîlîk, Rînîye, *Nezeriye el-Edeb*, Ter. mhî ed-Dîn Subhî, Mirace‘e: D.Hsam ed-Dîn el-Xetîb, el-Maclîs el-E‘la Lîrî‘aye el-Fnun we el-Edeb lî‘îlm el-Îctîma‘ye, Metbe‘e Xalîd et-Trabîşî, Dîmeşq 1977, r. 291.
[46]Yosa, *12 Name*, r. 57.
[47] Kesnezanî, Buşra, *Plot Di Çîroka Kurdî de Salên (1995-2005)*, Çapxaneya Lerya, Silêmanî, 2012, r. 258.
[48]Kesnezanî, *Plot Di Çîroka Kurdî de*, r. 258.

pêk tê gava “*çîrokbêj di vegotina babetî de dide pey çarenivîsa kesekî taybet û li ser hev ji me re diyar dike wî kesî çi kiriye û çi dîtiye, dûre piştî vê bala me ji vî kesî dikşîne ser kesekî din û ji nû ve yek bi yek wan tiştan dizane ku wî kesî kiriye yan bihîstiye, bi vî rengî qehreman dibe rênîşanderê vegotinê yanî qehreman dibe çîrokbêj jî. Lê belê nivîskar tenê dibe axêverek bi navê çîrokbêj û di heman demê de hewl dide wan tiştan ji me re bêje ku çîrokbêj nikare wan ji me re bêje.*”[49]

Di dawiya vê mijarê de, em digihin wê encamê ku du cureyên şêwazên vegotinê hene ku vegotina babetî û vegotina xweyî ne û şêwaza ku niha ji van her du cureyan di çîrok û romana kurdî de tê bikaranîn cureya duyem e di proseya vegotinê de. Dîroka cureya yekemîn kevintir e û yekemîn car jî nivîsandina romanê di edebiyata kurdî de, nemaze romanên kurdî li Yekîtiya Sovyetê bi rêya yekem hatine nivîsandin.

Derbarê şêwaza vegotinê di romana *Mîrname* de, şêwazeke bi tevahî xweyî tê de serdest e. Di tevahiya romanê de tenê li yek cihî hest bi vegotina babetî tê kirin, ew jî destpêka romanê ye ku rûpelên 11-20 ên romanê digre. Di vê şêwaza babetî de ku romannivîs bi xwe ye, hewl daye dîmeneke lezgîn nîşanî me bide li ser nasandina çend karakterekî û rîtûalên veşartina terman li ba gelê Kurd û kolandina gora Xanî û piştre anîna termê Xanî û dûre veşartina wî ta bi telqîn xwendina li ser gora Xanî bidawî tê. Ev prose hemû ji hêla romannivîs tê pêşkêşkirin ku, bi xwe bi ti hawî ne beşdar e wek karakterekî di romanê de, destpêkeke bi vê şêweyê jî di nava romanê de ji hêla romannivîs bi baweriya min du armancên wê hene:

1. Çawa di dastan an di şanoyê de hewl tê dayîn di destpêkê de karakteran bi me bidin nasîn, bi heman şêweyê jî romannivîs di *Mîrname* de bi vê şêweya destpêkirinê karakteran bi me dide nasîn, di demekê de ew bi xwe ne karakterekî beşdarî nav romanê ye û li derveyî bûyer û karakterên wê ye. Vebêjer hewl daye bi şêweyeke babetî bibe gihînerê navbera karakter û xwînerên metinê. Ev jî me vedigerîne ser wê nerîna ku “*Ian Boss dibêje: Homer di dema nivîsandina dastanên xwe de, yek rûpelê nanivîse bêyî ku rengekî ji rohnkirina rasterast derbarê motîf û xwestekên kesayetiyan û girîngiya rêjeya bûyeran berçav neke*.”[50]

[49] Sabir, *Bînaya Hunerî ya Çîroka Kurdî*, r. 246.
[50] Mihemed, *Binyata Bûyerê*, r. 158.

2. Mebesteke din a romannivîs ji vê şêwaza destpêkirinê dibe ku ew be ku coşa xwîner bo karakter û bûyeran zêdetir bike, çimkî ev şêwaza destpêkirinê xwîner neçar dike xwendina romanê berdewam bike.

Her ji vê destpêka babetî romannivîs cînavê kesê sêyem ê nediyar ew, wî-wê bikar tîne, lewra piştî xilasbûna vî beşî ji rûpela 21an ve ku bi vebêjer Teymûrê Fasiq dest pê dike 21 vebêjer bi şêwazeke xweyî ku ew bixwe beşek in ji karakter û bûyeran ji nerîngeh û dîtina xwe ji me re behsa Ehmedê Xanî û jiyan û serpêhatiyên xwe bi Xanî re dikin heta dawiya romanê ku bi vebêjer Mela Îsmaîlê Bayezîd bidawî tê. Û her yek ji van 21 vebêjeran bi cînavê axêver ê min an ez dest bi vegotina bûyeran dikin.

### 2.2. Nerîngeha Vegotinê û Cureyên Vebêjer

#### 2.2.1. Têgeh û Pênaseya Nerîngehê (Point of View)

Dîtin û nerîna nivîskar e bo awayê vegotina wê çîrok an romana ku nivîskar dixwaze bispêre vebêjerekî ji vebêjerên xwe. Derbarê dîroka derketina vê têgehê di nav rexnegir û nivîskaran de, hinek nerînên cuda cuda hene. Lê hemû li ser naveroka mijarê hevnerîn in. Em ê jî hewl bidin çend tarîf ango pênaseyên kêrhatî ji bo vê babetê destnîşan bikin. Philip Stevick dibêje: "*Pêwist e em mikur werin ku dadweriya me derbarê biha û nirxê romanê, girêdayî radeya têgihîştina me ji nerîngehê ye*."[51]

Li gor Philip Stevick ev mikurhatina rasterast bi biha û nirxê nerîngehê di romanê de ye, girîngiya vê babetê girêdayî şêwaza pêşkêşkirina romannivîs bo romana xwe ye, dîtin û nerînên romannivîs di nav metinê roman an çîrokê de diyar dibe. Divê em vê yekê jî bizanin ku girîngiya her teksteke romanê girêdayî awayê vegotina wê babetê ye ku romannivîs an çîroknivîs ji me re vedibêje. Her derbarê nerîngehê Gérard Genette dibêje: "*Ji deng cuda ye. Nerîngeh têkildarî çav û derûnê ye û bi rêya wan cîhana wê ya xeyalî tê kifşkirin*."[52]

---

[51]et-Telawî, mehemed en-Necîb, *Wichet en-Nezer Fî Rîwayat el-Eswat el-'Erebiye*, Mîn , Menşurat Îtîhad el-Kîtab al-'Ereb, 2010, r. 19.

[52] Elwenî, Necm, *Lêkolîna Rexneya Şîrovekarî Derbarê Romana Kurdî*, Çapxaneya Aras, Ç. 1, Hewlêr, 2011, r. 56.

Lewra pir caran gava rexnegir behsa statû û girîngiya nerîngehê di romanê de dikin, pir bi girîngî wesfê vê têgehê dikin. Di rastiyê de jî nerîngeh "*yek ji binyatên girîng ên vegotinê di romanê de ye û pêwendiyeke wê ya rasterast bi şêwaza berhemanîna romanê heye, herwiha hilbijartina cureya nerîngehê bandorê li ser awa û şêwaza nivîsandina her romanekê dike*."[53]

Dr. Necm Elwenî di pênaseya nerîngehê de dibêje nerîngeh ji: "*Awayê ku romannivîs û hîkayetbêj û karakterên romanê bîr û baweriyên xwe pê derdibirin, pêk tê. Ev jî têkildarî cureya vegotina romannivîs e ku bandorê li ser tevahiya şêwaza vegotina romanê dike*."[54]

Derbarê dîrok û xwediyê vê têgehê, di nav rexnegiran de nerînên cuda hene. Hinek rexnegir wê pêşî vedigerînin Plato û piştre Aristotle. Lê hin rexnegir yekemîn hewldana danasîna vê têgehê vedigerînin bo zanayê amerîkî Henry James "*Di rexneya edebî de yekemîn hewldan bo nasandina vê rehenda sereke di her hunereke çîroknivîsiyê de û bi taybetî di romanê de bo zanayê amerîkî Henry James 1843-1916 vedigere ku li ser destê wî guherîna bingehînî li ser hatiye kirin ku bûye sedemê afirandina formeke nû di romanê de ku di rexneya wêjeyî de wek romana nerîngehê tê naskirin*."[55] "*Behskirina nerîngehê di rexneya nû de li ser destê Henry James bû û bi şêweyeke berçav girîngî pê daye û bipêşxistiye, tevî ku bi baweriya Se'îd Yeqtîn piraniya rexnegir û lêkolînvanan li ser wê yekê li hev dikin ku ev têgeh ji hêla rexneya Anglo-amerîkî di destpêka sedsala bîstan de û ligel bîr û baweriyên Henry James derketiye*."[56]

Lewra eger em binerin ji hêla rexnegirên rojavayî û rexneya rojhilatî de jî û di lêkolînên rexneya edebî ya kurdî de jî, bêhtir tekezî li ser zanayê amerîkî Henry James hatiye kirin. Lê wek me li jor amaje pê kir divê reh û kokên vê têgehê jî li ber çav bê girtin ku dîrokeke wê ya kevin heye "*Beriya ku Henry James bîr û baweriyên xwe li ser vê mijarê belav bike, hinek nîşan û amajeyên seretayî di bîr û baweriyên Plato û Aristotle û piştre jîFlaubertde*

---

53 Elwenî, *Lêkolîna Rexneya Şîrovekarî,* r. 57-58.
54 Elwenî, *Lêkolîna Rexneya Şîrovekarî,* r. 57.
55 Amêdî, Beyan Ehmed Hisên*, Nerîngeh Di Romanên Sebrî Silêvanî De*, Çapxaneya Şehab, Ç. 1, Hewlêr, 2013, r. 14.
56 Xirwatanî, Mistefa Salih Mistefa, *Teknîka Nerîngehê Di Romanên Bextiyar Elî De*, Çapxaneya Şehab, Ç. 1, Hewlêr, 2013, r. 40.

*tên dîtin, ku reh û kokeke nerîngehê ya kevin heye, lewra em dikarin bêjin Henry James ev têgeh rêkxistiye û ber bi pêş ve biriye, lê li ser destê wî nehatiye dirustkirin*."[57]

Ji ber ku di rexneya edebî ya kurdî de kêm derbarê nerîngehê hatiye nivîsandin, lewra li ser têgeh û binavkirina nerîngehê tiştekî berçav li holê nîne û hemû bi vî navî nerîngeh behsa vê çemk û têgehê dikin û em jî ji aliyê xwe ve vî navî bêhtir dipejirînin. Derbarê dîroka vê têgehê jî, rexnegirên edebiyata kurdî jî tekeziyê li ser wê yekê dikin ku reh û kokên nerîngehê yên kevin hene û wê vedigerînin serdema Plato û Aristotle û di dawî de jî ev têgeh ji hêla Henry Jamesve hatiye birêkxistin.

Pêwist e bê zanîn ku meseleya nerîngehê ne tenê taybet e bi hunera nivîsandina romanê, lê girêdayî hunera şêwekarî ye jî wek pênaseya ku (BorisUspensky) derbarê nerîngehê dibêje: "*Nerîngeh bi şêweyeke giştî pêk tê ji sîstemekê bo nîşandana şûna sê yan çar aliyan bi alîkariya hin amrazên hunerî yên taybet bi şêweyeke hunerî ya diyarkirî û xala hinartinê jî di sîstema nerîngeha hêlkarî pêk tê ji statûya wî kesî ye ku karê wesfkirinê cîbicî dike*."[58] Ev tarîf nîşan dide ku ne tenê roman di pêkhatina vî tuxmî ango nerîngehê de beşdar e, lê hunerên din jî wek hunera şêwekarî û peykersazî û tew di zanistê de jî.

"*Di hunerên ciwan de wek şêwekarî û bi taybetî di wênekêşanê de têgeha Perspektîv – nerîn an boçûntê bikaranîn, li vir tabloberhema derbirîna dîtina wênekêş e. Têgeha nerîngehê wek xwe di warê teorî de, di zanista endazyarî de wek di piraniya warên hunerî de heye, ango estetîka her wêneyeke şênber rengdana nerîngeha xwediyê xwe ye ku asta dîtina wî dibe hokarê wesfkirina wî bi sîfeta tûjbîn an kurtbîn, wek mînak filankes ji nerîngeheke teng an tûj an berfireh li filan mijarê yan filan tiştî dinere*."[59]

### 2.2.2. Cureyên Nerîngehê

Di nav rexnegiran de, derbarê cure û şêwazên vegotinê çend dabeşkirinji bo vê mijarê hatine kirin. Her yekî ji wan jî taybetmendiya xwe heye ku emê hinek ji van dabeşkirinan nîşan bidin.Jean Pouillon ev mijar bi vî rengî dabeş kiriye:

---

[57] Xirwatanî, *Teknîka Nerîngehê*, r. 40.
[58] Elwenî, *Lêkolîna Rexneya Şîrovekarî,* r. 56-57.
[59] Amêdî, *Nerîngeh*, r. 13.

"*1.Dîtin ji paş ve.*

*2. Dîtin ligel.*

*3. Dîtin ji derve ve.*"[60]

Herwiha Todorov jî bi sûdwergirtina ji hêmayên matmatîkî bi vî rengî cureyên nerîngehê dabeş dike:

"*1. Vebêjer > karakter.*

*2. Vebêjer = karakter.*

*3. Vebêjer < karakter.*"[61]

Herwiha Gérard Genette nerîngehê bi vî rengî dabeş dike:

"*1. Navendîkirina sifr an nenavendkirin.*

*2. Navendîkirina navxweyî.*

*3. Navendîkirina derveyî.*"[62]

Herçiqasî dabeşkirina hemû cureyên nerîngehê di naverokê deher heman tişt e, tenê cudahî di binavkirina wan de ye lê ne di naveroka mijarê de ye. Bi vî rengî nerîngeh li ser van dabeş dibe:

#### 2.2.2.1. Dîtin ji Paş ve (Vebêjerê Hertiştzan)

Di vê cureya vegotinê de zanyariya çîrokvebêj derbarê karakteran zanyariyeke bêsînor e, agehdarî hemû bûyer û qewimînên çîrok an romanê ye û zanyariyên vebêjer ji zanyariyên karakterên romanê zêdetir in. Lewra pir caran ev cureyê vebêjer bi vebêjerê babetî re dibe yek tişt. Eşkere ye ku vebêjer di van cureyan de li derveyî çîrokê ye û şehrezabûneke wî ya tevahî heye û hertiştî dizane. Lewra vebêjer di van cureyên nerîngehê de jê re tê gotin vebêjerê

[60] Se'îd, *Teknîka Vegotinê,* r. 113.
[61] Se'îd, *Teknîka Vegotinê,* r. 113.
[62] Se'îd, *Teknîka Vegotinê,* r. 113.

hertiştzan "*Çimkî vebêjer bi tevahî serbest e û dikare di nav dil û derûna karakteran de kûr here xwar û hest û bîr û baweriyên wan jî bixwîne, bêyî ku karakter bi xwe agehdarî vê rewşa xwe be*."[63] Lewra di vê rewşê de vebêjer li derve dibe, li paş radiweste û ji paş ve tiştan dibîne û desthilateke wî ya bêsînor heye û li ser pêşveçûna bûyerên çîrok an romanê, ev serdestiya vebêjer wiha dike ji karakteran bêhtir zanyariyên wî hebin. "*Vebêjerê hertiştzan di vegotinê de cînavê kesê sêyem ê nediyar e) bikar tîne û bêhtir di romana teqlîdî de tê bikaranîn û gelek berhemên cîhanî pê hatine nivîsandin*."[64]

Ev cînav ew, wî-wê "*heta radeyeke mezin alîkariya wê yekê dike ku hertiştî zanibe û şiyana wî ya behskirina wan hebe û bi tevahî serbest be di eşkerekirin an veşartina wan zanyariyên ku têkildarî karakterê sereke yê bûyeran e û wan arasteyî wergiran dike.*"[65]

Tiştê ku li vir girîng e ew e ku vebêjergava romanê vedibêje xema wê yekê naxwe ku ji me re bêje wî zanyariyên xwe ji ku anîne û di dayîna wan zanyariyan de bi kêfa xwe tevdigere û çiqasî bixwaze û hez bike ewqasî dide. Derbarê desthilat û serbestiya reha ya vî vebêjerî, Dr. Perêz Sabir dibêje "*Lewma em dikarin bêjin ew serbestiya ku çîrokbêjê hertiştzan dibe ji aliyekî serbestiyeke reha ye û ji aliyekî din ve jî serbestiyeke rêjeyî ye.Derbarê zanîna wan zanyariyên ku bi wan dizane û eşkerekirin an veşartina wan zanyariyan û amadebûna wî di her dem û cihekî de, serbestiyeke wî ya reha heye. Lê di warê dariştina teksta çîrokê li gor yasayên aloz ên navxweyî, divê çend qanûnan pêrew bike. Bêguman ev jî serbestiyeke destnîşankirî dide çîrokbêjê hertiştzan û nahêle bi kêfa xwe pêngavan bavêje û herçî di xeyala wî de ye bike.*"[66] Lewra em dibînin ku hin rewş hene vebêjer wê desthilata reha ji dest dide û desthilat û serbestiyeke wî ya rêjeyî hebe. Lê divê em zanibin ku desthilata reha ya vebêjer ji desthilata wî ya rêjeyî zêdetir e, çimkî xwezaya vê cureya nerîngehê bi vî rengî ye.

Derbarê dîroka vê cureya nerîngehê tê zanîn ku her ji destpêkêû ji kevin ve, ev cureya vegotinê hatiye pêrewkirin "*Ev cureya nerîngehê bi piranî di romanên sedsala 18 û 19an de hatiye bikaranîn, wek di romanên Balzac, Stendhal, EmilyBrontë û romannivîsên din heta*

[63]Se'îd, *Teknîka Vegotinê,* r. 114.
[64] Se'îd,*Teknîka Vegotinê,* r. 114.
[65]Sabir, *Bînaya Hunera Çîroka Kurdî*, r. 214.
[66]Sabir, *Bînaya Hunera Çîroka Kurdî,* r. 217-218.

*derketina romana nû.*"[67] "*Tevî vê jî em dibînin ku ev vebêjer di romanên sedsala 20an de jî tê bikaranîn nemaze di karên Gabriel García Márquez de*"[68] Di romana kurdî de ev cureya nerîngehê bi eşkereyî berçav dibe nemaze di romanên berê yên kurdên Yekîtiya Sovyetê de, bi taybetî li ba Erebê Şemo, Haciyê Cindî û Eliyê Evdilrehman.

Derbarê başî û xirabiya vê cureya nerîngehê, di nav rexnegiran de nerînên cuda hene û hemû bi heman çavî li vî cureyê vebêjer nanerin, "*romannivîsê fransî Flaubert bi bedewtirîn şêwe wêneya çîrokbêjê hertiştzan dikşîne û girîngtirîn taybetmendî û xasiyetên wî diyar dike, di nameyekê ji wan nameyan de ku bo xatûn Lorraine Shanté şandiye dibêje: Pêwist e nivîskar ji xwe re nenivîse lê divê di karê xwe de wek Xwedê be û li gerdûnê nedîtbar û bikarîn be, bi awayekî em li hemû cihekî hest bi hebûna wî bikin lê wî nebînin.*"[69] Ligor Flaubert wek mercê serkeftinê daniye ev cureya nerîngehê, lê Roger Fowler tevî ku di vî alî de bi Flaubert re hevnerîn e ku divê vebêjer bi ser hertiştî re serdest be, lê li ser vebêjerê hertiştzan dibêje: "*di warê pêşkêşkirina wan de, pêwist nake xwe bi şêweyekê nîşan bide ku hertiştî dizane û destê xwe deyne ser hertiştî.*"[70]

Bi vê şêweyê em digihin wê encamê ku dîtina ji paş ve yan vebêjerê hertiştzan kevintirîn cureyê nerîngehê ye di romanê de û bêhtirîn metinên roman û çîrokê bi vê cureya nerîngehê hatine nivîsandin û di aliyê serbestî û azadî û derbirîna zanyariyan de ev cureyê vebêjer azadtirîn cure ye ji nav cureyên din ên vebêjer.

Pir caran di nav rexnegiran de cureyên nerîngehê tên dabeşkirin li ser nerîngeha derveyî û nerîngeha navxweyî ku ligel herdu şêwazên vegotina babetî û xweyî hev digrin, li vê gorê jî di romana Mîrname de, tenê di destpêka romanê de ji rûpela 11 heta rûpela 20an, vebêjerê hertiştzan li derve derveyî wêneya tiştan digre û zanyariyan derbarê karakter û bûyeran dide me û di pêvajoya vegotina romanê de beşdar e ku me berê jî di şêwazên vegotinê de behs kir. Bi vê şêweyê dest pê dike "*Mirovê rûnuxamtî, axa ku bi cilên wî ve girtibû û li ber*

[67] Xidr, *Teknîka Vegotinê,* r. 43.
[68] Se'îd, *Teknîka Vegotinê*, r. 114.
[69] Sabir, *Bînaya Hunera Çîroka Kurdî,* r. 215.
[70] Sabir, *Bînaya Hunera Çîroka Kurdî,* r. 215-216.

*çipikên baranê bûbû peşkin ji herîyê û li rûpoşa wî jî ketibûn, bi destê xwe yê rastê daweşand û ji binê gorê de bi dengekî jinane bang kir:*

*- evçende bese.*

*Dema ku bi destê wî girtin û ew derxistin, pişikên xwe tijî bayê şil kirin û got:*

*- eeeeeeeh. Elhemdulillah em li tehtan rast nehatin, gora wî pir bi nermî hate kolan.*

*Û bi awireke ji xwe razî li binê gorê nihêrî.Xirecira xeyalên kesên ku wê sibeha barandar li dora gorê kombûbûn, bi bêdengîyeke sezayî mirinê, mîna rûpoşa wî mêrê ku gor kola bû, hatibû nuxumandin. Lê di rûyê her kesî de xemgînî bê rûpoş bû. hinekan rûyên xwe di kefên destên xwe de veşartibûn û hêsrên xwe bêyî ku kes hay jê hebe didane alî. Li hev nedinêrîn û hêsrên xwe ji hev vedişartin. Hinekan jî pişta xwe dabûne darên çinarê û ji wê jorê de bêdeng li wan kaşên kevirî û rût yên li dora wan bêdengî kûrtir dikirin, dinêrîn. Tenê ewê rûnuxamtî bi çavên xwe yên xweşik û zuwa dikarîbû xemgînîya her rûyî di wê xirtolê de bixwîne*"[71]

Li vir em hest pê dikin ku di nasandina karakteran û behskirina kolandina gora Xanî de, vebêjer li derve wêneya tiştan ji me re girtiye û zanyariyan dide me derbarê cih û tevgera karakteran û zanyariyên vebêjer ji zanyariyên karakteran bi xwe zêdetir in. Ji vê cureya vebêjer re di proseya vegotinê de tê gotin vebêjerê hertiştzan, herwiha vebêjer di vegotinê de cînavê kesê sêyem ê nediyar wî bikar aniye. Herwiha vebêjer her di vî beşî de û li cihekî din, li cihekî bilind rawestiyaye û li derveyî romanê ye û wêne û tevger û girî û hawara wan jinên cilreş ji me re vediguhêze ku ji bo mirina Ehmedê Xanîşînê dikin û dibêje: "*Jinên reşgirêdayî desmalkên xwe yên rengareng ji ber hûçikên xwe derdixistin û barana ku ji çavên wan dihate xwarê zuwa dikirin. Hêsrên hinek jinên ku ji bîr kiribûn kilê ji çavên xwe bibin weke çipikên hibrê bi ser hinarkên rûyên wan yên çilmisî de diherikîn.Xûşka xanî ya mezin Perî , cotecot hêsir diherikandin û her bêhnekê lawjyek davête ser birayê xwe heta ku kêra girî li gewrîya wê dida û berxika nehwirandina wê digurand*"[72] Li vir vebêjer zanyariyên tevahî derbarê karakteran ji me re dibêje û bi rêya bikaranîna cînavê nediyar ê kesê sêyem wê bo mê proseya vegotinê cîbicî dike.

[71] Jan Dost*, Mîrname*, roman, Weşanxaneya Avesta, Ç. 2, Stenbol, 2011, r. 11-12.
[72]Jan Dost,*Mîrname*, r.13.

### 2.2.2.2. Dîtin Ligel (Vebêjerê Hemantiştzan)

Bi pêşketina romanê û derketina şêwaz û teknîk û hunerên nû yên romanê, cureyên nerîngehê jî bi heman awayî pêşketineke berçav lixwe girtin, wek çawa me li jor behs kir di romana kevin de cureya nerîngehê tenê vebêjerê hertiştzan bû, cilewa bûyer û karakteran di desthilata vebêjer de bû, lê ji ber pêşketina romana nû ev desthilat ji vebêjer hat standin û teknîka nû di vî alî de derket, diyartirîn teknîka cureya nerîngehê jî ku derket holê ji dîtin ligel an vebêjerê hertiştzan pêk dihat ku di metinê romana nû de qalibê naskirî hat şikandin û cureyê nû derbasî nav qada romana cîhanî bû "*piraniya lêkolînvanan vê vedigerînin pêşketina civakên Ewropayê, ev jî bi guhertina civakê ji dîktatorî û çînayetî bo azadî û geşbûna burjuwazî, vê jî rasterast bandor li ser pêşketina hunera romanê kir.*"[73]

Piştî hatina vebêjerê hemantiştzan ev guhertin hate ser, êdî vebêjer nema hertiştî ji me re vedibêje lê vebêjer wek hemû karakterên din ên romanê dibe beşek ji vebêjer lê ne hertişt. Eger em binerin di romana kevin de bi şêweyeke berçav vebêjerê hertiştzan mecalekî mezin di romanê de dagîr dike "*Ev di romana Realîzma sihrî de, rola wan qels dibe, çend deng têne nav qada pêkhateya romanê û her yek bi şêweyekê û ji nerîngehekê ve, bûyer û serpêhatiyan vedibêje.*"[74]

Di romana Mîrname ya Jan Dost de, bi tevahî hest bi hebûna cureyê nerîngeha hemantiştzan tê kirin. Derbarê kuştina Ehmedê Xanî ji destpêka romanê heta dawiya romanê ne tenê kesek bûyerê vedibêje, ango hemû vegotina romanê nebûye para yek kesî, lê çend vebêjer li gor nerîngeha xwe ji me re behsa mirina Xanî dikin. Divê em wê rastiyê jî li ber çav bigrin ku ji ber pêşketina romanê ji yek vebêjerî ango ji tak dengiyê û derketina cureyê duyem ê nerîngehê, diyardeya pirdengiyê di romanê de bi tevahî derdikeve, di vê cureya nerîngehê de "*vebêjer wan tiştan dizane ku kesên nav çîrokê wan dizanin, yanî ew zanyariyên ku li ba çîrokbêj in, di warê çendîtiyê de bi qasî wan zanyariyan in ku li ba kesên nava çîrokê hene.*"[75]

Bi kurtî derdikeve ew zanyariyên ku li ba vebêjer hene, heman ew zanyarî ne ku li ba karakterên romanê hene û wekhev in wek çawa di dabeşkirina nerîngeha Todorov de

---

[73] Mentik, Heme, *Teknîka Pirdengiyê Di Romana Kurdî de*, Çapxaneya Lerya, Silêmanî, 2013, r. 80.
[74]Elî,*Rengdana Realîzma Sihrî*, r. 243.
[75]Sabir,*Bînaya Hunerî ya Çîroka Kurdî*, r. 218.

derdikeve ku bi sûdwergirtina ji hêmayên matmatîkî dibêje vebêjer = karakter "*Çimkî zanyariyên vebêjer derbarê bûyer û karakteran bi zanyariyên karakteran bi xwe re wekhev in. Ango rêjeya zanyariyên vebêjer bi zanyariyên karakterên romanê re di aliyê çendîtiyê de wekhev e, yanî zanyariyên ti yekî ji wan ji zanyariyên yê din ne kêmtir û ne zêdetir in*."[76] Ji vê pênaseyê derdikeve ku vebêjer û karakter hevawayê hev in di aliyê zanyariyan de, lewra serbestî û azadiya vî vebêjerî sînordar e û nikare bêyî amadebûna karakteran bi xwe tutiştî eşkere bike, bêyî xwestina wan nikare tevbigere û pêşhatên bûyer an karakteran bizane.

Vebêjer di vê cureya nerîngehê de dibe beşek ji bûyeran û di rêveçûn û îdarekirina bûyeran de bi roleke girîng radibe. Wiha jî vebêjer nabe kesek ku li derve li bûyeran binere û arasteya bûyeran bi kêfa xwe biguhere yan çavdêriya dirustbûn û pêşveçûna bûyeran û tevger û çalakiyên karakteran bike. Lê dîtin ligel an vebêjerê hemantiştzan "*kesek e di nav bûyeran de dijî û bi afirandina wan an bi karîgerbûna bi şûnwarên wan beşdariyê di bûyeran de dike û bi xwe jî erkê vegotina bûyeran li stûyê xwe digre*."[77] Lewma ev cure vebêjer di warê zanyarî û wî cînavê ku bikar tîne de, bi şêwaza vegotina xweyî re hev digre. Di vê cureya nerîngehê de, xwînerê romanê çalaktir dibe, ji ber ku rûbirûyî çend cureyên karakter û vebêjerên nav romanan dibe û rûbirûyî erkên zêdetir û nerînên zêdetir dibe.

Derbarê bikaranîna cînav di vê cureya nerîngehê de, piraniya rexnegiran bawer dikin ku vebêjer cînavê yekem ê axêver bikar tîne, ango min an ez. Girîngtirîn taybetmendiya vî cînavî ew e ku "*tenê wan tiştan dibîne ku dikevin ber hest û hişê qehremanên romanê de di aliyê dîtina taybetî, ango vebêjer bi zar û mejiyê qehreman diaxive û dirame. Bikaranîna vî cînavî jî di vegotinê de ji bo pêşxistina edebiyata jiyannameyê û bizava şîrovekariya derûnî vedigere ku bandoreke wê ya kûr li ser hizrên rojavayî hebû*."[78] "*Yekemîn kes jî ku ev cînav di vegotinê de bikar anî Marcel Proust û Splin bûn li Fransayê çimkî vegotina bi vî cînavî rasterast xwîner tevlî hizr û têgihîştina vebêjer dike. Ev jê tê wateya ku têgihîştina xwîner û mewdaya*

---
[76] Se'îd, Teknîka Vegotinê, r. 117.
[77] Mihemed, *Binyata Bûyerê,* r. 167.
[78] Se'îd, *Teknîka Vegotinê,* r. 117.

*wergirtina wî ji bûyeran re girêdayî wan hurdekarî û şîrovekariyên cuda ye ku vebêjer wan pêşkêş dike*."[79]

Herwiha pir caran di rexneya edebî de ji vî cînavî re dibêjin: Ez an min a Descartes "*Di dema xwe de* René *Descartes 1596-1650 ev min-ez di nivîsandina berhema xwe ya Ponijînên Felsefî de bikar aniye, lewra jê re min an ez a Descartes tê gotin*."[80] Nerînên din jî hene derbarê bikaranîna cînavekî din jî li tenişta cînavê kesê yekem min – ez yanî axêver. Hinek rexnegir behsa cînavê nediyar ê kesê sêyem jî di vê cureya nerîngehê de dikin "*Todorov vê cureya vegotinê tenê bi cînavê kesê yekem ê axêver ve girê nade, lê li tenişta bikaranîna vî cînavî amaje dide bikaranîna cînavekî din, dibe ku cînavê kesê yekem ê axêver û kesê sêyem ê nediyar di vê vegotinê de bê bikaranîn, lê hertim divê li gor dîtina heman kesê çîrokê bo bûyeran be*."[81]

Li vir diyar dibe ku hinek caran di vê cureya vegotinê de, vebêjerê hemantiştzan du cureyên cînavan bikar tîne, lê ya li vir girîng e di bikaranîna van her du cureyên cînavan de "*Dema çîrokbêjê hemantiştzan cînavê kesê sêyem ê nediyar bikar tîne, ev bi ti hawî bandorê li ser cureya vegotinê nake û mecala tevgerê li ser asta dem û cih berfireh nake û zanyariyan derbarê karakter û bûyeran zêde nake û nabe sedem ku ew xwezaya çîrokbêjê hertiştzan werbigre, çimkî di demekê de çîrokbêjê hertiştzan li derveyî çîrokê dibe û hertiştî dizane, çîrokbêjê hemantiştzan her di hundirê çîrokê de dimîne. Lewra çîrokbêj çi bi rêya kesê yekem an bi rêya kesê sêyem bi karê vegotinê rabe, kesayetiyê ji goşeyeke diyarîkirî dibîne*."[82]

Hêjayî gotinê ye ku di romannivîsiya îro de bêhtir girîngiyê didin vê cureya nerîngehê û bi rengekî berfireh bikar tînin, dibe ku hokara girîng ew be bêhtir vebêjer ji takdengiyê bibe pirdengî yan ji serpêhatiyeke dîrokî berê xwe bide metineke edebî û pirdeng, lewra derbarê romana kurdî di îro roj de belavtirîn cureya nerîngehê ye ku hest pê tê kirin. Wek me li jor jî got, vegotina xweyî ku bi rêya vebêjerê hemantiştzan tê cîbicîkirin di temamiya romana

[79] Se'îd, *Teknîka Vegotinê,* r. 118.
[80] Rojbeyanî, Zahir, *Çîroka Hunera Kurdî (Şêwe-Şêwaz-Binyat),* Çapxaneya Xanî, Ç. 2, Dihok, 2008, r. 175.
[81] Sabir, *Bînaya Hunera Çîroka Kurdî,* r. 219.
[82] Sabir, *Bînaya Hunera Çîroka Kurdî*, r. 219.

*Mîrname* de serdest e bi ser vebêjerên din de, her beşekî vê romanê bi tena serê xwe mînakek e ji vebêjerê hemantiştzan.

Mebesta nivîskar ji afirandina vê cureya metinê, derbaskirina teknîka kevin a romana kurdî û anîna holê ya teknîka nû ya vegotinê ye bi rêya vebêjerê hemantiştzan, di encamên herî berfireh ên romana nû ya hevçax, derketina diyardeya pirdengiyê ye ku wek destkefteke mezin di romanê de tê hejmartin. Di romana *Mîrname* de, nivîskar pir bi şehrezayî û miqateyî hewl daye vê têgeha nû bikar bîne, dema bêhtirî vebêjerekî beşdar dike di proseya vegotinê de ji pêşiya romanê ve ku bi Teymûrê Fasiq dest pê dike heta digihe nameya Xanî ji Mîr re, hemû vebêjer beşdar in di bûyeran de û behsa pêwendiya serdema xwe bi Xanî re dikin û herwiha jiyan û kar û pîşeyên xwe û rewşa xwe ya civakî di wê heyamê de û behsa mirinê û gumanên ku li ser mirina Xanî hene dikin.

Herwiha xwezaya wê pir vebêjeran di romana Mîrname de, xwezayeke dramatîk e û hewl dide bi wekhevî mecalê bide hemû vebêjeran ku dîtin û bîr û bawerî û têkiliyên xwe bi bûyeran re nîşan bidin. Herwiha nivîskar hewl daye dîktatoriya yekdengî û monopola romanê ji vebêjerê hertiştzan werbigre û bispêre çend vebêjerên din. Wiha jî hewl hatiye kirin ku pirbûnê di nerîngehê de derxe holê. Vebêjer bi rêya cînavê axêver min-ez bûyeran vedibêjin, herçiqasî li hinek cihan vebêjer cînavê nediyar ê kesê sêyem bikar tînin, lê ev nabe sedem ku nerîngeha vebêjer biguhere, lê dîsa her mohra vebêjerê hemantiştzan e sîmaya vî vebêjerî li ber çav hatiye girtin.

Piraniya vebêjeran wek vebêjerekî beşdar di bûyeran de derdikevin û vebêjer di dema niha ya vegotinê de ji me re behsa rabirdûya bûyeran dikin, piştre vedigerin dema niha. Di navbera dema niha ku dema vegotinê ye û dema rabirdû de çûnûhatinê dikin. Ev jî baştirîn belge ye ku vebêjer bi xwe ezmûna jiyana xwe bi bûyeran re ji me re behs dikin. Piraniya vebêjeran bandoreke mezin li ser rêveçûna bûyeran dikin. Em jî wek mînaka vebêjerê hemantiştzan çend dengên cuda werdigrin:

Teymûrê Fasiq: Ev vebêjer yek ji karakterên derdora Xanî ye, yekem vebêjer e ku rasterast piştî beşê yekem diaxive û behsa pêwendiya ezmûnên jiyana xwe bi Xanî re dike, piştî ku Xanî vedişêrin û telqînê li ser dixwînin, êdî bi gotina Teymûrê Fasiq baraneke reş a

mîna mirekebê hibir dibare. Yek ji hewldanên herî bedew ên romannivîs bo guhastina vebêjerê hertiştzan bo vebêjerê hemantiştzan dispêre vî vebêjerî dema vebêjerê hertiştzan dibêje: Teymûrê Fasiq hawar kir û got mirekeb dibare, mirekeb. Êdî rasterast tê ser beşê Teymûrê Fasiq vebêjer bi cînavê axêver ê ez, min dest bi axaftinê dike û dibêje: "*Gava ez qêrîyam û min got: hibr dibare! Ez ne serxweş bûm. Hefsarê hişê min di destê min de bû û min bîna hibrê jî, ji bîna xwêdana paxilên yarika xwe ya ermen bêtir nas dikir. Kesên ku li dora gora Xanî kombûbûn û li telqîna şêx Seyfeddînê xwediyê cubbeyê şîn û dilê reş guhdarî dikirin, bi qêrîna min re li min nihêrîn û pişt re qijikên awirên xwe ber bi jor de firandin û kefên destên xwe mîna kewan dane ber çipikên ku di rengê hêsrên bi kila çavên jinên di şînekê de, têkelbûyî bûn*"[83] Herwiha ev vebêjer berdewam dibe li ser axaftinê bi heman cînavî û behsa pêwendiya xwe û Ehmedê Xanî ji me re dike û dibêje: "*Tilîyên wî reş bûbûn û diyar bû ku xweş bi Mem û Zîna xwe de çû bû.*

*Çend malikên ku tê de behsa Meyê kiribû xwendin. Gelekî xweşik hûnandibûn û weke yekî meyxur behsa meyê kiribû. Wî nivîsîbû ku divê Saqî bêdeng meyê pêşkêşî wî bike, bêyî dengê defê û sedayê qanûnê!! Ez kenîyam û min gotê:*

*- Seyda! meya bi dizî weke…*

*Ken û axaftina min, bi kenekî sivik rawestand û got:*

*- ez dizanim tu yê çi bibêjî!! Ez diazanim. Lê ev meya ku ez behsa wê dikim meya tesewwufê ye Teymûr. Meya rûhanî ye ne ji tirî ye! Ew mey ji libên dilan ku di destên xwedê de têne guvaştin peyda dibe.*

*Paşê murekkebdanka xwe vekir, bîn kir û nêzîkî pozê min jî kir û got:*

*- ka tu zanî bîna çi jê tê?*

*bîneke xweş bû, lê min nizanîbû bîna çi ye, wî mey û hibr tev li hev kiribû û çend malikên dîbaceyê pê nivîsîbûn, lê ew bîna çi bû, çi yê din jî tev li hibra xwe kiribû û dixwest çi pê binivîse min nizanîbû! Min li çavên wî yên ku di ronîya mûmê de kenokî xuyadikirin nihêrî*"[84]

Bi vî rengî ev vebêjer bi nerîngeha xwe ji me re behsa bûyeran dike û zanyariyên vî vebêjerî derbarê karakter û bûyeran yeksan e û wek zanyariyên karakterên romanê ye.

---
[83] Jan Dost,*Mîrname*, r. 21.
[84] Jan Dost,*Mîrname*, r. 25.

Mîrza Sabrî: Yek ji wan karakterên li dijî Xanî ye û di xelek û çarçoveya Mîr de ye. Ev vebêjer ku beşek ji vegotina romanê bûye para wî, vebêjerekî hemantiştzan e, di destpêka vegotina xwe de behsa nankorî û nedilsoziya Xanî li hember Mîr dike û bi berdewamî Xanî şermezar dike û bawer dike ku Xanî ne hêjayî efû û toleransê ye. Yek e ji wan karakterên ku ligel yê rûgirtî plana kuştina Xanî datîne. Di destpêka vegotina xwe de, bi vî rengî diaxive: "*Qûmdanka ku wê êvarê me di destê Xanî de dît, diyarîyeke hakimê me yê rehmetî Mîrza begê Pisyanî bû. ji Kaşana Ecemistanê ji wî re hatibû wî jî neda kesekî ji bilî Xanî. Mîrên me yên destbela û dilvekirî û bi rehm, kesî ji xêr û kerema xwe mehrûm nakin. Lê kesên bênan û xwê û nemekheram jî hene ku bi tu wechî ne layiqê comerdî û sexaweta Mîranin. Xanî yek ji wan kesan bû. Her çendî ku Mîrekên Bazîdê hemûyan qencî pê kiribûn jî, û heta li ba hinan jî munşî û katib û debîrê dîwanê bû , wî di kitêba xwe de dev avêtibû Mîrê berê Mîrza beg û gotibû:*

*Lewra ku ewî nekir pesende*
*B`esl û neseba xwe ew Rewend e!!*"[85]

Dema Xanî di Mem û Zînê de xeber ji Mîr re dabû, Mîr pir ji vê yekê dilgiran bûbû. Mîr gazî Mîrza Sebrî dike da bibînin ka wê çi bi Ehmedê Xanî bikin. Mîrza Sebrî jî plana kuştina Xanî datîne bi rêya kesekî bi navê yê rûgirtî, rojekê di hucreya Xanî de planê cîbicî dikin. Bi vî rengî vebêjer behsa plana xwe ji me re dike: "*<u>Min</u> ku wa got, dizanîbû ew dê qebûl neke li meclisa Mîrê me yê dilxweş û hişmend beraeta xwe beyan bike. Ji xwe goya ku wî nigê xwe hinne kirine, nema diçû hizûra mîr. Êdî min dixwest Xanî pirr dilteng û sergerm bibe. Meqseda min ew bû ku ez wî bêtir bihêvojim û niyetên wî yên nihênî û veşartî derînim. Ma ku yek xweliyê tev nede pertewan dibîne?? Lê wî her bi nermî cewaba min da û derûnê xwe yê reş bo me di wê şeva reş de kifş nekir.*

*Tenê carekê derket ku avdasê bigre, hema mirovê rûveşartî bi lez rabû û zeyta çiraya wî bi zeyteke di paşila xwe de guherî û hat weke berê rûnişt. Mele Ferîd bala xwe nedayê,ew bi ser kitêbekê de xwar bûbû. Lê min dizanîbû ku êdî jehr kete hucreya Xanî.*

*Di riya vegerê de, kîmyagerê rûpoşîde gote min:*

*- Jehr jî zeyteke qenc e ha!.*

[85]Jan Dost,*Mîrname*, r. 81.

*Mele Ferîd fam nekir ji xwe ponijî bû bawer dikim wî guhdarî jî nekir. Pişt re mirovê rûgirtî hinekî bi ser min de xwar bû, devê xwe xiste guhê min û bêyî ku mele Ferîdê rû ji tirsan zer bûyî bibihîze got:*
*- Hefteyeke din, yan heta deh panzde rojê din, pirr bi derengiyê bikeve heyveke din şolê Xanîyê we yê serkeş temam dibe. Inşaellah dê fatiheya wî were xwendin bêyî ku ew jî zanibe çi bûye. Ku mewta wî ne bi zeytê be dê bi hibrê be. Ew nagihêje ku hîva remezanê bibîne.*"[86]

Şemsoyê Qewal: Yek ji karakterên romanê ye. Vî vebêjerî ji Xanî hez dikir, lê ji ber cudahiya bîr û baweriyên wan ku Şemso bi xwe kurdekî mesîhî bû, kêmtir çarçove û xeleka hezkirinê bo Mîr an bo Xanî yan bo wan bûyerên ku diqewimîn kişandiye û hewl daye li derveyî vê xelekê be û vebêjer bi cînavê axêver ê min, ez bûyeran vedibêje û dibêje: "*Wê sibeha han, min nediva ez ji malê derêm. Min qaweya xwe danî bû û qelûna xwe tijî tûtûn kiribû. Di pencereyê re min dikarîbû bi hêsanî tayên baranê bidîtana û dengê hin çipikên ku li kevîka pencereyê diketin bibihîstana.*
*Ku çawa min qurtek li qaweya xwe û mizek li qelûnê xist, jina min ji derve hat û bi tirs got: Şemso hela rabe seh bike dengê muezinekî tê dibêje nizanim kî miriye!*
*- Wî jinê ma ecêb e!! Rojê yek dimire. Şare û mezine*
*Min wisa gote jina xwe û qurt û mizên xwe dewam kirin. Lê dengê muezin bi bayê ku li derve dikire guveguv re her ku diçû nêzîktir dibû. Di pencereyê re jî tayên baranê êdî tarîtir, lê nermtir û hûrtir dibûn. Qaweya min bi nêvî bûbû nebûbû, dengê qebe hat û min xebera reş weke wê barana reş guhkir:*
*- Cemaeta misilmanan! Şêx Ehmedê Xanî çûye rehmetê. Dê cenazeyê wî bibin camiya jor. Ji xêra nimêja cenaze mehrûm nemîniiiiiiiin.*
*Di gel ku min dizanîbû Xanî di rojên xwe yên dawî de bû jî, dîsa ez bi bihîstina xebera mirina wî re di erdê xwe de cemidîm!*
*Min çend hilmên sivik û li pey hev, li qelûna xwe ya darînî xistin û qaweya xwe nîvco hêla û hatim ku derkevim, jina min got:*
*- Kuro Şemo bi ku de!!*
*- Dê herim bi cenaze re bimeşim.*

---
[86]Jan Dost,*Mîrname*, r. 87-88.

*- Wî! Qey guhê te gemar girtine yan simîyane? Ma te nebihîst mêrik bangî cemaeta bisirmanan tenê dike!*
*Ez bi ser jina xwe de rabûm û min hindik mabû kulmistek di nav çavên wê de werbikira, lê destê min lê negeriya û min gotê:*
*- Hurmet ev Ehmedê Xanî ye ne kesekî din e, çi karê min bi banga mêrik ketiye!!*
*Û min kurkê xwe yê bi postê berxikan astarkirî avête ser herdu milên xwe û derketim.*"[87]

Lê divê em vê yekê bizanin ku ew bi xwe ne dûr e ji bûyeran û haya wî ji bûyeran heye, ew bi xwe jî îşaretê bi vê yekê dike û dibêje: "*Di gel ku min <u>dizanîbû Xanî di rojên xwe yên dawî de bû jî,</u> dîsa ez bi bihîstina xebera mirina wî re di erdê xwe de cemidîm!*"[88]
Girîngtirîn tişt li ba vî karakterî ew e ku bîr û bawerî û fikira Xanî li ser pirbûna olî li Bayezîdê dide me û bawer dike ku rojekê ji rojan peyvek ji devê Xanî derneketiye derheqa dînê me, berevajî vê wî hertim rêza min digirt û digot: "*Lê tucarî Xanî gotineke ne di rê de derheqê me û dînê me de nekir. Vajî wê, wî her qedrê min digirt û digot:*
*- çiqas rê hene, hemû digihên xwedê teala.*
*- kafir jî!!*
*- Gotinên kafir, yezîdî, misilman, nesranî, yehûdî di zahirê xwe de ji hev ferq û cuda ne lê di eslê xwe de yekin. Hemî nuqteyên li pê hev rêzkirî ne di dayireya wucûda zatê ilahî de. Xwedê bi hikmeta xwe gelek mezehb û dîn nazilî ser insanan kirine da ku çavnasî hev bibin. Eynî mîna rengrengîbûna kulîkan û her tebayî di erd û ezmanan de. Xwedê bi zatê xwe nod û neh navên wî hene!! Lê sûcê ku heye û hiştiye tefrîqa di nav benîadem de hebe, sûcê benîadem bi xwe ye.*
*- Yanî tu karê Iblîs pê tunne!!*
*Ku gotin dihate ser Tawusê melek dikeniya û diçû li ber çirayê disekinî û digot:*
*- binêre ev çirax e!! Serê wê agire, him ronahîyê dide, him jî dikare bisotîne. Ew di destê te de ye. Tu û iradeya di dilê te de. Îca Ezazîl jî ku di nava firişteyên xwedê de navê wî hingî ku perestiya xwedê dikir tawusê firişteyan bû, ew misal e. Ew di destê xwedê de bû, xwedê jî çi jê*

---
[87] Jan Dost,*Mîrname*, r. 185-186.
[88] Jan Dost,*Mîrname*,r. 186.

*re irade kiribû, wisa bû. Misqalê zerreyekê nikaribû bêyî iradeya xwedê teserrufê bike. Îca çi heqê kê heye ku lanetan lê bibarîne!! Gunehê wî nîne nîne.*"[89]

Eger em binerin hemû karakter di beşên ku vedibêjin de zanyariyekê derbarê Xanî didin me. Zanyariyên karakterekî cuda ne ji zanyariyên karakterekî din. Û beşê her vebêjerekî ku vedibêje bi tena xwe mînakeke li ser vebêjerê hertiştzan.

#### 2.2.2.3. Dîtin ji Derve (Vebêjerê Kêmtiştzan)

Di vê cureya nerîngehê de zanyariyên vebêjer ji zanyariyên karakteran û serbestî û azadiya vebêjer ji serbestî û azadiya karakteran pir kêmtir e, lewma ji vî cureyê vebêjer re tê gotin vebêjerê kêmtiştzan. Hêjayî gotinê ye ku ew zanyariyên ku li ba vebêjer hene tenê bi alîkariya aliyê derve yê karakteran tên bidestxistin ku xwe di tevger û dengê karakteran de dibîne, yanî tenê bi rêya dîtin û bihîstinê dikare zanyariyan bidest bixe. Di vê cureya nerîngehê de "*Vebêjer ne bi rêya hestên xwe be nikare tutiştî pêşkêşî me bike, ji xeynî wan tiştên ku tên dîtin û bihîstin. Heke na ti rêyeke din li ber me nîne da em bizanin çi di dil û derûna karakteran de heye.*"[90] Li vir vebêjer li derveyî xeleka bûyerên romanê ye û bi rola şahidhal radibe. Di vê cureya nerîngehê de, "*zanyariyên vebêjer kêmtir in ji karakteran û erkê komkirin û dîtina nûçe û zanyariyan li stûyê xwe digre û li hêleke din çavê wî ne li arasteyeke cihgirtî û destnîşankirî ye.*"[91]

Derbarê kêmbûn û qelsiya vê cureya nerîngehê di metinê romanê de, wiha li rexnegiran kiriye tenê du cureyên nerîngehê ji romanê re diyar bikin ew jî nerîngeha derveyî û nerîngeha navxweyî ye, ku ligel vebêjerê hertiştzan û hemantiştzan hev digre. Ev cureya nerîngehê jî bêhtir dikeve ber xaneya nerîngeha derveyî. Derbarê girîngîdana bi vê cureya nerîngehê, emê nerîna Todorov werbigrin ku bawer dike "*Nezanî û bêagehiya nîv temamî ya vebêjerê kêmtiştzan di vê rewşê de, tenê tesaduf e û hew, heke na têgihîştina ji hîkayeteke bi vî*

---

[89]Jan Dost,*Mîrname*, r. 188.
[90]Se'îd, *Teknîka Vegotinê* , r. 121-122.
[91]Amêdî, *Nerîngeh*, r. 51.

*rengî dijwar e.*"[92] "*Ev cureya vegotinê di sedsala 20an de di encama kartêkirina hunera sînemayê derket holê, di aliyê bikaranînê de jî di warekî teng de tê bikaranîn.*"[93]

Di romana kurdî de li gor cihê vebêjer û wan zanyariyên ku vebêjer wan dizane cihê rawestana vebêjer e, ango dîtin ji paş ve yan dîtin ligel an dîtin li derve nîşan didin ku di romana kurdî de cureya yekem û cureya duyem bi awayekî pir berfirehtir ji cureya sêyem tên bikaranîn.

Li gor têgihîştina me û xwendina me ji romanê re, tenê li cihekî vebêjerê kêmtiştzan di pêvajoya vegotinê de beşdar e, ew jî di beşê vebêjerê mirovê rûgirtî de, herçiqasî ev vebêjer di wî beşê ku vedibêje de zanyariyên baş li ba wî hene û şehreza ye û ew zanyariyên ku li ba wî ne, li ba vebêjerekî din nînin, lê li cihekî ji bo demeke pir kêm ev vebêjer ji hemantiştzan dibe vebêjerê kêmtiştzan ango proseya vegotinê ji xweyî dike babetî, gava wê hokarê nizane ku çima divê Xanî bê kuştin wek ew bi xwe dibêje: "*Min sêzde zêr ji mîrza Sebrî pêşinde ji bo kuştina Xanî wergirtibûn, soza heft zêrên din jî da bû min. Tirsa min ew bû ku Xanî ji êşa xwe veterise û mîrza Sebrî ne tenê heft zêrên mayî nede min, lê wan sêzde zêran jî ji min bistîne. Xanî dê ji bo çi bihata kuştin?*"[94]Li vir derdikeve ku zanyariya vebêjer derbarê çîrokê û sedema kuştina Xanî nîne, lê ew tenê ji bona wergirtina pereyan vî karî dike, ango Xanî dikuje. Herwiha ti zanyariyeke wî derbarê jiyan û reftarên Xanî nîne, lewra jî di dawî de ji kirdeya kuştina Xanî poşman dibe. Bi baweriya me kêmtiştzaniya vebêjer bandoreke mezin li ser romanê kiriye, çimkî eger zanyariyên wî li ser Xanî hebûna dê ew nekuşta û bûyerên romanê jî bi vî rengî nedibûn, lewra di berdewamiya axaftina xwe de dibêje piştî mirina Xanî min cesaret nedikir ez beytikekî jî bikujim, herwiha dibêje: "*Min ku gora wî kola jî, xwest hinekî gunehên xwe daweşînim û xêreke min hebe. Heta ji min hat min goreke qenc û fereh jê re kola. Ku min termê wî daxiste binî û ew bi hurmet û hêdî derbasî berqefê kir, min di guhê wî de got: seyda xwezî min zanibûya kê ruhê te yê delalî kişandiye. Welleh dê niha berî te ew di gorê de bûya!!*"[95]

---

[92]Se'îd, *Teknîka Vegotinê,* r.122.
[93]Sabir, *Bînaya Hunera Çîroka Kurdî*, r. 220.
[94]Jan Dost*, Mîrname*, r. 204.
[95]Jan Dost,*Mîrname*, r. 207.

Nebûna vebêjerê kêmtiştzan di vê romanê de girêdayî wê yekê ye ku xwezaya romanê ji zanyariyên temam ên vebêjeran derbarê bûyerên romanê pêk tê. Temamiya romanê ji hemû vebêjeran pêk tê, eger yek ji vebêjeran bê rakirin, mirov hest dike ku derzek di romanê de peyda dibe, yanî roman wek wêneyeke rengereng a mozayîkê ye.

### 3. Dema Vegotinê

Dem di romanê de xwedî girîngiyeke berçav e bi awayekî ku “*hewl dide karê xwe damezrîne û hebûna xwe jî îsbat bike li ser herdu astên hebûna berdewam a demê û ya kronolojîk.”*[96] Herwiha dem pêk tê: “*Ji wê dema rêjeyî ku awa yan çawaniya vegotina bûyeran û livandina kesayetiyan di dema niha û rabirdû û paşerojê de li gor şêwaza vegotina metinê birêk dixe.”*[97]

Di meseleya vegotinê de,Dem regezeke bibandor e û pir bi girîngî ji hêla rexnegiran ve hatiye dîtin, bi awayekî ku hinek bawer dikin: “*Ti yek ji wan regezên ku romanê pêk tînin wek (demê) ne girêdayî romanê ye, çimkî vegotin bêyî dem pêk nayê.”*[98]

Têkiliya navbera vegotin û demê de têkiliyeke têkilîhev e û digihe astekê ku ne vegotin bêyî demê dibe û ne jî dem bêyî vegotinê dibe. Tiştê ku zelal û eşkere ye di rêveçûna xwezayî û jiyana mirovan de sê cureyên demê hene ku li ser hêleke rast diçe û ti kes nikare wê dema siruştî biguhere bi awayekî ku bipêş bixe yan bipaş bixe yan bixwaze rawestîne. Siruşta deman jî di jiyana mirovan de dema rabirdû, niha, dahatû, her mirovek xwedî demeke rabirdû ye û bi awayekî ji awayan tê de jiyaye. Em hemû jî bi berdewamî di dema niha ya jiyana xwe de dijîn û çaverêya siberoj û ayînda xwe dikin. Ev rêveçûna xwezayî ye di desthilata me de ye. Lê tiştê ku di nav teksteke romanê yan di nav teksteke çîrokê de guhertin tê serê ew rêveçûna siruştî ye bi rengekî, “*dem ji rêveçûna xwe ya xwezayî derdikeve û tevlî wê realîteya xeyalî dibe ku roman wêneya wê dikşîne*.”[99] Ev jî di vegotinê de bi awayekî dibe ku, “*bi dûhevhatina demê têk diçe û vegotina dema bûyeran bi awayekî hostane veguherîn pê tê kirin, ew dema xeyalî jî ku bingeha wê ji realîteya normal û rojane çavkaniya xwe digre û piştre bi têkilbûna wê bi xeyaleke afirîner û himbiz re, realîteyeke nû dirust dike*.”[100]

---

[96]en-Ni‘êmî, feysel Xazî, *el-‘Elame Fî Sealasye Erz es-Sewad Lî‘ebidllrehman Munîf*, Etruhe Dktura’, Camî‘e el-Musil, Kliye et-Terbiye, 2005, r. 33.
[97] Elwenî, Necm Xalid Necmedîn, *Bînaya Demê Di Sê Mînakên Romanên Kurdî de (Jana Gel, Şar û Raz)*, Weşanxaneya Serdem, Silêmanî, 2004, r. 54.
[98]Se‘îd, *Teknîka Vegotinê*, r. 45.
[99]Fethulla, Şaho Se‘îd, *el-Bu‘d el-Felsefî Lîtetbîr er-Rîwayî – Dîraset Zehratiye Fî Tecrebet Selîm Berekat*, Etruhe Dktura’, Kliye el-luxat, Camî‘e es-Suleymaniye, Kanun el-Ewel 2006, r. 34.
[100]Elî*, Rengdana Realîzma Sihrî,* r. 304.

Lewra diyar dibe ku du cureyên me yên demê hene, ew jî demeke siruştî û neguhêr û girêdayî jiyana rojane ya hemû mirovan e, ya din jî dema romanê ye ku guherîn bi ser tê, ev şêweya guherînê jî bi piranî bi du rengan diyar dibe:

"*1.Şêweyek ji niha vedigere rabirdû.*

*2. Şêweya din jî ji niha diçe dahatû û hin caran jî vedigere dema niha û rabirdûyê jî.*"[101]

Tiştê ku girîng e li vir bê zanîn ew e ku nivîskarên şepêla hiş yekemîn nivîskar bûn, ku cureya duyem a van deman afirandin û rabûn bi dabeşkirin û guhertina deman bi arezûya xwe, parçekirina demên rabirdû, niha û siberojê yarîkirin bi beşên din ên demê ye. *"Vê yekê jî bala formalîstên rûs kişand, nemaze Tomashevsky ku zaraveya dema hîkayetê afirand."*[102]

Eşkere ye ku dema romanê ji dema siruştî ya mirovan cuda ye, "*ew jî ew e ku dema romanan di dema psîkolojîk de tê avakirin, neku li gor dema kronolojîk, zemanekî xweyî ye ku jêhatîbûna romannivîs romannivîsê baş şêweyeke babetî didiyê da bi vê rêyê wiha li romana xwe bike ji cîhana reel dûr bikeve û jê cuda bibe.*"[103]

Di dema niha de eger em binerin romannivîs bi rengekî berfireh vê cureya demê bikar tîne, herçiqasî divê em vê jî bizanin ku cureya yekem ji demê ango dema siruştî metinê romanê pê hatiye nivîsandin, ku di romana kevin de berçav dibe, ku romannivîs dema siruştî pêrew kiriye, lê ya ku di dema niha de belav e û wek teknîka nivîsandina romanê tê bikaranîn dema hîkayetê ye ku girîngiyeke berçav pê tê kirin. Emê jî hewl bidin di vî beşî de teknîkên dema vegotinê nîşan bidin û li ser wan rawestin.


---

[101] Elî, *Rengdana Realîzma Sihrî,*r. 304.
[102]Se'îd, *Teknîka Vegotinê,* r. 46.
[103]Yosa,*12 Name,* r. 75.

### 3.1.Beşên Dema Vegotinê

#### 3.1.1. Dema Dîrokî(Historical)

"*Ji wê wext û dema ku bûyer tê de diqewimin pêk tê. Bêhtir di romana teqlîdî de hatiye bikaranîn.*"[104] Tiştê ku di vê cureya dema dîrokî de bi zelalî û eşkereyî tê dîtin ew e ku romannivîs bi eşkereyî amaje dide tuxmên demê û bi hûrbînî behsa wan dike, wek bikaranîna roj, meh, sal, hefte û demjimêr, lê divê em wê yekê jî bizanin ku ne merc e pir caran tuxmên demê amajeyeke wan a zelal hebe bo tarîx û dîrokekê di nava romanê de. Birêkxistina dema dîrokî di van cureyên romanan de wek birêkxistina bûyereke dîrokî ye, ku di demeke diyarkirî de dest pê dike û di demeke diyarkirî de dawî lê tê, ango, "*dema bûyeran bi şêweya zincîreke lojîkî ya xwedî destpêk, navend û dawî birêve here*".[105] Wek vê hêlkariyê:




Dema dîrokî di vegotinê de bêhtir wek demeke me ya fîzîkî û rojane û normal tê bikaranîn. Ev cureya demê gelek roman pê hatine nivîsandin di dema kevin de heta derketina cureya duyem a demê ku dema derûnî-psîkolojî ye.

Wek xuya û eşkere ye romana Mîrname, bûyerên wê bi piranî bûyerên dîrokî ne û ji me re behsa dîroka destpêkên sedsala 18an dike. Romannivîs hewl daye bibe neynikek da rastiya civaka wê demêji nifşên niha re nîşan bide. Her ji vê nerîngehê jî, li gor têgihîştin û îdraqa me dema dîrokî li gor demên din bêhtir hatiye bikaranîn, herçiqasî ev dem berhema romana kevin e û di dema niha de di romana nû de kêmtir girîngî pê tê kirin, bêhtir dema derûnî niha belav e, lê bi baweriya me ji ber ku kereste û malzeme û bûyer dîrokî ne, lewma bêhtir dema dîrokî hatiye bikaranîn, li gor xwendina me ji vê romanê re, emê çend mînakên dema dîrokî bînin wek:

---

[104]Se'îd, *Teknîka Vegotinê,* r. 48.
[105]Se'îd, *Teknîka Vegotinê,* r. 48.

*"roj nû hilatibû. Êdî çiyayê Gilîdaxê bi berfa xwe ya spî em hênik dikirin û qewet dida me. Em çiqas dûrî çem diketin û nêzîkî Rewanê dibûn jî, çiya mîna xwe bilind û spî dima. Ji xwe ji ber şewqa rojê te digot qey ew perçeyekî mezine ji gewher û mirarîyekî di taca serê sultanekî mezinî qeba şîn de. Ewran xwe li serî gerandibû. Ê me jî xewn li serê me bûbûn şaşik û ewr.*

*Bernîvro em gihanê şarê Rewan. Dengê gurmîna dahol û naqûran erd û ezman dihejandin. Her bi gurmînekê re dilên me jî dihatin ku ji sîngên me bipekin. Bi wî awayî em gihane ber çemê ku şar dorpêçkiribû, te digot şarê Rewanê bûkeke û av kemera wê ye. Lê ne av û ne agir karîbûn li ber leşkerê sultanê mensûr rawestiyana. Leşkerên me, peyade û siwarî û yenîçerî û heta siyahîleşkeran jî bi hezaran li hawîrdor rêzbûbûn. Li hêla din jî Qizilbaş û leşkerên eceman ji daberizînê re hazir bûbûn. Bi fermana sultan re pêlên leşkeran bi nav hev ketin. Me hêriş kir û em mîna gulokên agir bi pêş de çûn.*

*Hevalekî minî Diyarbekrî jî satirçî hebû. Hîn berî ku em bigihên Rewanê min û wî me hevaltî kir. Wî xwezîya xwe bi jiyana li Stenbolê dikir û digot bila ez li wir bim, bila hema bibim tewaciyek. Ez dikenîyam û min digotê: pismam tu bêgunn li Stenbolê bijî, mîna ku tu najî! Wî digot: na pismam na!! ma te ne got ezê li Diyarbekrê çi bikim ji van gunnan! Li vir bi kêrî min nayên dê li wir jî bi kêrî min neyên.*

*Em di şer de jî li rex hev bûn û ku agirê sewaşê hilbû ew li hêla min a rastê bû, wî ez diparastim û min ew. Lê tiştê ku hate serê min û wî nehate serê tu kesî.*

*Eceman gelekî li ber xwe didan. Serdarê wan dizanîbû ku ew bişikê dê şahê li Esfehanê Sefî Mirza herdu çavên wî bi sîxên sorkirî derîne û wî di binê bîreke zuwa de birizîne.*

*Îcar wan ecêb liberxwedidan, gurz dihejandin û di serê leşkerên me werdikirin. Tîr per dikirin û di sîngên me de diçikandin û di piştê re derdixistin. Ê ku binber û zirxê wî hebûya ne xema wî bû, lê rebenên mîna me av û av diçûn. Şûrên misrî, Caferî, Hindî û Lahoran hevdu radimûsandin û jehra mirinê ji ramûsanên wan diwerivî. Aşê ecel hate gerandin û serî mîna daneyan hêran.*

*Siwarên pehlewan li bin guhên hev diketin. Ji her alî dadiberizîn hevdu û serî difirîyan û dest û pa qut dibûn. Nalîn û efxanên birîndaran, hîrehîra hespan û heyheya serbazan bû. Êdî her kesî digot xwedêyo ez. Hevalê min ê Diyarbekrî dev ji min bernedida. Satûrê xwe li ba dikir û sînga qizilbaşan pê diqelaşt.*

*Ez jî weke ku satûrê min birûskek be di destê min de, min ew çep û rast vediweşand û dara jîyana serbazan ji kokê de hildikir. Heta carekê du heb bi ser min de hatin. Min bala xwe da wan ku bi zend û binber in, bi cewşen û kumê zirxkirî û teberzînin û her yekî kolosek li serî û reng û rûyên wan mîna hevin. Goya ku bi salane meşqên sewaşê kirine. Weke hev tevdigeriyan. Bi hev re dihatin pêş û bi hev re bi şûn ve diçûn. Goya ku herdu yekmirovin lê bi du laşanin. Ji nava ewqase leşker berê xwe dane min û hemle kirin. Min jî yeka xwe nekire du û satûrê xwe veweşande ê ku pêşiyê hate pêşberî min. Satûrê min di sînga wî de lêket û min dît hinavên wî xuyabûn. Kezeb û dilê wî xuyabûn û bi derbekê re sist bû û stûyê wî xelîya. Ku min satûrê xwe kişand çavên min li dil û cigerên wî yên rijiyayî ketin. Ulq hatin min û hindik mabû ez verîşim. Hevalê min ê Diyarbekrî xwe da rex min û got: malavayo li birîna vî qizilbaşê nepak û heram nenêre. Hay ji xwe hebe va yê din jî hat. Kuro xwe bide alî va ew seg hat. Bi rastî jî ewê din ku çav li hevalê xwe ket çawa hate xwarê, qêrîna heft jinbîyan pê ket û got:*
*- Way Heme birakem way Heme birakem!! Jînim le paş mergit heram bê.*
*Wî jî mîna me bi kurmancî xeber dida, erê hinekî ferq dikir lê min jê fam kir ku ne ecem û qizilbaş e. Ku min ew ne kuştibûya minê ji ku zanîbûya ew jî kurmanc e!! Ancex mirina wî ew bi min da naskirin. Çi bikim? qeder e û şer e û diviyabû yek ji me yê din bikuje.*
*Wî mîna berazekî berîya Mûşê hêriş kir. Şûrê wî du gazan dirêj bû. min nikarîbû ew bi satûrê ji ser xwe veda. Ew rimbazekî çargurçik bû û xezeb û kîn ji rûyê wî difiriyan. Em hatin rastî hev û çavên me berî me bi hev re şerkirin.*
*Ku min bi çavên wî de ziq nihêrî, nema dengê tiştekî hate min. Tenê dengê kînê û hewara tolhildanê ku ji herdu çavên wî yên reş bilind dibû dihate guhên min. Kurtekêlîkekê çokên min sist bûn û ez pê hesiyam ku di erda xwe de bûme mîxekî kutayî.*
*Yên ku berê ketibûn şer û sewaşan hîn em di rê de bûn gotine me ku we dît leşkerê dijmin rawestiya, fersendê nedinê û bi ser de bipijiqin. Min jî nexwest wê fersendê bidim wî şervanê han, xasma ku tenûra kînê di dilê wî de taze hatibû dadan û kuştina min li ba wî bûbû ferza nimêjê.*
*Ez pijiqîmê û qêrîyam û min got:*
*- Ey segbav were te jî bikim xwarina devê satûrê xwe.*
*Ew jî mêrekî ji pişta mêran bû, lehengekî têra xwe hebû loma jî xwe neda alî û hate min û qêrîya :*

*- Wey xot segî û bawkit seg e. Min Ewlayê Merîwanîm, perwa be mirdin nakem.*

*Û bû şingeşinga şûrê wî û satûrê min. Carekê min dît wî şûrê xwe veweşand rastî qafê min. ku min xwe nedabûya alî wê ez di nêvî re bikirama du felqe. Lê dîsa jî min xwe baş neda alî û şûrê wî bi ser milê min de hate xwarê. Heval û pişmêrê min ê Diyarbekrî dît ku ez ketime ber derbên wî û destê min ê rastê ji kokê de hatiye birrîn. Bi hewara min ve hat û xwe da aliyê min ê rastê. Birîna min germ bû û hayê min ji tiştekî nebû. Bi wî halî min satûrê xwe hîn dihejand û bi ser wî de diçûm. Min û hevalê xwe me ew da ber satûran û ew parçe kir û termê wî jî bi ser termê birayê wî de ramedand.*

*Ku birîna min hinekî sar bû, janeke ecêb kete sermilê min û xwîn bû kanî û ez ji ser hişê xwe çûm.*

*Dema ez hatim ser hişê xwe, xwîna min hîn diherikî. Birîna min dijeniya. Du eskeran hişk bi lingên min girtibûn û du eskerên din jî bi ser û destê min. Hekîmekî nisêbînî di ordîyê de li ber serê min bû û ez di binê konekî de bûm. Wî hekîmî satûrê min li ser agirekî sincirandibû. Êdî satûr bûbû pizoteke ji agirê cehennemê û ji nişkê ve bi wî satûrê sincirî birîna min dax kir û kewand. Ku goştê min kire çizînî qêrînîya min giha Gilîdaxê û ez dîsa ji ser hişê xwe çûm.*

*Ez nizanim çiqasî jihişçûyî mam. Lê ku dîsa hişê min hate serê min, min dît ku wî hekîmê Nisêbînî melhemek ji kevza çem û simaqê û kifika nanê kevn hazir kirîye û di şûna milê minî qutbûyî dide. Xwîn sekinî bû lê jana şewatê tev li ya birînê bûbû û erdê ez nedigirtim.*

*Sultanê me Rewan bi dest xistibû û hêlehêla leşkeran bû kêf dikirin û dîlan digerandin. Gelek ji wan bi talanê daketibûn û çek û cilên kuştiyan dicivandin.*

*Çend roj bi wî awayî derbas bûn, birîna min êdî sivik bûbû û milê min di nava melheman de mabû. Hekîmê nisêbînî digot ku havînan birîn genî dibin, loma jî divê rojê du sê caran kifika nan û simaq û kevzê di birînê bide. Ez bi wê melhemê baştir dibûm lê êdî destê min, ji qewlî melayekî Eleşgirî ve, berî min çûbû cennetê.*

*Piştî çend rojan min nema pêjna hevalê xwe yê Diyarbekrî kir. Min pirsa wî ji hin leşkeran kir gotin: Ew şehîd bûye. Ew ketibû bin simên hespan û gunnên wî teqiyabûn*"[106]

Li vir vebêjer ji me re behsa wî şerî dike ku ew bi xwe wek cengawer tê de beşdar bû, herçiqasî bi zelalî amaje nedaye dîroka wî şerê jî, lê eger em bi hûrbînî lê binerin, emê fêm

---

[106] Jan Dost, *Mîrname*, r. 117-121.

bikin ku mebesta vebêjer ji vî şerî Şerê Çaldêran e, ku di navbera Sefewî û Osmaniyan de qewimî di dîroka 23yê Tebaxa 1514ê zayînî de, bêguman ev jî demeke dîrokî ye ku vebêjer behs dike.

Herwiha vebêjer dibêje: "*Roja şemiyê yekê remezanê bû. Mîr hîn ji xew ranebûbû. Min û xulamê wî me hinekî suhbet kir. Me behsa Xanî û nexweşiya wî ya dirêj û xedar û nediyar kir, min jê re got ku bêguman mîr divê xeberdar bibe, ew dê biçe defna wî hazir bibe. Lê xulamê wî got ku îroj remezan e dê mîr di xew de bimîne. Min dubare gotê ku Xanî çûye rehmetê divê ez xeberê bigihînim cenabê wî.* "[107] Li vir amajeyeke zelal e ku vebêjer bi rêya vê dîrokê ji me re behsa roja mirina Ehmedê Xanî dike. Yanî dawiya Remezana ku Xanî tê de koça dawî dike.

Herwiha Ehmedê Xanî pir bi bedewî amaje daye demeke dîrokî di wê nameya ku ji Mîr re şandiye û tê de roj û meh û sal bi eşkereyî tên dîtin: "*Wesselam.*
*Ehmedê ...Xanî şeva înê 29ê Şe'bana 1119 ê Hicrî.*
*24/11/ 1707ê romî.* "[108]

### 3.1.2. Dema Derûnî (Pîkolojî)

Dibe ku bo vê cureya demê, pêwendiyeke kûr di navbera bûyer û karesateke derûnî ku di romanê de diqewime hebe, ligel dema derûnî ku romannivîs hewl dide wê karesat û bûyera derûnî bi demeke derûnî vebêje. Ev cureya demê nirx û bihayekî wê yê zêde di romanê de heye.

Ji bo bikaranîna vê dema derûnî, romannivîsan dest ji wê dema dîrokî berdan ku di cîhana reel de heye û hewl dan dema derûnî bikar bînin çimkî di wê baweriyê de bûn ku ev cureya demê tevlî hest û hiş û derûna karakteran dibe. "*Lewra ne mumkin e bi awayekî mekanîkî tevger bi wê demê re bê kirin, çimkî li vir alava pîvandinê diguhere û hest û hişê kesekî taybet di helwest û rewşeke taybet de dibe pîvana hejmartina demê.*"[109]

---

[107]Jan Dost, *Mîrname*, r. 181.
[108]Jan Dost, *Mîrname*, r. 229.
[109]Sabir, *Bînaya Hunera Çîroka Kurdî,* r. 282.

Ev cureya dema derûnî têkildarî nivîskarên şepêla hiş e, "*yan ew romanên ku rehendeke wan a derûnî heye, di vê cureya demê de zincîra dema vegotinê di aliyê dîrokî de bi şêweyeke nerêk û nelojîkî têk dişke, teknîkên pêkhêner ên vê cureya demê ji bîrhatin, şepêla azad, monolog, xewn û xeyalan pêk tên*"[110] Ev cureya dema derûnî cureyeke giran e û romannivîs divê xwedî selîqe û behremendiyeke temamî ya romannivîsandinê be, "*çimkî têgihîştina wê ji bo xwîner giran e û gelek divê heta bide pey bûyeran*."[111] Ev cureya hunera dema vegotinê belavtirîn cure ye di nav wan de û bêhtirîn roman li ser asta cîhanê pê hatine nivîsandin, di nav romana kurdî de jî bi heman awayî ya herî berbelav e.

Di romana *Mîrname* de, ev cureya demê pir kêm hatiye bikaranîn, herçiqasî beşekî zêde yê karakteran di nearamî û nerêkiyeke kûr a derûnî de dijîn wek Şengê, Emerê Xeznedar, Mela Ferîd, Buharî…hwd. Lê nayê zanîn romannivîs çima ev cureya demê kêmtir bikar aniye? Herçiqasî ev dem regezeke girîng a pêkhênerê romana nû ye, rexnegir û nivîskar pir bi girîngî behsa wê dikinû romana nû jî ji dema dîrokî bêhtir, bi vê cureya demê tê nivîsandin, li gor îdraq û xwendina me ji romana *Mîrname*re, ji bo zelalkirina dema derûnî ezê van herdu mînakan bînim:

Emerê Xeznedar dibêje: "*<u> wê êvara rû bitenî û dû û xayintîya mîrekên kurmancan</u>. Kitêbên mîr hemû ji refîkan derxistibûn û li pişta qantiran bar kiribûn û biribûn*"[112] Li vir vebêjer ji me re behsa wê demê dike ku Melîk Ehmed bajar dorpêç kiribû, çawa leşkeran koşka Mîr Ebdal Xan talan kiribûn, ev dem êvareke bidûman û tevlî nepakiyê, li vir rewşa derûnî ya vebêjer bi vê demê ve diyar e, xwîner jî bi rêya xwendina vê demê bûyer bêhtir karesatî tê ber çavên wîû herwiha xwîner jî dizane ku êvara tevlî nepakiyê di siruştê de nîne, lê vebêjer ji ber rewşa xwe ya derûnî ev dem bikar aniye.

Herwiha Şengê dibêje: " *Roja ku bavê min ji Makuyê vegeriya û got: Min tu dayî mêr! <u>Rojeke reş bû.</u> Ji hibra ku şopa xwe di sertilî û binê neynûkên min de hiştibû reştir bû*"[113] Li vir Şengê ji ber wê rewşa derûnî yaku hatiye serê wê, ku bavê wê ew bi kotekî û ji boqezencên

---

[110]Se'îd, *Teknîka Vegotinê,* r. 50.
[111]Kesnezanî,*Plot Di Çîroka Kurdî,* r. 182.
[112]Jan Dost*, Mîrname*, r. 31.
[113]Jan Dost*, Mîrname*, r. 43.

diravî daye mêr bi kesekî pîr ê bazirgan re, dema wê rojê bavê wê nûçeya mêrkirina wê jê re tîne, êdî ew roj ji wê re dibe rojeke pir nexweş, bi rêya bikaranîna rojeke reş wiha li xwîner dike bêhtir bixwaze çîroka Şengê bibihîze. Herwiha em dizanin ku di xwezayê de rojên reş nînin, lê rewşa derûnî ya karakter wiha kiriye vê yekê bêje.

### 3.1.3. Dema Efsaneyî (Xurafî)

Ew dema sirûdî ya ahengvanî ye ku baskên xwe li ser romanên efsaneyî vedide. Ev cureya dema vegotinê, pir kêm di romanên kurdî de xuya dibe. Dibe ku sedemê sereke yê ve yekê ew be ku ev dem di realîteyê de tune. Lê romannivîs bi xwe da aliyê efsaneyî bide metinê romana xwe, vê cureya demê bikar tîne. Ev cureya demê bêhtir di wan romanan de tê bikaranîn ku aliyekî wan ê efsaneyî heye. Di romana *Mîrname* de, ti mînakek li ser vê cureya demê nayê dîtin, lê ji bo zelalkirina metinê ji xwîneran re me mînakek aniye ku ji çavkaniyeke erebî hatiye wergirtin, bi vê şêweyê: Di vê mînaka li jêr de jî Mehdî Basinbil bi şêweyeke efsaneyî ya nîv xurafî jiyana xwe ya civakî ji me re vedibêje û dibêje: "*Gava Zeynebê di wî zemanê dêrîn de mêr kir…zevî ji rojê cuda bû û sar bû û …derya û kişwer li serê dirust bûn û ruhber jî li ser rûyê wê derketin…qasî ku tê bîra min di heman wê demê de ku dînasor û xişokên qerase qirr bûn.*"[114]

## 3.2.Dem di Aliyê Rabirdû , Niha û Dahatûyê De

Divê bê zanîn ku di her romanekê de, du cureyên demê tên bergewdekirin:

"*1. Dema hîkayetê romanê: Ew dem e ku bûyerên romanê tê de ji dayik dibin.*

*2. Dema vegotinê: Ew dem e ku bûyerên romanê tê de tên vegotin.*"[115]

Ez dixwazim diyar bikim ku hertim dema hîkayetê dema romanê dide pêşiya dema vegotinê û dema hîkayetê pabendî rêveçûna xwezayî ya demê dibe, ango pabend dibe bi dema rabirdû, niha, siberoj bi şêweya zincîra bi dûhevhatî, lê dema vegotinê ku bi dû dema hîkayetê de tê wek teknîka bikaranîna demê girêdayî demên rabirdû, niha, siberoj ê nabe. Gelek caran

[114]Yusif, Emine, *Teqeniyat es-Serd Fî en-Nezeriye wa et-Tetbîq*, Dar el-Hîwar, Suriye, el-Lazqiye 1997, r. 69.
[115]el-Qezat, Mehemed Ehmed, *et-Teşkîl er-Rîwayî, 'Înde Necîb Mehfuz (Dîrase Fî Tecliyat el-Murus)*, el-Musse el-'Erbiye Lîdrasat û en-Neşir, T. 1, Beyrut 2000, r. 177-181.

dema vegotinê di dema niha ya vegotinê de dest pê dike û li şûna ku ber bi siberojê here vedigere rabirdû yan berevajî. Bi vî rengî yarî bi bikaranîna demê tê kirin. Lewra eger em binerin di romanê de ev cureya yarîkirina bi demê û bezandina demê tê dîtin. Bikaranîna vê cureya teknîka demê jî di vegotinê de, yan bikaranîna demên rabirdû, niha, siberoj bi rêya du teknîkên vegotina demê pêk tê:

### 3.2.1. Vegerandin(Flash Back)

Gérard Genette dibêje: "*Vegotina bûyerekê ye ku dikeve pêşiya wê xala ku vegotin tê de tê cîbicîkirin*."[116] Ango nivîskarê romanê yan her vebêjerekî din di romanê de zemanê dema vegotinê ku niha ye radigre û vedigere zemanê rabirdû, ji bo vegerandina bûyeran serpêhatiyekê ku di dema borî de qewimiye bo dema niha. Em dikarin bêjin romannivîs an vebêjer dema bûyerê ku dema niha ye vedibirre, ji bo vegerandina bûyereke din ku di dema rabirdû de qewimiye. Ev babet şêwazeke hunerî ya nû ye di vegotinê de, "*pêşî di hunera sînemayê de derket û dûre derbasî nav hunera romanê bûye."*[117]*,* "*di sînemayê de ji vê şêwazê re dibêjin Flash Back çimkî bûyerên fîlm vedigerîne paş û dîmeneke din li fîlm zêde dike, ku armanca wê bîranîna bûyerekê ye ku berê qewimiye, ji temaşevanan re*."[118]

Dema hîkayetê di romana Mîrname de di wê spêdeya bibaran de bidawî tê, ku tê de Ehmedê Xanî dibin goristanê û vedişêrin. Ev beşê vegotinê ji hêla vebêjerê hertiştzan tê vegotin. Lewra eger em binerin vebêjer hemû piştî mirina Xanî diaxivin, ango piştî ku Xanî binaxdikin ku ev jî dema niha ye û herwiha dema vegotinê ye. Lewra du fakter dibin sedem ku vebêjer dest bi vegotinê bikin, yekem: dema baran dibare lê termê Xanî ku bi kefenê spî hatibû pêçandin terr nebû, lewra li vir wek vebêjer dibêje: " *Kesên ku li dora gorê xelek gerandibûn, neqebek di nav xwe de vekirin da ku termê Xanî yê bi kefenekî spî û zuwa pêçayî daxînin binê gorê. Hemû li wî kefenî ecêb man û barana pirsê, sêlav û lehî di xaçirêkên xeyalê hemûyan de herikandin.*"[119] Duyem: Herwiha dema Şêx Seyfedînê Cibeşîn xwest telqînê li ser gorna Xanî

---

[116]Cînît, Cîrar, *Xetab el-Hîkaye – Behis Fî el-Menhec*, Ter. Mehemed Mu'tesîm û 'Ebid el-Celîl el-Ezdî û 'Omer el-Helî, el-Meclîs el-E'la Lîlseqafe, Meşru' el-Qewmî Lîlterceme, T. 2, 2000, r. 51.
[117]Ebidalle, 'Edinan Xalîd, *en-Neqd et-Tetbîqî et-Tehlîlî*, Dar eş-Şun es-Seqafiye el-'Ame, T. 1, Bexdad 1986, r. 80.
[118]Se'îd, *Teknîka Vegotinê,* r. 54-55.
[119]Jan Dost,*Mîrname*, r. 18.

bixwîne,ji nişkê ve Teymûrê Fasiq dimdima Şêx Seyfedîn vebirî û bi tundî û tirs qîrand: " *Şêx Seyfeddîn cubbeyê xwe yê şîn hilmişt û heta ber newqa xwe ya qalind û stûr anî û li ber kêla serê Xanî rûnişt da ku dest bi telqînê bike. Baranê jî axaftina xwe ya avî nizim kir, weke ku dixwest guhdarîya gotinên dawî yên ku dê zindî ji kesekî mirî re bibêjin, bike. Çipikên wê hêdî hêdî tarî dibûn, lê bala kesî nekişandin heta ku di nav vingevinga şêx Seyfeddînê Cubbeşîn re dengê Teymûrê meyxur, yê ku bi navê Teymûrê fasiq dihate naskirin, hat. Ew bi hêrs û tirs qêrîya:*

*- Wey bavo ev çi ye !! hibr dibare hibr!!*"[120] Ev du bûyer wiha dike ku vebêjer dest bi vegotina beşên xwe bikin.

Lewma vebêjer dema niha ya vegotinê ango dema piştî mirina Xanî radigrin û bi rêya teknîka vegerandinê vedigerin rabirdû beriya mirina Xanî, û ji me re behsa jiyana xwe bi Ehmedê Xanî re dikinû behsa pêwendiyên civakî, olî û siyasî yên Ehmedê Xanî dikin, û pir caran vebêjer wan hemû bûyer û serpêhatiyan jî têkilîhev dikin bi çend serpêhatî û çîrokeke jiyana xwe ya taybet, di dawî de vebêjer têne ser dema niha. Em cureyek ji bezandinê di navbera dema rabirdû û dema niha ya vegotinê de dibînin. Bi awayekî giştî sê cureyên me yên vegerandinê hene:

### 3.2.1.1. Vegerandina Derveyî

"*Vedigere beriya destpêkirina bûyerên romanê.*"[121]Yanî romannivîs wê dema ku romana xwe tê de vedibêje, dema niha radigre û vedigere beriya destpêkirina rûdana romanê ku dema rabirdû ye, yanî xeyala vebêjer vedigere zemanekî dûr beriya dema nihaya vegotinê, ew bûyerên ku vebêjer wan vedibêje jî dikevin derveyî bûyerên romanê. Ango di romana Mîrname de, eger hat û her vebêjerekî behsa her tiştekî kir kete beriya jidayikbûna Şêx Ehmedê Xanî de, ji vê re tê gotin vegerandina derveyî. Di vegerandina derveyî de, hertim zanyariyên zêdetir derbarê kesayetî û bûyerên rabirdû derdikevin holê. Em ji bo vê cureyê, mînaka vebêjerê Dengbêj Dostoyê Urmeweyî tînin, ku çawa dema niha ya vegotinê radigre û vedigere bo rabirdûyek dûr ê berî nihaya vegotinê, tew berî jidayikbûna Xanî jî dema dibêje: " *Ez û bavê xwe û diya mina celalî Menîje û pîrka min, havîna ku tê de li Stenbolê sultan*

[120]Jan Dost, *Mîrname*, r. 20.
[121]Se'îd, *Teknîka Vegotinê,* r. 55.

*Ibrahîmxan bi destê Qere Elî hatibû xeniqandin, hatin li Bazîdê bi cih bûn. Ez wê çaxê du sê salî bûm û hîn rehmetiyê Xanî ji diya xwe re nebûbû. Bavê min Mîrxan, ku bi xwe jî dengbêjekî dengzengil bû, serpêhatiyên berê, beytên şeran û evîndariyê li odeyên axayên Celalîyên ku xalanê min bûn, digotin. Tê bîra min ez hîn neh deh salî bûm, buhar û havînan hema ku roj diçû ava bavê min cihê xwe li odeyê xweş dikir û destê xwe dida ber guhê xwe û beyta Dimdimê digot. Erd û ezman dihejandin. Civat bêdeng bû weke ku li nêçîra kewan bin, eger yekî perîka qitikekê bihavêta erdê wê deng bihata.* "[122] Li vir vebêjer behsa hatina wan bo Bayezîdê dike, ku temenê wî sê sal bû û hîn jî Xanî ji dayik nebûye, ango vegeriyaye beriya jidayikbûna Xanî, ji vê re vegerandina derveyî tê gotin.

### 3.2.1.2. Vegerandina Navxweyî

"*Vedigere bo rabirdûyeke girêdayî destpêka romanê lêbelê behskirina wê di metinê de bipaş ketiye.*"[123] Mebest ji vê cureya vegerandinê, vebêjer ji nihaya vegotinê radiweste û vedigere bo rabirdûyeke nêzîk beriya gihîştina bi dema rûdana bûyerên nihaya vegotinê "*ku di metinê de qewimîne, lê romannivîs behsa wan nekiriye û hewl dide wan di dema niha de vebêje.*"[124]

Ango her vebêjerek di Mîrname de ji me re behsa tiştekî bike ku bikeve piştî jidayikbûna Ehmedê Xanî de, ev vegerandina navxweyî ye. Emê mînaka vebêjeriya Mela Salihê Cizîrî bînin ku vedigere bo rabirdûyeke nêzîk û girêdayî bûyerên romanê, tew li vir vebêjer ew dem jî diyar kiriye ku lê vegeriyaye, ew jî bi nêzîkiya mehekê beriya dema niha ango mehekê beriya mirina Ehmedê Xanî: "*Vê dawiyê, berî wefata wî bi nêzîka mehekê min bihîst ku Xanî dê nameyekê ji mîr re binivîse. Ez çûme ba wî û min gotê :*
*- qurban çi hewce bi nameyan e!! here ba wî, welleh ew qedrê te dizane. Vê pira di navbera xwe û wî de ku herifîye dîsa ava bike.*
*Wî guh li min nekir. Hêrs bû û got:*

[122] Jan Dost*, Mîrname*, r. 90.
[123] Se'îd,*Teknîka Vegotinê,* r. 55.
[124] Xidr, *Teknîka Vegotinê*, r. 232.

- *ez pira di navbera xwe û xwedayê xwe de ava dikim*"[125] Li vir Mela Salih ji me re vedigere zemanekî kêm ê berî dema niha yanî mehekê beriya mirina wî, ango Xanî mehekê beriya mirina xwe xwestiye nameyê ji Mîr re binivîse.

### 3.2.1.3.Vegerandina Têkil

"*Vebêjer vedigere wan bûyerên ku beriya destpêkirina çîrokê qewimîne, bi vegerandina xwe re wan bûyeran pêşkêş dike ku, girêdayî destpêka çîrokê bûn. Ji vê re tê gotin vegerandina têkil*."[126] Ev cure têkilbûnek e di navbera herdu cureyên din de, ku pêwistî bi selîqe û jêhatîbûneke zêde ya xwîner heye bo cudakirina vê cureya vegerandinê, ango di vê cureyê de vegerandina dema rabirdû ye û têkil dike bi dema niha re û di zemanê niha de vê cure têkeliyê vedibêje, em dikarin bêjin ku xala werçerxanê û destpêkirina dema dahatû ye. Piraniya caran bi hevalkarê niha ji bûyerên dema borî tê cudakirin, bi karê rabirdû berî niha vegerandinê nîşanî me dide. Li gor xwendina me ji romanê re, me hest bi vê cureya vegerandinê nekir.

### 3.2.2. Pêşxistin, Pêşbînî(prediction)

Herwekî çawa di proseya dema vegotinê devegerandin hebû, berevajî wê pêşxistinjî jê heye, ku arasteya vê cureyê berevajî arasteya yekem e. Di proseya vegerandinê de, vedigeriya zemanê borî yanî ew hemû tiştên ku qewimîne, lê di proseya pêşxistinê de, em bi pêşzemanekî dikevin ku tişt tê de neqewimîne, "*proseyeke vegotinê ye ku mebest jê destnîşankirina bûyerekê ye ku dê biqewime yan amajepêkirineke pêşwext e*."[127]

"*Pêşxistin herwekî Gérard Genette dibêje: Pêşketin tevgereke vegotinê ye, bûyereke dûre vedibêje, çawa vegerandin hebû, herwiha proseya me ya pêşketinê jî heye. Eger proseya me ya pêşketin û vegerandinê nebe, hingê dê gelek karakter û bûyer di romanê de bi temamî nayên naskirin*."[128]

---

[125]Jan Dost,*Mîrname*, r. 155.
[126]Yeqtîn, se'îd, *'En Tehlîl el-Xîtabe er-Rîwaye (ez-Zemen – es-Serd – at-Tetbîr)*, el-Merkez es-Seqafî el-'Erabî, T. 4, Beyrut- Lubinan 2005, r. 77-78.
[127] Mensûr, Ehlam*, Bînaya Hunerî Di Kurteçîroka Kurdî de (1970-1980)*, Çapxaneya Tîşk, Silêmanî 1999, r, 76.
[128] Xeyat, Arî 'Osman, *Bînaya Bûyerê Di Romana (Paşa Kuştin) a (Xesrew Caf) û (Pêş ku Waşeke Helfirrêt) a ('Ebdilxaliq Rikabî) de*, Lêkolîneke Rexneya Berawerdkarî ye, Çapxaneya Narîn, Ç. 1, 2011, r. 47-48.

Eger em binerin, pir caran romannivîs wek teknîk bi rêya sembolekê yan bi çend peyv û hevokan hurdekariya zemanekî di dahatû de yan bûyerekê di dahatû de ji me re kifş dike. Ev jî dibe ku hokarek be da ku meraqa xwendina romanê li ba xwîner dirust bike, yanî wiha li xwîner bikebendewariya zemanê dahatû jî bike.Vê çaverêkirinê wiha li rexnegiran û nexasim Fînrix kiriye ku bêje: Pêşxistin "*şêweyekji şêweyên çaverêkirinê ye.*"[129]

Lewma pir caran eger em binerin di proseya pêşxistinê de romannivîs an vebêjer beriya rûdan an qewimîna bûyerekê amajeyekê dide me derbarê rûdan an qewimîna şerekî yan nexweşketina karakterekî yan mirina kesayetiyekê yan her bûyereke din a girîng, lê divê em wê bizanin ku bi piranî ew bûyerbi rêya îşaret an amajeyekê tê pêşxistin, ku ne bûyerên nesereke ne, lê girîng û karîger in di romanê de çimkî bikaranîna vê teknîkê bi temamî di xizmeta xwîner de ye da meraqê li ba xwîner dirust bike.

Herçiqasî Celal Enwer Seîd di masternameya xwe de amaje dide vê yekê û dibêje: "*Pir caran pêşketina bûyerê regeza teşwîqê ku movika pişta edebiyatê ye li ba xwîner dikuje.*"[130]Berevajî wê jî rast e, pêşxistin dibe sedem ku regeza teşwîqê li ba xwîner zêde bike bo wan bûyerên ku egera rûdan an qewimîna wan di zemanê dahatû de heye. Lê divê em bizanibin ku di metinê romanê de romannivîs an vebêjer ya ku bipêş dixe ne şert e ku ew bûyer rû bidin an biqewimin, lewra dibe ku hinek ji wan bûyeran rû nedin. "*Li gor hinek rexnegir û nivîskaran, teknîka pêşxistinê amajekirin e bo wan bûyerên ku pêkan e yan dibe ku di siberojê de rû bidin û biqewimin. Lê li gor hin kesên din, ew bûyera ku behsa wê tê kirin divê di siberojê de rû bide û biqewime.*"[131]

Herwiha her derbarê vê yekê Perêz Sabir dibêje: "*Ne merc e her carê pêk were, lê carna diguhere, li gor guherîna rêveçûna bûyeran û helwesta kesayetiyên çîrokê, ku di encama kartêkirina çend binemayekî taybet bi çîrokê çi di navxwe yan li derveyî çîrokê de rû didin û bandora xwe ya taybet li ser arastekirina bûyeran û diyarkirina çarenivîsa kesayetiyan*

---

[129]el-Ksasbe, Ebidalle Mslîm, *Tecrebe Silêman el-Qewabî'e er-Rîwaye*, Dar el-Yazurî el-'Îlmiye, Lîneşr we et-Tewzî', et-Tabi'e : el-'Erbiye, 'Oman – el-Erden 2006, r. 129.
[130]Se'îd,*Teknîka Vegotinê,*r. 60.
[131]Xidr, *Teknîka Vegotinê*, r. 253-254.

*dikin, lewra pir normal e ev rewş herwekî çawa ji ber pêkhatina encama çaverêkirî bê sazkirin, herwiha tiştekî normal e ji ber pêknehatina wê encama çaverêkirî bê sazkirin*."[132]

Pêşxistin di romana Mîrname de, ji devê vebêjeran bi çend şêweyan û li çend cihan hatiye bikaranîn. Pir caran vebêjer bi rêya derbirîneke kurt amaje didin bûyerekê ku dibe ku di dahatû de rû bide yan dibe ku rû nede.

#### 3.2.2.1. Pêşxistina Wan Buyerên Ku di Dahatû de ru Didin

Wek mînak di beşê vebêjer Xalidê Çolaq de, vebêjer ji devê bavê xwe behsa lehengî û çalakiya serdema zaroktiya xwe ji me re dike, dûre ew bi xwe behsa mêrxasiya xwe dike dema temenê wî 20 salî bû, lê bi rêya amajeyekê ku ew jî amajeya jinên falgir e pêşbîniya bûyerekê dikin ku di dahatûyê de ev kur wê hêza xwe ya niha ji dest bide: " *Pîldar û tasnêrên ku di zarotiya min de li qedera min nihêrîbûn, xêzên di enîya min de xwendibûn û gotibûn ev lawik dê di xortanîya xwe de ji qewet bikeve û tiştekî xwe winda bike. Sal buhurîn û ez bûme xortekî hijde nozde salî, me fala tasnêr û pîldaran ji bîr kiribû.*"[133] Bi vî rengî pêşbînî rû dide û di dawî de (Xalidê Çolaq) di şerekî de li Îrewanê milekî xwe bi şûr ji dest dide.

Herwiha dema Mîrza Sebrî û mirovê rûgirtî plana kuştina Xanî datînin, diçin hucreya Xanî û li wir planê cîbicî dikin, Mîrza Sebrî bi guman e ku Xanî bi vê planê bimire, êdî mirovê rûgirtî pêşbîniya mirinê ji Xanî re datîne ku di dema xwe de dimire: " *Pişt re mirovê rûgirtî hinekî bi ser min de xwar bû, devê xwe xiste guhê min û bêyî ku mele Ferîdê rû ji tirsan zer bûyî bibihîze got:*

*- Hefteyeke din, yan heta deh panzde rojê din, pirr bi derengiyê bikeve heyveke din şolê Xanîyê we yê serkeş temam dibe. Inşaellah dê fatiheya wî were xwendin bêyî ku ew jî zanibe çi bûye. Ku mewta wî ne bi zeytê be dê bi hibrê be. Ew nagihêje ku hîva remezanê bibîne.* "[134] Bi vî rengî jî bûyer di dahatûyê de rû dide ango diqewime.

---

[132]Sabir, *Bînaya Hunera Çîroka Kurdî ,* r. 312.
[133]Jan Dost*, Mîrname* , r. 114.
[134]Jan Dost*, Mîrname*, r. 88.

#### 3.2.2.2.Pêşxistina Wan Bûyerên Ku di Dahatû de rû Nedin

Li vir vebêjer bûyerekê bipêş dixe, lê ne merc e ew bûyera ku bipêş dixe rû bide, wek mînak di beşê vebêjer Recebê Terzî de, ev vebêjer pêşbînî dike ku çû Stenbolê bi rêya pîşeya xwe pereyekî zêde peyda bike û vegere û li berpala çiyayê Agirî koşkekê ava bike, ev ne tenê rû nade, lê berevajî wê jî dibe: "*ez dê li vir bibim terziyekî meşhûr. Ku nebim terziyê sultan û giregiran , dê li taxekê bi cih bibim û cilên efendiyan bidirûm. Wê malê min pirr bibe û ez dê li Bazîdê vegerim û serayekê li koka çiyayê Gilîdaxê ava bikim, dê bizewicim û bibim xwedî milk û erd. Û xewnên ji van mezintir jî min didîtin û dilê xwe bi wan xweş dikir*"[135]

### 3.3.Dem di Aliya Lezgînî û Sistîyê de

Yek ji teknîkên din ên dema vegotinê ji lezgînî an xurtî û sistiya dema vegotinê pêk tê ku pir caran romannivîs an vebêjer wê di nava romanê de bikar tîne. Ev cureya teknîkê jî di nava romanê de girêdayî cudahiya navbera dema romanê û dema tekstê ye, yan cudahiya navbera dema romanê û dema vegotinê ye.

#### 3.3.1. Xurtî Yan Lezgînya Dema Vegotinê

#### 3.3.1.1.Kurtkirin(Reducing)

Yek e ji wan teknîkên ku tê de proseya vegotina romanê lezgîn dike. Ango pêk tê ji "*romannivîs bi qest çend hurdekariyên bûyerê bi dûrûdirêjî ango bi berfirehî pêşkêş nake, lê bi çend xêz û hevokan me bi xwezaya bûyerê dide serwextkirin*."[136]

Li vir diyar dibe ku romannivîs bi qest be yan bi mebest yan ji bo aliyê bedewkariya romanê be, bûyerên romanê bi rêya çend peyv û amaje û hevokan ji me re kurt dike da proseya vegotinê lezgîntir bike, herwiha xwe ji wê dema siruştî ku heye derbas bikewek saet, roj, meh, sal…hwd, lê dixwaze bi rêya kurtkirinê şêwazeke din bide xurtiya vegotina romanê. Ev cureya teknîkê "ku *Fielding wek yekem kifşkerê wê tê hejmartin, pêk tê ji kurtkirin an himbizkirina bûyerên çend rojan an çend meh û salan, di paragrafekê yan çend rûpelan de, bêyî ku nivîskar berdewamiyê bide hûr û girsê bûyeran, heta dawiyên sedsala 19an jî li gor Genette kurtkirin*

---

[135] Jan Dost, *Mîrname*, r. 99.
[136] Germiyanî, *Dersên Xwendina Bilind,* r. 35.

*wek hokareke guhastinê di navbera dîmenên romanê de dihate bikaranîn*."[137] Lewra pir caran romannivîs demeke zêde ya jiyana karakteran di çend xêzên kurt de derdibire û berdewamiyê pê nade, lê divê romannivîs ji wê yekê miqate be ku hemû bûyer an jiyana hemû karakterên di romanê de nayê kurtkirin ango li cihekî ev kurtkirin pêkan e ku ziyanê negihîne rêveçûn û bînaya hunera romanê, çimkî eger kurtkirin bû ziyangihandin li ser bînaya hunera romanê, hingê ev roman wek serkeftî nayê hejmartin, lewra kurtkirin "*dubarebûnê di metinê de nahêle û wiha li bûyerên metinê dike ku bi rengekî nexwezayî lezê bike da bigihe bûyerên dahatûyê*."[138] Bi awayekî giştî kurtkirin di nava romanê de yan di nava metinê çîrokê de, bi çend rolan radibe ku pêk tên ji:

"*1. Buhurîneke lezgîn bi ser demeke dirêj de.*

*2. Pêşkêşkirineke giştî ya dîmenan û bi hev ve girêdana wan.*

*3. Pêşkêşkirineke giştî ya karakterekî nû.*

*4. Nimayîşkirina karakterên nesereke ku mecala metinê nebû wan bi dûr û dirêjî çareser bike.*

*5. Amajekirina lezgîn bo derzên demê.*

*6. Pêşxistina vegeriyanê*."[139]

Romannivîs di Mîrname de, di çend cihan de bi mebesta lezgîniya vegotinê ev teknîk bikar aniye, emê jî çend mînakan bînin.Vebêjer dibêje: " *Bavê min hîn di wê hêrsa xwe de û serê diya min di dest de, min bazda . Ez reviyam û reviyam û reviyam heta ku li min bû êvar û roj ji pişt çiyan de weke serekî jêkirî xuyabû*."[140] Li vir vebêjer pir bi ciwanî bûyera reva xwe ji me re kurt kiriye, dema ji malê direve, tenê bi sê peyvan reviyam û reviyam û reviyam heta êvar bi ser min de hat, yanî ew hemû dema ku reviyaye heta êvarê kurt kiriye û tenê di van sê peyvan de dariştiye.

Herwiha vebêjerekî din dibêje: " *Dema wî destana Mem û Zînê dinivîsî ez ne li Bazîdê bûm. Axayekî celalîyan li Diyadînê ez dawetî ba xwe kiribûm û ji bo çend salan li wir mêvan bûm. Di dîwana wî de bûbûm dengbêjê ewwil ku bêyî min çiraxên civata xwe geş nedikirin.*"[141]

---

[137] Se‘îd, *Teknîka Vegotinê,* r. 64.
[138] Se‘îd, *Teknîka Vegotinê,*r. 65.
[139] Qasm, Sîza, *Bîna' er-Rîwaye (Dîrase Miqarene Fî Selasiye Necîb Mehfuz)*, Dar et-Tenwîr Lîtabî‘e we en-Neşir, T. 1, Beyrut – Lubinan 1985, r.78.
[140] Jan Dost,*Mîrname*, r.193.
[141] Jan Dost,*Mîrname*, r. 37.

Li vir vebêjer bi rêya kurtkirinê wan çend salan ji me re kurt dike ku li bajarokê (Diyadîn) li ba axayekî vexwendî bû.

Vebêjerekî din ji vebêjeran dibêje: "*Hasil me bi fermana Mîrê muhteşem ew mîna marekî bi zorê ji qulê derxist û bir. Lê wî jî tu ilm raberî Xanî nekir. Ji xwe devê wî , te digot qey Recebê terzî ew bi tayekî stûr dirûtiye yan jî Selîmê nalbend nalek pê ve kuttaye ketibû hev û nizanibû çi bibêje. Gotinek ji xerb yek jî ji şerq dianî û weke serxweş û meyxuran lê hatibû wê şevê.*"[142] Li vir vebêjer pir bi lezgînî bi rêya amajeya Hasil ê ji me re behsa çûna wan ya bal Ehmedê Xanî û civîna wan dike. Ew hemû dema ku di rê de bûn û li ba wî rûniştin, tenê di wan peyvên li jor de kurt dike.

### 3.3.1.2.Rakirin, Nehêlan(cutting)

Pir caran romannivîs vêca ji ber her hokarekî be rakirin an nehêlanê bikar tîne bo lezandina dema vegotinê, yanî zemanekî ji nav metinê romanê dide alî yanî radike "*ji ber ku li ser asta tekstê wek qebareyekê ti rûberekî dagîr nake.*"[143] "*Diyar e dema vegotinê bi rakirina beşekî hîkayetê ji pileya sifrê pir nêzîk dibe, lê tucarî nagihe sifrê.*"[144]

(Dr. Morîs Ebû Nazir) derbarê vê teknîkê dibêje: "*Şêweyek ji şêweyên vegotina çîrokê ye, ji çend nîşaneyeke diyarkirî yan nediyarkirî ya maweyên dema bûyeran pêk tê, ji ber bi pêşveçûn û geşbûna wan berbi yan vegera wan bo rabirdû.*"[145]Ji vê boçûna Dr. Morîs ew yek zelal dibe ku di nav teksta romanê de, du cureyên rakirin an nehêlanê hene ku pêk tên ji:

#### 3.3.1.2.1. Rakirina Diyarîkirî (Eşkere)

Di vê cureyê de, *"nivîskar bi rêya çend derbirînênkurt îşaretê bi wan dike, mîna piştî derbasbûna salekê û şeş meh derbas bûn…hwd."*[146]

*" piştî deh mehan ku li taxekê ji mehella Qasim paşa li ba terziyekî navdar bûme destek û pere bi ser min de barîyan, keçikeke Boşnaqî nas kir. "*[147] Li vir vebêjer bi bikaranîna hevoka

[142]Jan Dost,*Mîrname*, r. 87.
[143]Sabir, *Bînaya Hunera Çîroka Kurdî,* r. 305.
[144]Se'îd, *Teknîka Vegotinê,* r. 69-70.
[145]Ebu Nazir, Mirîs, *el-Elesnîye we en-Neqid el-Edebî Fî en-Nezeriye we el-Mumarese*, Dar en-Nehar Lîlneşir, Beyrut 1979, r. 101.
[146]Sabir, *Bînaya Hunera Çîroka Kurdî,* r. 306.

piştî deh mehan ew dem rakiriye ku li ba cildirûyekî terziyekî navdar kar kiriye. Bi vê rêyê dixwaze bilez here ser pêwendiya xwe û Êmayî Boşnaqî û dema wê jî diyar kiriye ku piştî deh mehan e.

Herwiha vebêjerekî din dibêje: *" Di pê du rojan re rehmetiyê Xanî jî hate ba min. berî nexweşiya wî bi rojekê du rojan bû. "*[148] Li vir vebêjer ew dem diyar kiriye ku daye aliyekî û nehêlaye, ew jî piştî du rojan.

Vebêjerekî din dibêje: *" Piştî qederê seetekê ez bi xwe hisiyam ku ew mêr destê xwe li bedena min pêçî bi pêçî dipelîne, min xwe kerr kir. "*[149] Li vir dem hatiye diyarkirin ku saeteke.

**3.3.1.2.2. Rakirin An Nehêlana Diyarnekirî (Veşartî)**

Di vê cureyê de *"xwîner dikare ji tekstê îstîxrac bike yanî derxîne."*[150] Wek mînak: Vebêjer dibêje: *" Piştî çend rojan min nema pêjna hevalê xwe yê Diyarbekrî kir. Min pirsa wî ji hin leşkeran kir gotin: Ew şehîd bûye. Ew ketibû bin simên hespan û gunnên wî teqiyabûn."*[151] Li vir vebêjer ew dema ku kurt kiriye diyar nekiriye, nayê zanîn bê çend roj e.

Vebêjerekî din ji vebêjeran dibêje: *" Piştî çend salan min nas kir ku mezinên êlan em weke pez difirotin serdarên ordîyê. Serê her yekî ji me bi çarsed pêncsed aqçeyî bû. Me nizanîbû ku em koleyên serêlên xwe ne. Me nizanîbû ku em mîna pirtalan li bazar û sûkan têne firotin. "*[152]Bi heman awayî vebêjer dema wê diyarî nekiriye, nayê zanîn saleke, du sal in, sê sal in an çend e?

Vebêjerekî din dibêje: *" Ku sal derbas bûn û rehmetî Mem û Zîna xwe nivîsî min fam kir ku çiqasî bi me hatiye kenandin û em bûne amacên tîrê qezayê ku bi destên Tirk û Tacîkan ,*

---

[147]Jan Dost, *Mîrname*, r.100.
[148]Jan Dost,*Mîrname*, r. 166.
[149]Jan Dost, *Mîrname*, r. 195.
[150]Sabir, *Bînaya Hunera Çîroka Kurdî,* r. 306.
[151]Jan Dost, *Mîrname*, r. 121.
[152]Jan Dost,*Mîrname*, r. 115.

*Rom û Eceman di sîng û dilên me de diçikiyan."*[153] Li vir jî dema wê nehatiye diyarkirin. Tenê dibêje sal derbas bûn.

*"Ev jî wê yekê nîşan dide ku cureya yekemîn a kurtkirinê tibaba demê diyar e û nivîskar rasterast û bi eşkereyî wê destnîşan dike, lê belê cureya wê ya duyemîn tibaba dema wê ne diyar e, kurt, dirêj, zêde, kêm, lê bi giştî îşaretê pê dide bêyî ku çarçoveya wê diyar bike û wê destnîşan bike."*[154]

### 3.3.2. Sistiya Dema Vegotinê

#### 3.3.2.1. Dîmen

"*Yek ji teknîkên sistiya vegotinê ye, wê demê dirust dibe ku dema çîrokê û dema vegotinê yeksan ango wekhev bin."*[155]"*Wek curekê ji cureyên hunera vegotina hîkayetê tê hejmartin ku, ew û kurtkirin dijî hev in. Di dîmenê de bûyer bi hemû hurdekarî û mewdaya xwe bi dû hev rêz dibin û bûyerên di nav wê dîmenê de sereke ne û derxistina wan sîfeteke wan a damezrêner di rêveçûna hîkayetê de heye.*"[156]

Wek çawa di kurtkirinê de me behs kir pir caran ew bûyer tên kurtkirin ku nesereke ne û bandoreke berçav li ser rêveçûna vegotina bûyeran dirust nakin, lê di dîmenê de rewş bi temamî berevajî ye, ji bilî ku dirêjî bi behskirina bûyeran tê dayîn di çend rûpelan an çend beşan de, û bûyer sereke ne û bandoreke wan a mezin li ser rêveçûna vegotinê heye. "*Ev huner bi roleke girîng di dirêjkirina zemanê vegotinê û bipaşxistina dawiya bûyeran de radibe. Ev jî dibe sedem ku xurtiya zexta vegotinê aram bibe û bilez derbas nebe. Di vê rewşê de jî, bandora metinê li ser rewşa derûnî ango psîkolojîk a xwîner zêdetir dibe û bi temamî bala xwîner bo nav bûyeran tê kişandin û bêhtir meraqa wî lê dibe ku di zûtirîn demê de bizanibe encama dawî ya bûyeran çawa dibe.*"[157]

---

[153]Jan Dost,*Mîrname,* r. 123.
[154]Sabir, *Bînaya Hunera Çîroka Kurdî,* r. 306.
[155]el-Merizuqî, Semîr û Şakir, Cemîl, *Medxel Îla Nezriye el-Qîset Tehlîl we Tetbîq*, Dar eş-Şun es-Seqafiye el-'Ame , Bexdad 1986, r. 89.
[156] Elwenî,*Lêkolînên Rexneyî û Şîrovekarî*, r. 39.
[157]Elwenî,*Lêkolînên Rexneyî û Şîrovekarî*, r. 39.

Dema em romanê dixwînin, hertim bûyerên girîng û bibandor di hiş û zihnê xwîner de dimînin. Mabûna van bûyeran li ba xwîner beşekî ji wan têkildarî dîmenê ne çimkî pir bi girîngî û bi dûr û dirêjî behsa wan hatiye kirin, em dikarin bêjin ev cure bûyerên ku ji hêla dîmenan tên weşandin û tên behskirin û tên vegotin di romanê de li gor bûyerên din hatine vebirrîn û bêhtir girîngî bi wan hatiye dan. Herwiha divê romannivîs di dîmenê de pir girîngî bide wêneya hunerî û wek wênegirekî serkeftî be di wênekirina dîmenan de ûtiştan bi hûrî û girsî bigre. Di dîmenê de, wênekirin û nimayîşkirina bûyeran bi rêya du cure dîmenan dibe, ew jî ev in:

#### 3.3.2.1.1. Dîmena Wêneyî

Ku tê de nerîngeha vebêjer an karakterekî ji karakteran reng dide û pişta xwe bi wesfeke dûr û dirêj a bûyeran girêdide.

#### 3.3.2.1.2. Dîmena Panoramayî (Dramî)

"*Tê de qehreman bi rêya gotin û kirdarên xwe tên nîşandan bêyî ku vebêjer ti gotinekê li ser wan bike.*"[158] Di cureya yekem de, vebêjer ji bilî nîşandana dîmenan, ew bi xwe jî vebêjer di dirustbûna dîmenan de beşdar e, lê di cureya duyem de vebêjer bi piranî bi erkê guhastina dîmenên guftûgoyên di navbera karakteran de radibe.

Mînak li ser cureya yekem: Vebêjer dibêje: " *Piştî qederê seetekê ez bi xwe hisiyam ku ew mêr destê xwe li bedena min pêçî bi pêçî dipelîne, min xwe ker kir. Êdî hêdî hêdî destê xwe di ser qûna min a girover re bir û anî. Dema dît ku deng ji min nayê, dest bi doxîna min kir û bi lez girêk vekir. Destê min ji pişt ve bêhemdî min li terrikê wî ketin. Weke singekî konê koçeran rep û germ bûbû. Agirê bijandina ganekê di bedena min de jî geriya. Ku min dît ew dixwaze hîn pê de biçe û şerwelê min deyne, min karê wî hêsan kir û şerwel ji xwe şemitand. Her tişt di tarî û bêdengîyê de bû. Ji xwe ku mirov nîvxewî be jî lezzeta ganê duqatî dibe, ê min jî çavên min girtî man û mêrikê ku min hîn baş rûyê wî nedîtibû ez ber bi xwe ve kişandim û bi şarezayîya kurbazekî singê xwe kuta..*
*Şevên bi wî rengî bêjimar bi min re derbas bûbûn. Lê min hîn mêrekî wisa tîgan nedîtibû. Hema ku karê xwe qedand, qulipî ser piştê û bû xurexura wî û kete xeweke giran. Çavên min*

158 Lubuk, Bîrsî‹*Sin'et er-Rîwaye*, Ter : D.'Ebidllstar Cewad, Dar Mecdelawî Lîneşir, T. 2, 'Oman 2000, r.73.

*di şibakeyeke rojhilat re li hîva çarde ketin. Ji biçûkiya xwe de ez ji hîva li çarde ditirsiyam û min newêrîbû dirêj lê seh bikira. Diya min digot ku eger yek pirr li hîvê yan li neynikê temaşe bike dîn dibe.*
*Min şerwelê xwe kişande xwe, doxîna xwe girêda û rabûm ku di pencereyê re li derve binêrim. Çavên min bi sukumê wî mirovî ketin. Ku min baş bala xwe dayê, heta xwedê deng dabû min ez qêriyam.* "[159]Li vir, di vê dîmena dirêj de vebêjer dîmena wê bûyerê ji me re vedibêje ku çi bi serê wî hatiye, çawa bi bavê xwe re karê xirab kiriye, di vê dîmenê de bi temamî nerîngeha vebêjer reng daye dema xwîner vî beşî dixwîne wek ku ev bûyer li ber çavên wî bê kirin.

Herwiha Şengê piştî ku bavê wê wê dide mêr bi Xoce Alaqolî re, dîmena karê nav nivînan ji me re vedibêje ku yekem şev bi vî kalemêrî re kiriye. Şengê bi xwe jî di dirustbûna vê dîmenê de beşdar e ku pişta xwe bi wesfeke dûr û dirêj girêdaye, gava dibêje: "*Dema ew hat û got: Jinê derpiyê xwe deyne, min xurt bi doxîna xwe girtibû û xwe li ser nivîna ku ji min re amade bûbû weke marekî kokel kiribû. Wî ew yeka min weke şerma bûkan hesibandibû û nizanîbû ku ez ji wî nefret dikim û mirina xwe ji nêzîkbûna wî ya ji laşê xwe re, çêtir dibînim û naxwazim qitika qîzanîya xwe li ser berfa şerşefa wî ya spî bigurêm.*
*Ber bi min ve hat û diarnên wî yên zer di bin simêlên wî yên spî û rûnkirî de qîç bûbûn mîna qîlên gurekî xuya kirin. Bîna wî berî wî dihat. Min her xwe bi şûn ve dida û ew jî bi pêş de dihat. Her ku nêzîkî min dibû bîna debaxxane û eyaran û qaşilê hinaran û simaqê û gecê û pezên gurandî bêtir difûrîya û kef bi devê wî diket. Carekê min dît ku li ser serê min rawestiyaye û derpiyê min ji min dikişîne. Benda min a Heyderî ji serê min ketibû û netrik û zergoyên pêve dirûtî ketibûn bin stûyê min. Wî bi hovîtî ez dişelandim. Qêrîn û hawara min dê wê şeva guh bi berfê hatibûn siwaxkirin bigihişta kîjan guhî? Her yek çûbû mala xwe û guhên bavê min jî bi eyarên Xoce Ellahqulîyê nebxêr hatibûn şimakirin û ji çingeçinga floriyan pê ve tu dengê dî nedibihîstin.*
*Min, ne kire qêrîn û ne jî girîyam, min weke ku çawa ji bûkekê dihate xwestin kir û devê xwe dirût.. Min xwe û giyanê xwe û bedena xwe û jîyê xwe di wê şeva sar de teslîmî wî û bîna eyaran kir.*

---
[159]Jan Dost,*Mîrname*, r. 195-196.

*Wî bi devê xwe yê kefgirtî pif kire şemala li ber serê min û lingên min ji hev vekirin û ber bi jor de hildan, li ser milên xwe danîn û derbasî min bû. ez ji qîzanî xistim. Devê min tijî tama axeke şil û çermekî nedabaxkirî bû û ez hatim ku verîşim.*
*Uftekufta wî bû û girêza devê wî bi ser rûyê min de diniqutî. Wê kişmekişê dirêj nekir û min dît orînîyek pê ket û bi lez ji ser zikê min rabû û berê xwe da devê derî. Desmalka spî ya ku li bin min danî bû û xwîna keçînîya min ya firotî bi ser de niqutîbû, da destê birazavayê xwe yê li ber derî û li pey wî derket û nema wê şevê vegerîya hicleya min ya ku bûbû cihokek genî ji girêz û xwîn û avika nêranîya wî keftarê şêstsalî. Cihokek ku barîna hêsrên min û ava heft kanîyan jî nedişî wê gemarê bide alî*"[160]

Mînak li ser cureya duyem:Li deverekê vebêjer dîmena guftûgoya navbera Selahedînê Sehaf û Mela Smayîl bi mirovê rûgirtî re ji me re vediguhêze ku xwe dişemitîne nav guftûgoyê, gava cenazeyê Xanî hildigirin, vebêjer hewl daye Mela Smayîl û Selahedînê Sehaf û mirovê rûgirtî bi rêya peyv û kirdarên xwe bên berçavkirin, bi vî rengî: " *Mele Ismaîlê Bazîdî yê li hêla rastê di pêşîyê de ji hoste Selaheddînê sehhaf re yê ku destikê çardarê yê çepê li ser milê wî bû re got:*
*- tu jî bala xwe nadê!!*
*Hoste Selaheddîn peşkên baranê yên ku tev li firmêskên wî bûbûn ji ser rûyê xwe yê zirav û henûn maliştin û pirsî:*
*- Bala xwe bidim çi heyran?*
*Mele Ismaîl dengê xwe hinekî nizim kir û got:*
*- Min termên weha sivik hîn nedîtine.*
*Mirovê rûnuxamtî yê ku ayeta kullû men e`leyha fan bi dengekî xinanî û bilind dixwend, devê xwe nêzîkî guhê mele Ismaîl kir û bi dengekî ji yê wî nizimtir got:*
*- ev şêxekî nûranîye, loma jî termê wî sivik e. Giranîyan terman girêdayî gemara rûhê mirovan e, ev şêx zatekî tahir bû, rûhê wî paqij e dê ji xwe sivik be seyda. Ew ronahî ye ronahî. Ma çi giranîya ronahîyê heye Mele Ismaîl!!!!*
*Mele Ismaîlê ku alîyê wî yê çepê ji şaşikê heta şimikê şil bûbû, li pişt xwe zîvirî. Devê wî ji hev bû û pirseke zuwa bi rûpoşa wî kesê rûnuxamtî werkir:*

---
[160]Jan Dost*, Mîrname*, r. 47-48.

*- min tu li ku dîtibû?!!*"[161] Guftûgoya navbera wan jî derbarê sivikiya termê Xanî ye.

Herwiha li devereke din vebêjer Mela Ferîd dîmena gotûbêja navbera Mîrza Sebrî û Ehmedê Xanî de ji me re vediguhêze, gava Mîrza Sebrî û Mela Ferîd û mirovê rûgirtî diçin ba Xanî da giliyê Mîr bi Xanî ragihînin, êdî guftûgo di navbera Mîrza Sebrî û Ehmedê Xanî de dirust dibe, vebêjer Mela Ferîd vê dîmenê ji me re vediguhêze bi vî rengî: "*Mîrza Sebrî jî mîna ku bixwaze dengê xwe zelal bike, çend caran kuxikeke sivik û sexte kuxîya û bi wêrîneke bêşerm berê xwe da Xanî û got:*

*- Mîr ji te û hinerên te tengijîye!*

*Xanî behetî. Pêlekê bêdeng ma pişt re mûmeke nû bi mûma ku li ber vemirandinê bû vêxist û got:*

*- çima? Çi qewimîye!! Ma min kevokên Mekkeya mukerrem kuştine?*

*Û rabû pelikên xwe li rex qûmdanka çîngo danîn û vegeriya meclisa xwe*"[162]

Li gelek cihên din jî, dîmen hatine bikaranîn wek dîmena barîna ximavê di dema veşartina Xanî de, dîmena vemirîna çirayan di dema destpêka mirina Xanî de.

**3.3.2.2.Wesf**

Wesf teknîkeke din e ji teknîkên sist ên vegotinê "*bi roleke sereke dirêvebirin û pêşveçûna çîrokê de radibe.*"[163] Ne pêkan e teknîka wesfê di ti çîrok û romanekê de diyar nebe, ku ji nîşandan û nimayîşkirina tişt, kelûmel, ruhber û bûyeran pêk tê û herwiha malzemeyeke girîng e bo nîşandana cih di romanê de.

Tiştê ku girîng e û girêdayî vê mijarê ye dema vegotinê ye. Hêjayî gotinê ye ku di teknîka wesfê de "*pir caran sistiya vegotinê ji ber wesfê digihe asta rawestanê.*"[164] Lewra eger em binerin dema vegotinê ber bi sistiyê diçe û di rewşekê de ji ber berdewamkirina wesfê digihe rawestanê, ev jî bi rêya wesfa rawestiyayî û wesfa livok dibe, ku ya yekem wesfa tiştekî cihgirtî û nelivok dike û dema vegotinê radigre, ya duyem jî wesfa tiştekî ne cihgirtî û livok dike ku dema vegotinê jî ber bi pêş ve dibe.

[161]Jan Dost*, Mîrname*, r. 12.
[162]Jan Dost*, Mîrname,* r. 79-80.
[163] Jouf, Vansan,*Poetîka Romanê*, w: Mihemed Rehîm Ehmedî, Weşanxaneya Aras, ç. 1, Hewlêr, 2012, r. 310.
[164] Se'îd, *Teknîka Vegotinê,* r. 78.

Girîngiya wesfê di romanê de ne tenê di çarçoveya navê wê de ye û ne tenê wesfa tiştan e yan ev teknîk ne tenê ji bo bêhnvedana xwîner û bedewkirin û xemilandina metineke romanê ye. "*Di sedsala 19an de wesf di romanê de bi rengekî pir hatiye bikaranîn, ev jî wek Alain Robbe-Grille dibêje, bêhtir bi armanca dirustkirina dekor û diyarkirina çarçoveya bûyerê û derxistina aliyê fîzîkî yê karakteran bû. Lê di romana nû de wesf bi temamî cuda ye û girîngiya wê jî ne di tiştên wesfkirî bi xwe de ye, lê di bizava wesfê bi xwe de ye û rasterast jî girêdayî şêwazên vegotinê ye.*"[165] Her derbarê têkiliya wesfê bi vegotinê re Tenya Esad Mihemed dibêje: "*Wesf pêwistiyeke sereke ya vegotinê ye, pir zehmet e em bikarin bê wesf vebêjin, lê karekî hêsan e em bêyî vegotinê wesfê bikin, her ji ber vê yekê ye ku hunerên vegotinê nikarin dest ji wesfê berdin, herwiha wesf jî nikare cihê vegotinê bigre.*"[166] Bi baweriya piraniya rexnegiran wesf li ser du hîm û binemayên sereke û hevdij pêk tê ew jî ev in: Lêkolîn , Hilbijartin

"*Derbarê wan nivîskar nakok in. Balzac alîgirê binemaya yekem e û girîngiyê dide dûr û dirêjî û behskirina hûr û girs a tiştan. Berovajî wî Tolstoy dibêje ku, ew dûrûdirêjî xeyala xwîner dikuje, lewra alîgirê binemaya duyem e. Nivîskarên nû jî di vî warî de dibin du komMichel Butor dide ser şopa Balzacû Nathalie Sarraute jî dide ser şopa Tolstoy û Stendhal, lê Flaubert di navbera herdu koman de radiweste, dîmenên wiha hene ku behsa hûrî û girsiya tiştan dikin û dîmenên wiha jî hene ku tenê tiştên girîng wêne dikin.*"[167]

Li vir Jan Dost di romana *Mîrname* de, wek Flaubert)di navbera herdu grûpan de radiweste. Eger em binerin li hinek cihan behsa hûrî û girsiya tiştan dike, li hinek cihên din jî tenê behsa tiştên girîng dike û bi lezgînî û kurtî bi ser dîmen û wesfan de derbas dibe.Di romana *Mîrname* de, wesf xwe di çend tiştan de dibîne, wek:

#### 3.3.2.2.1. WesfaKarakteran

Diyar e her ji romana kevin bigre û heta niha yek ji cureyên wesfê di roman an di çîrokê de ji wesfa karakteran pêk tê bi awayekî ji awayan roman pê xemilandine, wek rêyeke

---

[165] Se'îd, *Teknîka Vegotinê*, r.79.
[166] Mihemed, Tenya Es'ed, *Bînaya Cih, Di Du Nimûneyên Romanên Kurdî de (Hêlane – Ejdeha)*, Weşanxaneya Serdem, Ç. 1, Silêmanî, 2011, r. 212.
[167]Se'îd, *Teknîka Vegotinê*, r. 80.

girîng jî bo sistiya vegotinê hatiye bikaranîn, di şêweyeke sade û basît de ev teknîk ji bo karakteran bikar anîne bi awayekî ku "*Sadetirîn şêwe ji bo wesfkirina karakterên romannivîsên kevin ji wesfê gewde û kurtiyek ji jiyana karakter pêk dihat*"**[168]**, ku bêhtir xwe di behskirina jiyana karakteran û laş û beden û çawaniya tevgera karakteran de didît "*lê di romana nû de kişandina wêneya karakter girêdayî jêhatîbûna nivîskar e, ku tenê bi wesfeke rûkeş a karakteran ranaweste lê amaje dide hinek taybetmendiyên hevbeş di navbera mirovan de*."**[169]** Herwiha eger di romana kevin de wesfa karakteran tenê wesfa derveyî ya kesayetiyan bû, lê di dema niha de berevajî ye û wesfa navxweyî ya karakteran jî beşeke ji wesfa karakterên romana nû. Herwiha yek ji erkên din ên wesfa karakteran "*diyarkirina aliyê derûnî û civakî yê karakter e*."**[170]**Çend nimûneyên wesfa karakteran ji devê vebêjeran:

Wesfa Êmayê Bosneyî ji devê vebêjer Recebê Terzî:"*Min tenê çavên wê yên keskî mîna du kevirên zeberced didîtin. Wê, tevî ku cariye bû jî, rûyê xwe vedişart. Keçikeke çav kesk û spehî bû. Horiyek bû û tim bîna enber û cennetê jê difûriya. Min hîn ên wisa xweşik û çavkesk li Bazîdê nedîtibûn. Ew durdaneyek ji agir bû û ez jî xortekî nûhatî ji berfa Gilîdaxê bûm. Dilê min ku ew didît dihelîya. Bêhna jinên weke wê hêj neketibû pozê min. dilbera minî Bazîdê li ber ronahî û şewq û şemala wê bûbû siyeke tarî di xewnên min de*"**[171]**

Wesfa Şêrîn ku cêrî ye, ji devê vebêjer Mîr: " *Min ew perîya gurcî bi pênsed zêrî kirrîbû. Lê tenê awirek ji çavên wê yên mêşinî hêjayî hezar florî ye. Fistiqên Şîrazê jî ne mîna devê wê yê biçûk û xweşikin. Mijek ji lêva wê ya jorîn ji toyê bi hingiv re têkel jî xweştire. Kepû elamseke giranbuha û hinarkên rûyê wê baxçeyekî qerenfilane. Diran gewherên Sikenderî ne û enî sehîfeya pêşî ji quraneke ku hîn çu melayî ew nexwediye. Bisk û gêsû rîhan û binefşin, birû hîva yekşevî yan kevanê rustemîne û awir tîr û xedengên kemankeşekî dilpola ne. Bejin minare ye, take rîhan e, şiva bê tûk û kelem e, rimeke zirav e, elifa ku bi destê Behzadê neqqaş hatiye kişandin. Newqa wê ji ziravîyê çu kemer lê nayên bestin, hema ku xwe ditewîne ez destê xwe datînim ser dilê xwe ji tirsa şikestina wê newqa zirav.*

---

[168]Wehbe, Mecdî û el-Muhendîs, Kamîl, *Mu'cem el-Mustelehat el-Edebiye Fî el-Luxe we el-Edeb*, Mektebe Lubnan, Beyrut 1979, r. 86.
[169]Se'îd,*Teknîka Vegotinê*, r. 80.
[170]Hacî, *Binyata Vegotinê*, r.198.
[171]Jan Dost, *Mîrnama,* r. 101.

*Sala ku biraziyê min mîrê Bazîdê mîr Mihemmed û katibê xwe Silêman beg di serayê de hatin kuştin, min ew kirrî. Ew çarde salî bû û horiyeke destnedayî bû. Karxezaleke kovî bû min ew di mêrg û çîmenê hemêza xwe de kedî kir. Jinên min jê didexisîn û hîn jî jê didexisin. Ciwan, bejin zirav û dirêj, çav du golên xeternak û kûr, îcar ne jinên min lê eger Şêrîna Ferhadê kohşikîn jî çav lê biketa wê jê bidexisîya. Eger Şah Ebbas çav lê ketibûya dê ew li şûna Şahxezala ermenî kiribûya horiya xwe ya herî hezkirî. Yan jî ku di dema sultanê mezin Silêmanxan de li heremseraya wî bûya, wê Xurrem sultan bibûya yek ji cêrî û peristarên wê.*
*Di nav nivîna min de ew dibe gulokek ji agir û li ser berfa ruhê min digindire. Ji sepeta lêvên wê yên têrmeywe têr nabim. Ji singa wê ya mermerîn û hilû û ermûşîn û herdu hirmiyên li ser têr nabim. Ji bêhnkirina keziyên wê yên bi ser min de dibin sîwaneke ji misk û enberê têr nabim. Her ku gulpekêji kewsera wan herdu lêvan dinoşim tîtir dibim. Ew şêrîn e, şêrînçêj û şêrînbêj û şêrînrêj e û weke ku şairê dîwana min Buharî di qesîdeyeke xwe de dibêje:*
*Şirîna mîr weke wê kes nedî hêj*
*Şekerrêj û şeker bêj û şeker çêj*
*Şikarçî me ku diçim nêçîra qitikên li ser sînga wê veniştî ne, bi xwe dilê min dibe nêçîr û dibe pirtapirta wî di tora awirên wê yên mîna pencên baz û şahînan tûj. Wê sibehê, wê sibeha ku xalîçeya ewran ya tarî li ser singa ezmanê Bazîdê hatibû raxistin û baran dibariya ez ji ber hemêza wê derketim. Şeva berî wê şeveke hingivîn ji şevên buhuşta xwedê bû ku min nedixwest bi dawî bibe. Li ser sînga wê heta sihoran mam û paşê ketim xew. Xeweke giran, xeweke şêrîn weke hingivê şikeftan bû. Dilê min û çûna nêçîrê hebû. Min kar û barê xwe kirin, xulaman jî hespê min ê kimêt zîn kiribûn, ratib û tîr û kevan û tivinga min a ku diyariya paşayekî romî bû hazir kiribûn û em çûne koka çiyayê Gilîdaxê nêçîrê bikin.* "[172]

Wesfa Ehmedê Xanî ji hêla Şengê: Diyar e gava bavê Şengê ji hecê vedigere, bangî maqûlên Bayezîdê bo mala xwe dike, Ehmedê Xanî jî tê bangkirin. Li wir Şengê wî dibîne û bi dîtina wî re bi vî rengî wesfa Xanî dike: " *Heta niha, heta vê rojê û vê gavê jî hîn bîna ku ji ber hûçikê ebaya wî radibû di pozê min de ye. Dengê wî ewqasî nerm bû te digot di rûnê mîhan da kiriye. Û rûyê wî ewqasî li ken bû te digot qey li keskesoran dinêre e.* "**[173]**

[172]Jan Dost, *Mîrname*, r. 210.
[173]Jan Dost, *Mîrname,* r. 49.

### 3.3.2.2.2. WesfaCih

Cih di metinê romanê de xwedî statû û girîngî ye û erdnîgariyeke ku karakter û bûyeran lixwe digre. Cih wek dika şanoyê ye ji bûyerên romanê re. Çend cureyên cih di nava romanê de diyar dibin, wek cihê taybet, cihê giştî, cihê rasteqîn, cihê biguman…. Girîngî û statûya cih pir caran di wesfa cih de derdikeve çimkî "*cudakirina mijara cih ji wesfa karekî zehmet e, çimkî wesf giyan dide cih û cihekî bilind didiyê di nav pêkhateyên din ên vegotinê de girîngtirîn şêwaz jî ku tê meşandin di bergewdekirina cih de wesf e. Wesf hokareke sereke ye di wênegirtina cih de.*"[174]

"*Wesfa cih û karakter û tiştan ne kêmtir e ji vegotin û kirdaran.*" [175] Di romana kevin de bêhtir wesf diyar û eşkere ye û girîngiyeke zêde pê tê dayîn û ev girîngî jî di wesfa cihê jiyana bajar û welat û kolan û dikan…hwd de derdikeve. Lê di romana nû de kêmtir di wê wesfa rûkeş de maye û bêhtir xwe di şêweya cihê sembolîk de dibîne. Di romana *Mîrname* de, wesfa cih bêhtir rûkeşî ye û kêmtir xwe di cihê sembolîk de dibîne, û hinek cih cihên hogir in li ba vebêjeran ku tê de aramî û asûdeyiya dil û derûna wan derdikeve, û hinekên din jî nehogir in li ba vebêjeran û tê de hest bi ewlehî û vehewînê nakin li cihan. Me jî mînaka wesfa du cihan aniye ku cihê yekemîn cihekî hogir e li ba vebêjer ku hest bi ewlehiyeke mezin dike, dibe ku hokara wê vegere wê yekê ku cihê jidayikbûna wî bi xwe ye wek wesfa Bedlîsê gava vebêjer dibêje: " *Bedlîs di dewrana wî de bûbû bihişta dunyayê, destê mirov jê nedibû. Heta yekî ku ji bo du rojan bi mêvandarî bihata wir, heftiyekê bêtir dima. Xanên wê erzan bûn, ji xwe piranîya xelqê yên ku hesp bi wan re nebûn nediçûn xanan, ew diçûne xanqah û camîyên ku ji dikana jî bêtir bûn. Şev nediçû ku deh kes hema li camîya Şerefîye bi tenê nebûna mêvan. Ji xwe feqeyên ku ji Melazgirê heta Xinûsê û heta Mûş û Diyarbekrê dihatin xwendinê, medreseyên Xetîbiye û Idrîsiye û Ixalsîye dagirtibûn, xwarin vexwarin û razana wan jî hemû li ser hesabê mîr Evdalxan bû. li nêzîka Gokmeydanî jî tekyexaneyek bi navê Şemsîye hebû dewrêşên wan welatan hemû tê de bi cih dibûn.*

*Hemamên Bedlîsê jî di temamê dunyayê de deng dabûn: heta rojekê, kalkê min digot, sultanekî osmanyian hate Bedlîs û xwe di hemameke wê de şûşt û bi keser got:*

---

[174]Mihemed, *Bînaya cih*, r. 213.
[175]Cindarî, Îbrahîm, *el-Feza‘ er-Rîwayî ‘Înde Cebra Îbrahîm Cebra*, Dar eş-Şiwn es-Seqafîye el-‘Ame, Bexdad 2001, r.184.

*- ma dê dunya xerabûba ku hemameke wisa li Stenbola min jî hebûya! "*[176]

Di wesfa cihekî din de herçiqasî vebêjer di destpêkê de hest bi hogirî û aramiyê dike, lê dûre ji ber wan bûyerên ku têne serê wî berevajî dibe, hest bi nearamiyê dike di vî cihî de, lewra di dawî de vedigere cihê jidayikbûna xwe piştî ku xewnên wî li vî cihî pêk nayên. Bi vî awayî vebêjer di wesfa Asitane Stenbolê de dibêje: " *Min nizanîbû Stenbol ewçende mezine. Min digot hema bila ducarî li Bazîdê be, lê derket Bazîda me nabe taxek ji taxên wê. Her camiyeke wê mîna Bazîdê ye û gemiyên di behra wê re diçûn û dihatin ji camiyên me mezintir bûn. Bajarekî ku her xelq û millet tê de hebû, heta qûlên reş yên rûyên wan mîna kodikên tijî ji qetranê jî di caddeyan de dimeşiyan. Qelender û axa û begzade û serbaz û sofî û mela û serbazên ser bi kum û per û dest bi rim û mertal di wan zikak û kolanên mezin û bi daran xemilandî de li bin guhên hev diketin. Serayên Humayonî ku li ser kenarê behrê avakiribûn weke goşiyên ronahiyê bi şev xuyadikirin.* "[177]

### 3.3.2.2.3. Wesfa Ruhberan(Heywan)

Pir caran ruhber heywanbi hemû cureyên xwe di romanê de bi roleke girîng radibin, herwiha wek semboleke bo bûyer û karesatan tên hejmartin, û herwiha ruhber di nava çîrokê de jî bi roleke girîng radibin nemaze di çîrokên zarokan de. Di romana Mîrname de, li ba Selîmê Nalbend û Mîr, ev cureya wesfê diyar û eşkere tê dîtin, wek mînak wesfa hespê Mîr ji devê Selîmê Nalbend gava dibêje: *Mîrê me bi xwe her roja înê min dawetî koşka xwe dike da ku ez serî li kimêtê wî yê navdar Şahîn bixim. Ellah wekîl hespekî mîna wî ne di tewîleyên şahên eceman de ne jî di yên sultanên me de heye. Ku simeke wî datînim ser kaboka xwe dibêjim dunya hemû bûye ya min. Ew jî hogirî min bûye. Ku çav li min dikeve serê xwe dihejîne û ber bi min ve tê weke ku ez xwediyê wî bim.* "[178]

Herwiha wesfa hespê Mîr ji devê wî bixwe vedema dibêje: "*Sala ku ez li ser textê mîrnuşînîyê rûniştim, xanekî ji xanatên Tebrîzê ew bi Hecî Zuhdî efendî yê tacir re bo min diyarî şandibû. Berê navê wî Şaper bû lê min navê Şahîn lê kir ji bo ku nêzîkî navê Şêrîna min a şêrîn be. Rengê wî sorekî tarî ye mîna kezeba xezaleke nûserjêkirî. Serê wî biçûk û guhên wî*

[176] Jan Dost,*Mîrname*, r. 32-33.
[177] Jan Dost, *Mîrnama*, r. 99.
[178] Jan Dost, *Mîrnama,* r. 174.

*bel û sînga wî fereh û pişta wî pehn û herdu fîrnikên wî fereh û simên wî xurtin. Teriya wî ya reş weke şeveke çiksayî û bêhîv bi erdê re dixuşe û bijiya wî ya qetranî û hevrêşimîn weke çemekî ji miskê ye li ser stûyê wî diherike.*
*Min rikêba wî ji zêr û celewa wî ji zîv çêkir. Zîna wî ji çermê xezalan û qedîfeyekî zer û bi tayên zêr dirûtî ye. Ew pirr bi sebr û aram e û heta ku ez jê re nefîkînim naçe ser avê. Deh rojan tî mabe jî bê fîkandina min avê navexwe. Ez wî bi sed revoyên kihêl û necdî û hespên fal û seglawîyan nadim*
*Ku dibeze tu dibêjî ew avjenîyê dike yan difirre û hema hema simên wî bi erdê nabin. Çavên wî yên safî û reş weke du qedeh enber dibiriqînin û dengê hîrehîra wî awazên taveke buharî ne. Hespekî erebî ye ku kalkên wî li ser qûma Hicazê ya pîroz didan cirîdan. Dibe ku bapîrekî wî hespê hezretê pêximber be jî! Ew gelekî bi fêhm û jîr e û siwarê xwe tucarî nade erdê*"[179]

Herwiha wesfa şihab baz ê mîr ji devê wî bixwe ve dema dibêje: *"Bazê min e. şêx Seyfeddînê Cubbeşîn havîneke ew ji min re ji hêla Wanê anî bû. bi xêra vî bazê çavdûrbîn kîna waniyan ji dilê min weke refek zaxên reş firiyaye.*
*Lê çi baz e!! Hema bibêje nikilê wî xencereke koçeran e, pencên wî çengelin û singa wî ya fereh û deqdeqî mîn çermê pilingekî ye. Çavên wî yên mezin û kildayî kûrbîn û tûjin, ku mişkek li ser erdê bilive û ew jî di nav ewran de be, ew dibîne"*[180]

### 3.3.2.2.4. Wesfa Tişt û Kelûpelan

"*Kelûpel bo tijekirina cih e û tuxmeke ji tuxmên cîhana derveyî ya mirov, ku dikare bidest bixe, amadebûna wê jî di nav metinê edebî de bi roleke girîng radibe*."[181] Di romanê de jî tiştê ku di çarçoveya tişt û kelûpelan de tê behskirin, ne bê hokar e û girîngiyeke wê ya taybet heye di dirustbûna romanê bi awayekî giştî de. Pir caran tişt û kelûpel asta civakî û debar û pîşe û rewşa derûnî ya karakteran nîşandidin. Herwekî çawa Alain Robbe-Grillet behsa Balzac dike di bikaranîna tişt û kelûpelan de û dibêje: "*Dema Balzac wesftiştekî dike, dixwaze derbirînê ji sîfeta mirov bike, yanî gava wesfa perdaxek av dike dixwaze behsa sîfeta*

[179]Jan Dost, *Mîrname*, r. 211.
[180]Jan Dost, *Mîrnama,* r. 212.
[181] Muftî, Perî Salih, *Vegotin Di Çîrokên (Ehmed Mihemed Îsmaîl) de*, Çapxaneya Hacî Haşim, Hewlêr, 2012, r. 189.

*xwediyê wê bike, gelo hejar e yan zengîn e, pozbilind e yan nefsbiçûk e.*"[182] Di romana Mîrname de jî, li çend cihan wesfa tişt û kelûpelan hatiye ku her yek ji wanjî girîngiya xwe heye wek: Wesfa sêniya zîvîn ji devê vebêjer Emerê Xeznedar, ev sêniya zîvîn wiha li vebêjer dike ku vegere paş û behsa serdema xwe bike gava li ba Ebdal Xan, kilîtdarê wî bû û çawa Mîr bawerî pê dikir, bi vî awayî dibêje: *" xulamê wî Nezmîyê Çerkez, ku berê xulamê mîr Evdal jî bû, jê re şaberrûyên biraştî diqeşartin û dixistin sênîyeke zîvîn ya li ber wî. Min ew sênî jî berê li ber mîr Evdalxan dîtibû. Mewîjên ku ji hêla Mêrdînê dihatin tev li qinnên gwîzan dikirin û di şevbuhêrkên zivistanî de dixwarin. Çavên min di sênîkê de man û xeyalê min çû wan rojên xweş yên ku tê de xiznedarê mîr bûm.*

*Mîr gelekî bi min ewle bû. Tevî ku ez bîst û du sê salî bûm jî kilîtên sendoqa gewherên xwe yên herî nirxdar da bû destê min. Weke ku ew bi min bawer bû, bi kurê xwe Diyadîn ne bawer bû. Di civatên xwe yên xas de her pesnê min dida û digot:*

*- di Rojikîyên belbasî de sê kes mîna Emer nînin, çavên wî çavên bazên çiyayên Şerefdînê ne! dikare dizekî di tewafa li dora keebeyê de nas bike. "*[183]

Herwiha wesfa mirekeb-hibir-ximavê li ba Şengê: *"Rehmetî nameyek bi suxteyekî xwe re şandibû û xwestibû ku ez bi destê xwe hinek murekkeb jê re saz bikim. Ew mektûba wî tim di ber benda heyderî ya ku li serê min gerandî de bû. Wî tê de gotibû ku dê kitêbeke evîndarîyê binivîsîne û dilê wî heye bi hibra ku henasên min tev lê bûbe, çîroka evînê rêz bike. Min jî yeka wî nekir du û dest pê kir arîya sîsikên zeytûnan, ku min ew di kûpikekî devgirtî de li ser agirekî aram şewitandibûn, tev li şîrêza erebî kir. Çend rojan di hawinê sifir de kutand. Berî ku murekkebê berdim şûşeyê, min ew rojekê tewaw li ber tavika rojê danî. Hin tayên hevirmêş û çend mû ji biskên xwe xistin binê şûşeyê û murekkeba reş berda ser û serpoş kir. Digotin ku hevirmêş nahêle murekkeb zû bi zû zuwa bibe. Ez vê yekê ji keçikên Bazîdê fêr bûbûm. Hin ji wan dil diketin feqeyên xort û ji wan re murekkeb hazir dikirin da ku dersên xwe pê binivîsin. Wan digot ku meşqên bi hibra keçikan werin nivîsandin, tu carî ji bîra feqeyan naçin. Feqeyan jî her yekî xwe bi murekkeba xwe paye dikir û dida ber pozê hevalê xwe û weha ji hev re digotin:*

[182]Krîye, Alin Rub, *El-Cin wa el-Mtaheme, lîqa'at Îcraha Me'e Şakr Nurî*, Dar eş-Şun es-Seqafiye, Bexdad 1990, r, 76.
[183]Jan Dost*, Mîrname*, r. 32.

*- hmmmm. Bîna buhuştê ye.*

*- Aax. Bîna memikan jê tê.*

*- Oox çi xweşe. Tev li miska porê yarê bûye. "*[184]

Li ba piraniya vebêjeran wesfa tişt û kelûpelan ji bo mebesteke girîng hatiye bikaranîn, ew hemû tişt û kelûpel jî girîngiya xwe hene.

### 3.4.Dem di Aliyê Pêwendiyên Dubarebûnê de

Eger berê dubarekirina gotinekê yan bûyerekê yan hertiştekî di nav metinê edebî de bi giştî û di nav roman û çîrokê de bi taybetî wek eybî û kêmasiyekê bihata hejmartin û mîna kêmanî û çewtiyeke dahêner bihata wesfkirin, lê di romana nû de "*dubarekirin ne tenê ji eybiyê derketiye û hew, lê bûye teknîkeke sereke ya wiha ku bi tiştekî ji teknîka şepêla hiş û teknîkên nû yên din ên vegotinê ne kêmtir e, wekî din jî em dikarin bêjin ku romannivîsên ingilîz Virginia Woolf û James Joyce û William Faulkner bi afirandina (teknîka şepêla hiş) hunera romanê bipêşve birin û romannivîsên fransî jî ji hêla xwe ve bi dahênana (teknîka dubarekirinê) terazûyek dan romanê û nerînên xwe yên taybet li hunera romanê zêde kirin û pêşveçûneke berçav dan romanê.*"**[185]**

"*Dubarekirin wek tuxmekî ji tuxmên hunera vegotinê, tê wateya ku bûyerek di çend hîkayetan de, bi çend şêweyekê yan ji çend nerîngehên cihêreng ve bê behskirin, bi rêya van cureyên dubarekirinê derdikeve ku vegotina cuda ya bûyerekê dibe sedemê dirustbûna nerîneke cuda, derbarê heman tişt û heman diyardeyê. Cudahiya van lênihêrînan têgeha rêjeya heqîqetê piştrast dikin ku beriya hingê Einstein di teoriya xwe ya rêjeyiyê de tekez kiribû.*"**[186]** Diyar e mebesteke din a romannivîs ji bikaranîna vê teknîkê pir caran ji bo wê yekê ye ku dema vegotina bûyerên romanê bilez ber bi dawî neçe û curek ji sistiyê diyarî dema vegotina romanê bike. Dubarebûna bûyerê di romanê de bi çend şêweyan tê pêşkêşkirin, wek:

---

[184] Jan Dost, *Mîrnama*, r. 43-44.

[185] Rojbeyanî, *Çîroka Hunera Kurdî*, r. 72.

[186] Elwenî, *Lêkolînên Rexneyî yên Şîrovekarî*, r. 26.

### 3.4.1. Yekcarê Vegotina Wan Bûyerên Ku Yekcarê rû Ridin

Li vir romannivîs an vebêjer yekcarê wê bûyerê vedibêje ku yekcarê rû daye, ku di temamiya romanê de yekcarê ev bûyer heye. Di romana Mîrname de, ev cureya dubarekirinê hatiye bikaranîn, wek:

"*Tenê carekê derket ku avdasê bigre, hema mirovê rûveşartî bi lez rabû û zeyta çiraya wî bi zeyteke di paşila xwe de guherî û hat weke berê rûnişt. Mele Ferîd bala xwe nedayê,ew bi ser kitêbekê de xwar bûbû. Lê min dizanîbû ku êdî jehr kete hucreya Xanî*"[187] Ev bûyer yekcarê qewimiye û vebêjer jî yekcarê vedibêje, herwiha bûyer jî di romanê de xwedî statû û girîngî ye, eger hatiba û Xanî neçûba ser avê, êdî plana ku mirina Xanî bû dibe ku neqewimîba, yan bi awayekî din rû bida.

### 3.4.2. Vegotina Çend Carekê ya Wan Bûyerên Ku Çend Caran rû Didin

Li vir romannivîs an vebêjer çend carekê wê bûyerê vedibêje ku çend carekê rû daye, ne merc e weke hev û peyv bi peyv bi heman peyv û hevokên berê dubare bibe. Wek van mînakên li jêr:

" *min jê re got ku bêguman mîr divê xeberdar bibe, ew dê biçe defna wî hazir bibe. Lê xulamê wî got ku îroj remezan e dê mîr di xew de bimîne. Min dubare gotê ku Xanî çûye rehmetê divê ez xeberê bigihînim cenabê wî.*"[188] Li vir vebêjer ducaran wê yekê vedibêje ku dixwaze here ba Mîr û nûçeya mirina Xanî bidiyê. Herwiha ew bixwe jî amaje dide peyva dubarekirinê.Herwiha Feleyê Hekîm sêcaran wê bûyerê vedibêje ku çûye ba Xanî wî derman bike, ango sêcaran jî serdana wî kiriye.

Cara yekem: "*Selahedînê kitabfiroş berî çendakî hate ba min û got:*
*- Xoce Zuhrab zû xwe kar bike were, şêx Ehmedê Xanî qewî diêşe.*
*Dêliya Tirs û lavê ku li rûyê Selaheddîn yê zirav û henûn sî vedabû hişt ku ez li bayê bezê dewadanka xwe ya çermîn rakim û di pey wî re bi kêlîkekê herim mala seyda .*

[187] Jan Dost, *Mîrname*, r. 88.
[188] Jan Dost, *Mîrnama*, r. 181.

*Çawa ku ez çav lê ketim, min di çavên wî de terpeterpa piyên mirineke nêzîk bihîstin. Çavên wî fesadiya jehrdayinê dikirin. Kenarên wan sor bûbûn û nava wan zer û melûl bûbû mîna çiraxeke ku zeyt di binî de nemayî"*[189]

Cara duyem: " *Carekê ez dîsa çûme serdana wî. Wê şevê sofî Heyder hat ez bi hespê birim ba Seyda. Dîsa baran bû û erd bûbû çirav û meş tê de nedibû.*"[190]

Cara sêyem: " *Cara dawî ku ez çûme nik wî. Min dît rûyê wî spîçolkî bûye û qeraxên çavên wî pirr zer bûne. Min di wan de gurmegurma defa mirinê his kir.*"[191]

### 3.4.3. Vegotina Çend Carekê ya Wan Bûyerên Ku Yekcarê rû Didin

Ew e ku vebêjer çend caran wê bûyerê vedibêje ku yekcarê rû dide, "*ev jî bi guhertina şêwazê yan bikaranîna nerîngeha cuda, yan bi guhertina karakter û vebêjer bi karakter û vebêjerekî din. Ev dubarekirin jî ne merc e ku bi dû hev de be, lê li ser çend rûpelên romanê yan bi dirêjiya hemû beşên wê dubare dibe.*"[192] Di romana Mîrname de ev cureya dubarekirinê li gor cureyên din bêhtir hatiye bikaranîn, nemaze bûyera barîna mirekeb an ximavê û vemirîna çirayan, lê bi nerîngehên cuda û ji hêla çend vebêjerên cuda:

Wek mînak: Emerê Xeznedar " *Bi qêrîna Teymûrê gurcî re, min texmîn kir ku her kesî berê xwe da jor. Hinekan kire birebir û gotin: vî serxweşê han dîsa hiş winda kirîye û hatiye. Min jî weke ku korbûna xwe ji bîr kiribe serê xwe bi jor de bir. Min tiştek seh nekir, ez ji berê de bi salane ku di reşayîyeke weke hibrê de me, ma min dê çi bidîta? Koranî bi xwe reştirîn hibre ku xêzikên bi wê hatine nivîsîn tenê kor dikarin bixwînin.*
*Min nikarîbû wê rojê xêzên barana hibrê bidîtana, lê min kefa destê xwe da ber wê xunavîya ku hûrik hûrik dihate xwarê û çipikên ku bi ser de barîyan, bîn kirin. Rastî jî bîna hibrê ji wan dihat.*
*Min piştî korbûna xwe tenê du caran xwest ku bênahîya çavên min li wan vegere. Cara yekem roja ku ez ji Bedlîsê derketim. Piştî ez texnekî meşiyam, bêhemdî xwe li pişt xwe zîvirîm da awira dawî li bajarê xwe yê wêran û xopan bixînim. Dilê min hat ku felqe bibe û min mîna*

[189]Jan Dost*, Mîrnama*, r. 137.
[190]Jan Dost*, Mîrname*, r. 138.
[191]Jan Dost*, Mîrnama*, r. 142.
[192]Se'îd, *Teknîka Vegotinê*, r. 105.

*cewrikekî ku zarokin qedaker terîya wî jêbikin kire kûzekûz. Cara duyem jî roja binaxkirina Ehmedê Xanî bû. Min xwest çavên min vebûna û ew barana hibrê bidîta.*"[193]

Hacî Zuhdiyê Bazirgan " *Ez nizanim çi baran bû wê rojê dibarîya? Çipikên reş weke ku tev li tenîya binê sêlê bûbin cilên minî nû lewitandin.* "[194]

Buharî " *Erê welle! Baraneke reş dibarîya û xelqê digot ew yek ji kerametên şêx e. Wan digotin ku hibr dibare, ez him dilteng dibûm û him jî bi aqilê xelqê dikenîyam. Ma kesî dîtiye di zemanan de hibir dibare!! Roja Firdewsî mir jî hibr nebariya bavo! Ji xwe wê rojê rojeke sar bû û her kesî agir dadabû û dûyekî reş bi ser her malê ketibû. Min wisa texmîn kir ku ew dûyê reş hilkişiyaye ezmanan û ewr hemî lewitandine, loma jî rengê çipikên baranê reş bûbû, lê ma wê kê ji min bawer bikira di wê hay û hoyê de!!*"[195]

### 3.4.4. Yekcar Vegotina Wan Bûyerên Ku Çend Caran rû Dane

*"(Todorov),ji vê cureya vegotinê re dibêje vegotinaçêkirî û ew e ku vebêjer yek carê wê yekê vedibêje ku çend caran rûdaye. Yanî bi rêya frêzeke zimanî yan şêwazê bi yek carê behsa wan bûyeran dike ku çend caran dubare dibin. Ev jî ji ber wê yekê ye ku romannivîs xwe ji dubarekirinê biparêze ku dibe ku hin caran ew dubarekirin ziyanê bigihîne aliyê hunerî yê proseya vegotinê."*[196] Û ev bûyer *"bêhtir ji şêweya edetekê di siruşta mirovan de derdikeve, vebêjer daxwe ji dubare vegotina wan biparêze ku xwîner tûşî bêzariyê dike, hatiye bi rêya frêzên wek her sal, hertim, êvaran û bi rêya teknîka kurtkirinê, yek carê behsa bûyeran dike, çimkî bi rastî dubare vegotina van bûyeran ne tenê sûdeke berçav nagihîne binyata vegotinê, lê ziyanê jî digihîne aliyê wê yê hunerî."*[197]

Wek mînak Şengê wek edetekê her du sê salan carekê serdana mala bavê xwe dike, lê Şengê yek carê vegotiye: " *Her du sê salan carekê dihatime malbava û kurekî nû di ber pêsîra*

---

[193]Jan Dost, *Mîrname*, r. 29-30.
[194]Jan Dost, *Mîrnama*, r 51.
[195]Jan Dost, *Mîrnama*, r. 62.
[196]Se'îd, *Teknîka Vegotinê*, r. 108.
[197] Se'îd, *Teknîka Vegotinê*, r. 109.

*min de bû! di wan salan de weke ku çemekî ji qîrê di navbera min û delalîyê dilê min de biherike! "*[198]

Herwiha Mela Salihê Cizîrî ji me re behsa Xanî dike ku wek edetekê, herşev ew beşê ku ji Memû Zînê dinivîsî, her sibehekê jê re dixwend, lê Mela Salih yek carê behs dike: *" Wî her sibe tiştê ku êvarê nivîsîye ji min re dixwend, pirsa der û dorên cizîrê, ava çem û tebîeta wê ji min dikir "*[199]

[198]Jan Dost, *Mîrname*, r. 48.
[199]Jan Dost, *Mîrname*, r. 152.

## 4. Vegotina Bûyerê

### 4.1.Têgeh û Pênaseya Bûyerê

Bûyer regezeke sereke ya romanê ye, ti romanek bê bûyer nîne, tiştê ku roman pê tê xemilandin ew bûyerên yek li pey yekê ne ku tê de bergewde dibin "*Bûyer kirdareke destpêk û navend û dawiya wê heye yan zincîreke rastî realîte ne, di warê organîk de têkildar in bi hevdu û bi rêya destpêk û navend û dawî xwe nîşan didin*."[200] "*Vegotina romanê girêdayî bûyerê ye ku babet û naveroka romanê pêk tîne*."[201]

Behskirina bûyerê yan her regezeke din a romanê ne hêsan e û têkildarî ravekirin û behskirina aliyên teorî û pratîkî ye, beşdariyeke mezin di berhemanîna bihayê romanê de dike, bûyer bi awayekî giştî bi dû hevtên, lê pir caran di çarçoveya demê de û li gor pêwistiya siruşta romanê pêkan e arasteya wan bê guhertin. Aristotle di berhema xwe ya Peotîka de dibêje: "*Bûyer kirdareke destpêk û navend û dawiya wê heye*."[202] Lewra pêwist e bûyerênromanê ji binyatê ve balkêş bin û hêza bîr û hizrê nivîskar û xwîner bilivîne. "*Dr. Îzedîn Îsmaîl dibêje: Bûyerên hunerî ew zincîre bûyer in ku bi vegotineke hunerî tên vegotin, çarçoveyeke taybet lixwe digre."*[203]Pir caran em di jiyana xwe ya rojane de bûyerekê dibihîzin an di romanekê de, di destpêkê de bûyerek ber çavê me dikeve, demildest bala me diçe ser rûdana tiştekî yan karekî, ev derbarê romana kevin an jiyana me ya rojane. Lê ev cureya bîrkirinê bi ser hinek bûyerên romana nû de tetbîq nabe, lewma pêwist e em bîr li bûyerên hunerî bikin di romanê de, divê em binyateke hunerî pê bidin, nabe bûyerên romanê bûyerên texlîda jiyana rojane bin herwekî çawa Ebdulla Serac dibêje "*romannivîsê serkeftî pabendî bîrên belav û nerînên normal nabe*."[204] Lewra bi vî awayî bûyer di nav regezên din de diyardeyeke şênber û têbînîkirî ye, çimkî siruşta pêwendiyên kesî yên curbicur ên nav metinê romanê de wek hezkirin, serkeftin, têkçûn, jidayikbûn, mirin, sefer, ger, kirîn, firotin û hwd hemû çend babetekê pêk tînin ku dibin sedemê berhemanîna çend bûyeran dinav bihayê

[200]Mihemed, *Binyata Bûyerê*, r.13.
[201] Mistefa, Rêzan ‘Osman, *Binyata Cureyên Bûyerê Di Romana Kurdî ya Başûrê Kurdistanê de (1985-1990)*, Nameya Masterê, Hewlêr, 1999, r. 41.
[202] Aristotle, *Hunera Helbestê (Helbestnasî)*, Wergera Ji Îngilîzî: Ezîz Gerdî, Weşanxaneya Rênima, Silêmanî, 2004, r. 33.
[203]Hacî, *Binyata Vegotinê,* r. 15.
[204] Serac, Ebdulla, *Ber Bi Istana Roman û Nerîngehan*, Weşanxaneya Serdem, Ç. 1, Silêmanî, 2007, r. 45.

romanê de û romannivîs jî divê hewl bide wan pêwendiyên nihênî bibîne ku dibe bingeh bo dahênana her cure bûyerekê bo bêhtir qalkirina bûyera sereke û mebesta romannivîs ji pêşveçûna proseya vegotinê "*di vê navê de jî rengdan û kartêkirina bûyerê li ser diyarkirina atmosêfra giştî ya tekstê dibe. Em bi wateyeke din bêjin: Ew bûyerên ku romannivîs wan hildibijêre dadi teksta xwe de li ser wan kar bike, beşdariyeke pir çalak di fezayê giştî yê tekstê de dikin, ev jî rê vedike dabikare bi bedewî şûna destê xwe di rêveçûna reftar û helwesta karakterên cuda de derxe*."[205] Lewra divê di dawî de armanca romannivîs an çîroknivîs ew be ku me neçar bike em bifikirin û bi kûrî wateyên veşartî yên bûyeran fêm bikin.

Teknîka vegotina bûyerê di romana Mîrname de, teknîkeke nû ye û romannivîs bêhtir hewl daye ji vegotina bûyerê ya texlîdî derkeve û şêwaza pêşkêşkirina bûyerê ya nû bikar bîne, û di hûnandina bûyeran de li gor rêzbendiya wan yanî destpêk û navend û dawî bikar neaniye û belkî hewl daye van yekîneyan têkbişkîne û di vegotina bûyerê de parçeyên bûyerê têkil bike. Ev şêwaza vegotinê jî di romanê de bêhtir bergekî xeyalî û fantazî diyarî romanê dike û di atmosfêreke balkêş de li ber çavê xwîner tên û diçin.

Binyata bûyerê di romana Mîrname de, em dikarin bêjin hemû binyat tê de hene, lê di rêza yekem de binyata têkilîhev a bazineyî ye. Destpêka beşê yekem ê romanê binyateke zincîreyî ya kurt e, taybet e bi veşartina termê Şêx Ehmedê Xanî, ku li ser zarê vebêjerê hertiştzan tê vegotin. Dûre her yek ji karakteran bi awayekî cuda dest bi vegotina bûyeran dikin ji nerîngeha xwe ya taybet û derbarê pêwendiya xwe bi Şêx Ehmed re diaxivin. Hemû vebêjer piştî veşartina Ehmedê Xanî ji xalekê ve dest bi vegotina bûyeran dikin. Ev karakter vedigerin rabirdû, yanî beriya ku Xanî koça dawî bike, tew hinvebêjer digihin beriya jidayikbûna Xanî jî, behsa pêwendiyên xwe bi Xanî re dikin heta wê kêliya ku digihin dema piştî veşartina Xanî. Lewra dema vegera bo rabirdû binyata têkilîhev dirust dike û gihîştina bo heman xala destpêkirina vegotinê, binyata bazineyî li ba heryekî ji wan dirust dike.

---

[205] Xeyat, *Bînaya Bûyerê*, r.19.

### 4.2. Binyatên Vegotina Bûyerê

#### 4.2.1. Binyata Zincîreyî (Texlîdî)

Pir caran di nav rexneya edebî de wek şêwaza texlîdî jî tê binavkirin, ev binyata zincîreyî kevintirîn cureya vegotina bûyerê ye ku dîroka derketina wê hevdem e ligel derketina metinê çîrok û hîkayetan "*şêweya sereke ya vê cureya teknîkê ji vegotina bûyeran bi rêzbendî wek zincîrê ji destpêkê heta lûtkeyê bo dawiyeke Maupassantî û wesfkirina dûr û dirêj û rûkeşî pêk tê*."[206] Herwiha "*Bikaranîna wê di helbest û romanê de wek hev e û cudahiya wê tune gava bûyer di romanê de bi dû hevtên, di helbestê de jî xal bi xal bûyer bi dû hevtên heta kêliya dawî*."[207]

Ango zelal dibe ku ev cureya binyata bûyerê ji xaleke rabirdû ya di metinê de dest pê dike û ber bi dema niha ya nav metinê diçe, yanî bi şêweya zincîreya bi dû hev hatî bûyeran vedibêje. Di vê şêwazê de bi ti hawî nivîskar nikare dema rasteqîn yanî rabirdû, niha, dahatû parçe bike û cihguherînê bi van cureyên deman bike, belkî wan bi şêweya wan a siruştî bikar tîne yanî "*ji bidûhevhatina bûyerên romanê di çarçoveya demê de û berdewambûna di pêşveçûna bûyeran de ber bi dawiya hîkayetê bêyî hilgerîna bo rabirdû, di vê rêçikê de ji bilî guhdana bi destpêk û ho û hokaran, guhdana bi demê tê dîtin, çimkî bûyer di çarçoveya demê de berbi pêşvediçin, ev jî sadetirîn şêweya çîroka pexşanê ye ku behsa zincîreke bûyeran bike*."[208] Yan bi wateyeke din "*Vebêjer bûyeran bi zincîreya wan a siruştî vedibêje, herwekî çawa di rastiyê de qewimîne, bi karê rabirdû dest pê dike, êdî bi hêleke asoyî ber bi dahatû gav dide bêyî ku vegere rabirdû, bûyer jî ligel bi dûhevhatina çîrokê geş dibe heta dawî*."[209]

Wek me got ev rê wek kevintirîn cureya vegotina bûyerê tê hejmartin, lê nabe em wê yekê piştguh bikin ku hatina teknîka nû nebû hokar bo nehîştina vê rêyê, çimkî heta niha jî ev cureya binyata bûyerê di nav metinê romanê de hest pê tê kirin, ti romanek ne vala ye ji vê

---

[206] ‘Arif, Şêweyên Teknîkê, r. 8.

[207] ‘Ebidan, Întîsar Cwîd, *el-Bunyet es-Serdiye Fî Şî‘ir Nizar Qebanî*, Rîsale Macstîr, Kliye et-Tirbiye Lîbinat, Camî‘e Bexdad, 2002, r. 59.

[208] Mistefa, Rêzan ‘Osman, *Binyata Cureyên Bûyerê Di Romana Kurdî ya Başûrê Kurdistanê de (1985-1990)*, Çapxaneya Spîrêz, Ç. 1, Dihok, r. 98.

[209] Mufti, *Vegotin Di Çîrokên Ehmed Mihemed Îsmaîl de*, r. 48.

binyatê. "*Ji me re diyar dibe ku şêweya vegotina normal destpêk bû, peydabûna teknîka nû nebû sedemê bidawîhatina wê.*"[210]

Ango tevî keviniya vê binyata bûyerê û derketina çend cureyên din ên binyata bûyerê heta niha jî bi temamî ji nav neçûye û nehatiye piştguhkirin, lê di nav romana niha de jî tê dîtin û ev jî girîngiya vê binyatê di proseya vegotina bûyerê de ji me re derdixe "*li gor hinrexnegiran, ev binyat zincîre sîmaya cewherî ya edebiyatê ye.*"[211]

Di nav romana kurdî de jî şêweya vegotina normal ligel şêweyên din ên vegotina bûyerê her maye û bi rastî gelek romanên me hene ku di rabirdû de bi vê şêwazê hatine nivîsandin. Di romana niha de jî ev şêwaz tê dîtin. Herwiha ev binyat "*ne di romanê, lê di çîrokê de tê bikaranîn, çimkî çîrok mecaleke wê ya kurt heye û dirêjiya wê bi şêweyekê ye ku nivîskar dikare bi hêsanî vê binyatê tê de pratîze bike.*"[212]

Em dikarin bêjin naveroka romana Mîrnamedîrokî ye. Yek ji taybetmendiyên romana dîrokî jî ji destpêkeke balkêş pêk tê, da bikare xwîner bide bawerkirin an wê baweriyê di xwîner de peyda bike ku meraqdar be bo xwendina romanê, herwiha xwîner neçar bike da ber bi kûriya romanê biçe. Destpêkeke balkêş di romana Mîrname de nîşaneya serkeftina vê romanê ye. Bi şêweyekê ev destpêk vebêjerê hertiştzan ku romannivîs bixwe ye pexş kiriye, bûyer di vê pêşgotinê de bi şêweya zincîreyî hatine vegotin, tê de rêveçûna demê nehatiye têkşikandin û vebêjer bi zincîreya dema vegotinê pabend bû.

Ev destpêk di romanê de pêk tê ji kêşana wêneya demeke diyarkirî, ku pêk hatiye ji tevger û reftara çend karakteran û nimayîşa eteketa veşartina term wek edetekê li ba neteweya Kurd, piştre nîşandan û navanîn û nasandina karakteran û behskirina rûyê derve yê karakteran. Ev şêwaza vegotina bûyeran di beşê yekem de ji rûpela 11-20 digre û bi şêweya vegotina zincîreyî tê pêşkêşkirin.

Destpêk bi kolandina gorê û di dawî de anîna termê Xanî û îcar xistina wî ya nava gorê de, piştre xwendina telqînê li ser wî bidawî tê. Ev dîmen ji destpêkê heta dawî bi zincîreya

---

210 Caf, Hesen*, Çîroka kurdî ya Nû,* Çapxaneya Alaa, Bexda 1985, r. 82.
211 Îbrahîm, el-Bîna‘ el-Fenî Fî Rîwaye el-Herb, r. 27.
212 Mihemed, *Binyata Bûyerê Di Romana Kurdî de*, Çapxaneya Renc, Silêmanî, r. 69.

bidûhevhatina bûyeran tê nîşandan, di destpêkê de ku bi kolandina gora Xanî dest pê dike vebêjer dibêje: "*Mirovê rûnuxamtî, axa ku bi cilên wî ve girtibû û li ber çipikên baranê bûbû peşkin ji herîyê û li rûpoşa wî jî ketibûn, bi destê xwe yê rastê daweşand û ji binê gorê de bi dengekî jinane bang kir:*
*- evçende bese.*
*Dema ku bi destê wî girtin û ew derxistin, pişikên xwe tijî bayê şil kirin û got:*
*- eeeeeeeh. Elhemdulillah em li tehtan rast nehatin, gora wî pir bi nermî hate kolan.*"[213]

Paşan vebêjer her bi şêweya zincîreyî bûyeran vedibêje û behsa anîna termê Xanî dike û dibêje: "*Dema ku darbesta termê şêx Ehmedê Xanî li ser, xuyabû. Mêrê rûnuxamtî bi alî wê de lezand. Çar mirovên ku her yekî ji wan bi alîyekî darbestê girtibûn hêdî hêdî dimeşîyan. Wî xwe gihande wan û xwe xwarî bin darbestê kir. Kefenê spî yê li term pêçayî weke ku baran nabare zuwa bû, lê hayê wan kesên ku cenaze hilgirtibûn ser milên xwe jê nebû.*"[214]

Dûre Xanî dixin hundirê gorê de: " *Mîrza Sebrî yê ku hêla wî ya çepê di baranê de mabû jî dakete binê gorê, û herduyan bi hev re bangî kesên ku li jor bûn kirin:*
*- de ka cemaet ka. Termê rehmetî bidin me, sunneta pêximbere ku mirî bi lez werin definandin. Çend mirovên li jor, term xistin ber hemêza xwe û daqûlî jêr bûn. Mîrza Sebrî û mirovê rûnuxamtî ew girtin û xistin wê çalika ku di dîwarê quble yê gorê de bi qasî du buhustan hatibû kolandin. Pişt re rêzeke ji keviran li dirêjîya term danîn û êdî Xanî bi kefenê xwe yê zuwa û hesretên xwe yên vêketî ji ber çavan winda bû.*"[215]

Piştre piştî xilasbûna vê proseyê jî di dawî de telqînê li ser dixwînin, bi vî rengî: "*Şêx Seyfeddîn cubbeyê xwe yê şîn hilmişt û heta ber newqa xwe ya qalind û stûr anî û li ber kêla serê Xanî rûnişt da ku dest bi telqînê bike.*
*Baranê jî axaftina xwe ya avî nizim kir, weke ku dixwest guhdarîya gotinên dawî yên ku dê zindî ji kesekî mirî re bibêjin, bike. Çipikên wê hêdî hêdî tarî dibûn, lê bala kesî nekişandin heta ku di nav vingevinga şêx Seyfeddînê Cubbeşîn re dengê Teymûrê meyxur, yê ku bi navê Teymûrê fasiq dihate naskirin, hat. Ew bi hêrs û tirs qêrîya:*

---

[213]Jan Dost,*Mîrname*, r. 11.
[214]Jan Dost,*Mîrname*, r. 12.
[215]Jan Dost,*Mîrname*, r. 18.

- *Wey bavo ev çi ye !! hibr dibare hibr!!*"[216]

Lewra eger em binerin proseya veşartina Ehmedê Xanî bi şêweya zincîreyî ya yek bi dû yekê de birêve diçe bê vegera li dema borî yan rabirdû. Ev şêwaza vegotina bûyeran jî tenê di beşê yekem de xuya dibe.

### 4.2.2. Binyata Têkilîhev

Piştî wê guherîna mezin ku di destpêka sedsala bîstan de bi ser edebiyatê de hat bi awayekî giştî, tê de tîşk û tîrêjên van guherînan gihîştin romanê jî û çend teknîkên nû yên pêşkeftî derbasî nav dinyaya romanê bûn. Hinek romannivîsên navdar karîbûn meşaleya vê nûgeriyê hilgirin wek James Joyce, Marcel Proust û Virginia Woolf û çend romannivîsên din. Ji wan guherînên ku gihîştin teknîka nû ya romanê, binyata vegotina bûyerê jî di vegotina zincîreyî de guherî bo binyata têkilîhevku di sadetirîn pênase de ji berovajiya rêya yekem pêk dihat.

Evbinyat ango hêla vegotina bûyerê ji dema rabirdû bo niha naçe, lê berovajî wê romannivîs an vebêjer hewl dide zincîreya bûyeran têk bişkîne, yanî ji dema niha vedigere dema borî yan rabirdû û piştre vedigere û gav bo dahatû davêje yanî vebêjer pabendî ti hêleke demê nabe, bi arezûya xwe bi ser deman de baz dide, ev jî bala xwîner dikşîne ba xwe û xeyal û fantaziyekê diyarî vegotina bûyeran dike û nivîskar jî xwe wiha nîşan dide ku hewl daye teknîkeke nû ya vegotina bûyeran pêşkêş bike. Armanca sereke jî di vê de du xal in ku Dr. Celal Enwer di nameya mastera xwe de amaje pêkiriye "*Yekem matmayîn û meraqa xwîner, yanî xweşiya estetîkî li ba xwîner dirust dike, gava ji nişkê ve tûşî bûyerekê dibe, ku di rabirdû de rû daye yan pêşbîniya bûyerekê di dahatû de dike. Armanca duyem jî pêk tê ji wê bihaya babetî ku di çarçoveya pêwireke lojîkî ya estetîkî, li derveyî pêwira dîrokî ya rêzbûna bûyeran şêweyên binyatê parçe dike, da roman şêweya belgenameyeke dîrokî ya abstrakt wernegire, derbarê rabirdûyeke qediyayî, belkî di çarçoveya rêbazeke dîrokîde dibe, ku mecalê dide xwîner, (nihaya vekirî) şîrove bike.*"[217] Ev cureya bikaranîna vegotina bûyerê wek di beşê

[216] Jan Dost, *Mîrname*, r. 20.
[217] Se'îd, *Teknîka Vegotinê*, r. 17-18.

duyem de me amaje pêda zêdetir bi rêya herdu teknîkên dema vegotinê dibe ku vegerandin û pêşxistin bûn. Bikaranîna vê cureya vegotina bûyerê qet bandorê li ser binyata metinê romanê nake lê alîkariyê dike di ciwankirina metinê romanê û pêşvebirina romana nû de. Bikaranîna binyata têkilîhevdiyartirîn sîmayên nûbûna binyata bûyerê ye ku nivîskar guhdaneke mezin pê didin.

Wek me berê jî behs kir, binyata têkilîhev di romana Mîrname de, bi pileya yekem hatiye bikaranîn, tê de her yek ji vebêjeran ji bo vegotina bûyeran dema niha ya vegotinê ku dema piştî mirina Xanî ye radigrin û vedigerin bo rabirdû, berî koça Şêx Ehmedê Xanî, tew hinek vebêjer vedigerin rabirdûyeke dûr beriya jidayikbûna Xanî jî, vêca ev şêwaza ragirtina dema niha û vegerandina bo rabirdû binyata têkilîhevdirust dike.

Wek mînak eger em binerin Mela Salihê Cizîrî, di dema vegotina bûyeran de dema niha radigre û vedigere zemanekî dûr ji dema niha beriya ku Xanî koça dawî bike, gava Xanî li Cizîrêfeqe bû û li Cizîrê Xanî bi mebesta fêrbûna serf û nehû û zanista beyan û rewanbêjiya erebî hatiye Cizîrê, û vebêjer behsa pêwendiya xwe û rehmetî dike li wê mizgefta ku ders lê dixwendin û waneyên wan ezber dikirin, bi vê şêweyê berdewam dike ku çawa rojên înan diçûn ser mezarê Melayê Cizîrî û çawa bi şevan heta sibehê guh li dengê feqe Xelîlê Sêrtî digirtin. Piştî ku vebêjer behsa wê yekê dike ku Xanî salek li Cizîrê xilas kir û piştre vegeriyaye Bayezîdê. Ev mijar hemû di rabirdû de ne, dûre behsa xwe dike gava hatiye Bayezîdê û niştecî bûye, bi rêya derbirîna hevokekê ku dibêje Ev bû pazdeh sal ez li Bayezîdê dijîm, ev hevok di dema niha de ye û piştî vê hevokê jî vebêjer careke din vedigere rabirdû û dest bi vegotina bûyeran dike û dibêje: "*Dema min ji Cizîrê berê xwe da Serhedan, hîn mîr Evdî li jiyanê bû û rehmetiyê Xanî Mem û Zîna xwe neqedandibû. Ew debîrê dîwana mîr û munşiyê name û fermanên wî bû. Ku dît min û zarokên xwe me koçî Bazîdê kiriye kêfa wî gelekî hat. Tê bîra min dema nimêja nîvroyê li camiya xwe xelas kir û silav da û piştî tesbîhan li pişt xwe zîvirî ez dîtim. Hema rabû û hat ez hemêz kirim. Di gel ku sal gelek derbasbûbûn jî wî ez di cih de naskirim û got:*

*- Mele Salih tu û welatê Serhedan?*

*Min gotê ku Cizîr nema Cizîra berê ye, qedrê ilim lê nemaye û min jî xwe li Bazîdê û şewq û şemala alimên wê girtiye. Kenîya, destê min bi dilovanî guvaşt û got:*"[218]

Herwiha vebêjerekî din ku Şêx Seyfedînê Cibeşîn e, ev vebêjer jî wek hemû vebêjerên din di dema vegotina bûyeran de dema niha radigre û vedigere rabirdû û behsa wê yekê dike ku rehmetiyê Ehmedê Xanî aciz bûye û digot divê Mîrza Begê kurê Mîr Mihemed li şûna mîrê niha rûne. Herwiha li şûneke din vebêjer dibêje Mîr daxwaz ji min kiriye ku Xanî bêdîwanxaneya min, lê Xanî her carê bi hêncetekê nedihat, dûre vebêjer vedigere dema niha û dibêje: "*Vê mersiyeya Xanî ji mîr Mihemmed re ku leqeba wî kiribû padişahê Serhedan, û di eynî demê de medhiyeya ji Mîrza re dilê mîrê me Evdilfetah ji Xanî zêde sar kiribû.*
*Ji wê rojê de êdî Xanî jî sar bû û kêm dihate meclisa mîr. Mîr jî bala xwe dabû sarbûna rehmetî, çend carî ji min re got ku ez naxwazim yekî alim mîna Ehmedê Xanî dûrî dîwana min be. Û ez teklîf dikirim da ku wî dawetî dîwanê bikim lê her carê wî behaneyek ji hûçikê cubbeyê xwe derdixist û nedihat.*
*Niha jî ku Xanî ji darulfena koçî darulbeqayê kir, mîrê me hate rehmê û mesrefa xusl û kefenkirin û definkirin û nanê matemîyan û mêvanên ku dê ji welatan werin hemî dabû ser milê xwe. Hema deh û du aqçeyên zîvîn ji bo xwendina telqînê dane min tenê.*"[219]

Careke din jî vebêjer vedigere rabirdû û behsa şêxatiya xwe dike. Ev bazdana bi ser demê de, veger e ji niha ve ber bi rabirdû li ba hemû vebêjeran hest pê tê kirin.

### 4.2.3. Binyata Hevterîb (Paralel)

Piştî derketina binyata têkilîhev di romanê de binyateke din jî derket holê ku ji binyata hevterîb paralel pêk tê. Li gor xwendina me bo vê binyatê rexnegirû nivîskaran du curên binyatên hevterîb paraleldestnîşan dikin, ew jî:

---

[218]Jan Dost, *Mîrname*, r. 152.
[219]Jan Dost, *Mîrname,* r. 132.

### 4.2.3.1. Hevterîbî Di Hîkayetê De

"*Ev ciwantirîn cur e, kubi vegotina beşekî çîrokê radibe, piştre beşekî din ê çîrokeke din, em dikarin bêjin ku di vê şêwazê de du çîrok tên vegotin.*"[220] Ango nîşandana du hîkayetan an zêdetir di romanan çîrokekê de ku bûyerên wan di yek demê de rû didin "*Vegotina bûyerê di vê rêçikê de ji hêla hîkayetxwên girêdayî demê ye, çimkî di vê şêweyê de bûyerên romanê dabeşî ser çend birran dibin ku ligel dema rûdana wan hevterîb dibin, lê cihê rûdana wan heta radeyekê ji hevdu dûr dibe.*"[221] "*Yan vegotina du çîrokan an zêdetir ku bûyerên wan di du demên hevterîb de rû didin, û wek yek ji binyatên bilind û ciwan tê hejmartin, ku bikaranîna wê jêhatîbûneke hunerî ya bilind divê. Li gor Todorov,vê binyatê her pêwendiyekligel hîkayeta serzarekî vebirrandiye, ku bi ti hawî binyata hevterîbî tê de nehatiye bikaranîn*."[222]

Tiştê ku li vir eşkere ye ew e ku ev hevterîbîbûn girêdayî çendîtiya hîkayetê ye, wek mînak di romanekê de romannivîs ji me re behsa du hîkayetan an zêdetir dike ku di yek demê de rû dane ango ji me re behsa du bûyeran an zêdetir dike ku di yek demê de rû dane, lê ne merc e cihê wan her du bûyeran weke hev be, "*vebêjer bi dorê beşekî ji çîroka yekem vedibêje, dûre ji vegotina wê radiweste û dest bi vegotina çîroka duyem dike, piştre ji vegotina wê jî radiweste û beşekî ji çîroka sêyem vedibêje heta digihe dawî*."[223]

"*Bi baweriya rexnegiran ev rêçik yek e ji binyatên nû, sûd ji hunera montaja sînemayî wergirtiye çimkî di sînemayê de ti dîmenek nikare heta demeke dirêj berdewam be, lê vegotina fîlm pişta xwe bi tewlîfê girêdide di navbera girteyên cuda di dîmenên cuda de*."[224]Ev cureya binyatê kêmtir di çîrokê de xuya dibe, bêhtir ji ber mezinî û pirbûna bûyerên wê, ev binyat di romanê de tê dîtin, heta niha jî li gor rexnegiran wek ciwantirîn cureya vegotinabûyeran tê hejmartin "*Lewma gotine binyata paralel hevterîb ji hemû binyatên din bi heybetir û ciwantir e*."[225]

---

[220]el-'Anî, Şuca' Muslîm, *el-Bîna' el-Fenî Fî er-Rîwaye el-'Erebîye Fî el-'Iraq*, Dar el-Şun el-Seqafîye el-'Ame, Bexdad 1994, r. 34.
[221]Mistefa *, Binyata Cureyên Bûyerê ,* r. 133.
[222]Se'îd*, Teknîka Vegotinê*, r. 20.
[223]Mihemed, *Binyata Bûyerê*, r. 107.
[224]Mistefa, *Binyata Cureyên Bûyerê*, r. 133.
[225]Muftî, *Vegotin Di Çîrokên (Ehmed Mihemed Îsmaîl) de*, r. 76.

### 4.2.3.2. Hevterîbî Di Vebêjer De

Ev cureya hevterîbîbûnê girêdayî çendîtiya vebêjer e bêhtirî ku girêdayî çendîtiya bûyerê be. Di vê cureyê de, dibe ku bûyer yek bûyer be, lê çend karakter bi erkê vegotina wê radibin û behsa bûyerê dikin. Lewra li vir girêdaneke dirust bi diyardeya pirdengiyê di romanê de derdikeve holê, ango bêhtirî vebêjerekî bi karê vegotinê radibin "*Asta estîtekî ya vê binyatê, ji binyata hevterîbî ya bûyerê nizmtir e*."[226]

Li gor têgihîştin û xwendina me ji romana Mîrname re, tenê di beşê vebêjeriya Mîr de, di dawiya vegotina wî de em hest bi hebûna binyata hevterîb dikin. Yanî hevterîbî di hîkayetê de. Ew jî ew e gava Mîr ji me re behsa du bûyeran di yek dema vegotinê de dike. Bûyera yekem ji me re behsa wê rojê dike ku yekemîn roja meha Remezanê bû ku li ser pişta şehên a xwe çûye nêçîrê li berpala çiyayê Agirî heta êvarê berî roj here ava li wir maye û sê kevok û du kîvroşik nêçîr kiriye, bi vê şêweyê bûyera yekem vedibêje û dawî lê tîne û dibêje: "*Wê sibeha yekê remezanê ku baran hûrik hûrik dibariya çûme nêçîrê. Ez li ser pişta Şahînê xwe bûm û Şihabê minî awirtîr li ser zenda minî bi desbendeke ji çermê gamêşanî ku ermûşekî Şîrazî yê spî lê gerandî bi aramî veniştî bû. Iskofa li ser herdu çavên wî ew bêdeng kiribû û paçebenda di lingan de ew bi zenda min ve girêda bû. xulam û pîşekar û qaweçîyê min jî li ser mehînên xwe bûn û li rex û pê min diçûn.*

*Her carê Şihabê min per û balên xwe vedigirtin mîna ku dixwaze bifire. Min dizanîbû ne rojeke baş e ji bo nêçîrê lê dîsa jî min şikarî hemî bi xwe re biribûn heta bi seg û tajîtolan û xwarin û vexwarinê. Min dixwest heta fitaran li wir bim û bihêlim hinekî bîna bazê xwe yê ku bûbû mehek nefiriyabû vekim. Bazê min ku li mal girêdayî dimîne bînteng dibe û dike firtefirt û hema çeng û balên xwe li hev dide û tê ku perîkên xwe hemûyan ji kerban re birûçikîne.*

*Esrê teng hîn roj neçûbû ava, bazê min sê kevok ji min re anîne xwarê û hê jî li ezmanê ewrgirtî hêlan dikir û çav li nêçîran bû. du kîvroşkên têrgoşt jî dane ber pencên xwe û li ber nigê min danîn. Kêfa min û bazê min bûbû yek lê baranê nehişt em kêfa xwe bibin serî.*"[227]

Piştre vebêjer Mîr ji me re behsa bûyera duyem dike ku di dema nêçîrê de hest kiriye baran dibare û baran jî reş e yanî vebêjer behsa bûyera barîna mirekeb (hibirê) dike, herçiqasî

---

[226]Se'îd, *Teknîka Vegotinê*, r. 22.
[227]Jan Dost,*Mîrname*, r. 213-214.

bi eşkereyî behsa wê yekê nake ku bêje ximav dibare û ji ber xweşiya wê rojê zêde guh pê nade lê dibêje: min li nerîna hevrîşmî ya destbenda xwe nerî, bi baranê reş bûbû wek dilopên qetranî bi serde bin wiha bû, divê em wê jî bizanin ku bûyera barîna mirekebê hibirê giraniyeke wê ya mezin heye di nav romanê de bûyereke girîng e jî Mîr jî wek her vebêjerekî din ji nerîngeha xwe li vê bûyerê dinere û dibêje: "*Carekê min bala xwe dayê ku ermûşê li desbenda mina çermîn gerandî weke ku peşkên qetranê lê bikevin reş dibe. Çi bû nizanim lê wisa xuya dikir ku baraneke reş dibariya. Ji sibehê de dibariya min jî ji kêfa bazê xwe re hay jê nebû.*"[228]Lewra vegotina van her du bûyeran bi paralel hevterîbî,binyata hevterîbî dirust kiriye.

### 4.2.4. Binyata Têhelkêş (Hêwirandin)

Cureyeke nû ye di binyata vegotina bûyerê de, tê de romannivîs bi mebesta ciwankirina romana xwe li ba xwîner bikar tîne, da bi vê rêyê xwîner metinê bi siruşta cîhana metinê ve girêbide û ev cureya binyatê "*têhelkêşkirina hêwirandinaçîrokekê ye di nav çîrokeke din de yan têhelkêşkirina çend bûyerên cuda ye di heman romanê de, bêyî liberçavgirtina zincîreya bidûhevhatina rasteqîn a bûyeran di aliyê demê de.*"[229] Ango li vir gava bûyerek di nav romanê de tê vegotin, ku bûyera sereke ya romanê mebesta me ye li kêleka vê bûyera sereke, romannivîs bi mebesta ciwankirina romana xwe yan her hoyeke din be, bûyereke din a nesereke yan çîrokeke din an serpêhatiyeke din têkilî bûyera sereke ya romanê dike. Li vir bê ku guh bide aliyê zincîreya demê di warê bidûhevhatinê de. Piraniya rexnegiran di têhelkêşkirina babetekê di nav romanê de, vê binyatê di du astan de dibînin:

"*1. Asta hîkayetê: Di vê astê de hîkayeta têhelkêşkirî dibe mînakeke biçûk a hîkayeta sereke.*

*2. Asta vegotinê: Vegotina hîkayeta sereke tê vebirrîn ji bo vegotina hîkayeta têhelkêşkirî.*"[230]

Ango di asta yekem de gava vebêjer ji me re behsa hîkayeta sereke dike, bêyî ku vê hîkayeta sereke vebirre, yekser tê ser behskirina hîkayeteke din. Bêguman di vê astê de ev hîkayeta ku tê têhelkêşkirin, bi piranî nêzîk e ji hîkayeta sereke û bo piştrastkirina hîkayeta

---

[228]Jan Dost, *Mîrname*, r. 214.
[229]Mihemed, *Binyata Bûyerê*, r. 86.
[230]Mihemed, *Binyata Bûyerê*, r. 89.

sereke tê bikaranîn. Lê di asta duyem de, vebêjer hîkayeta sereke vedibire û dest bi vegotina hîkayeteke din a têhelkêşkirî hêwirandî dike.

Di edebiyata kurdî de, pir caran edîb û nivîskar bi rengekî giştî edebiyatê li ser helbest û pexşanê dabeş dikin, lê ji ber peydabûna zêde ya janrên edebî yên din wek helbest, çîrok, roman, şano, sînema …..hwd em hest dikin sînorê navbera janrên edebî ber bi qelsî û lawaziyê çûye, lewra piraniya rexnegiran di bikaranîna binyata têhelkêşkirina bûyerê de tenê behsa têhelkêşa çîrokê di nav romanê de yan çîrokê di nav çîrokê de nakin lê gelek babetên din jî têhelkêşî nav romanê tên kirin, mebest jî ji vê ew e "*Regezeke din a edebî biguhêzin nav romanê, îcar regeza mezin an hûr be wek: hîkayeta gelêrî û folklorî, efsane, dastan, şiîr, gotinên pêşiyan, şanogerî, gername, çîrokên nûçeyan di rojnameyan de….hwd.*"[231] Anîna van regezan di nav metinê romanê de bi çend şêweyan dibe "*Yan amaje bi navê nivîskar an xwediyê metinê tê kirin, îcar çi bi navanîna wî be di nav metinê de yan di jêrnot û dawiya romanê de be wek têbînî yan malikeke şiîrê ya navdar, teksteke naskirî, pend û gotinên pêşiyan û cureyên folklorê tîne ku xelk wan nas dike, pir caran sûd ji çîrokên Quranê werdigre û bi şêweyeke edebî destkariya wan tê kirin. Ev hemû romannivîs wan bi miqateyî dike û mebest jê estetîk kirina tekstê ye.*"[232]

Mebest ji bikaranîna vê cureya binyatê di romanê de ne tenê nîşandana aliyê estetîkî yê tekstê ye, lê rengîniyekê jî diyarî romanê dike. Ji hertiştî girîngtir wiha li xwîner dike ku ji xwendina romanê bêzar nebe, çimkî xwîner di vê cureya binyatê de tenê rûbirûyî xwendina yek regezê nabe di romanê de, dibe ku pendek, şiîrekê, çîrokekê….hwd bixwîne, herwiha ev cureya binyatê bi roleke girîng di dirustkirina romanê de radibe ku dibe sedem ku romannivîs di peydakirina keresteyên din bo romannivîsiyê şehreza be da romanê ciwantir biafirîne.

Di romana Mîrname de, Jan Dost tenê regeza çîrokê têhelkêşî romanê nekiriye, lê şiîr û pir caran ayet û hedîsên pêxember s.x.l û herwiha name û babet û karesatên dîrokî jî bi şêweyeke estetîkî ya ciwan li ser herdu astên hîkayet û vegotinê têhelkêşî romanê kiriye. Wek mînak:

---

231 Mentik, *Teknîka pirdengiyê*, r. 259.
232 Mentik, *Teknîka pirdengiyê*, r. 259.

Têhelkêşkirina çîrokê di romanê de:Selîmê Nalbend wek vebêjerekî li tenişta vegotina hîkayeta sereke ya romanê sê çîrok têhelkêşî romanê kirine, vebêjer berî têhelkêşkirina çîrokan bixwe amaje bi wê yekê dike û dibêje:"*Xelq berî ji min û şêweyê nalkirina min hez bikin ji suhbeta min û çîrokên min hez dikin. Heta ku heywana yekî nal dikim du sê mesel û çîrokan jê re dibêjim. Kêfa xelqê ji çîrokên min re tê. Ê ku hespa wî nalkirî be jî tê li ba min dimîne û guhdarîya qissetên min dike.*

*Ji xwe mîrê me!! Ku êvarên înan qawe tê danîn û civata wî ji bo şevbuhêrkê digere , min li hêla xwe ya rastê dide rûniştandin û dibêje:*

*- Ha Silo! De ka çavên vê şeva me bi hikayetên xwe kil bike.*"[233]Piştî vê yekê dest bi vegotina çîrokên têhelkêşkirî dike ku ji sê çîrokên Nalbend pêk tên, bi vî rengî:

Nalbend û gundî: *"Carekê gundiyek hate bajarekî. Wî kera xwe anîbû da ku nal bike. Nalbend nalek rakir û hat ku bi simê kerê ve mîx bike, gundîyê ji xwe razî got:*

*- Ka hela binêrim.*

*Û ew nala hesinî bi destê xwe tewand û bi payebûn got:*

*- Yeke din. Ev bi kêrî kera min nayê.*

*Nalbend naleke din anî, dîsa ê gundî ew di nav destê xwe de weke hevîrekî tewand û dîsa got:*

*- Ev jî ji kera minî delal re nab e.*

*Vê carê nalbendê bajarî kerribî û naleke stûr anî da destê xwediyê kerê. Gundî çend carî kir û nekir nikarîbû nalê bitewîne, mecbûr stûyê xwe xwar kir û got:*

*- A ev li gora kera min e.*

*Nalbendê ku ruhê wî heta ber devê wî hatibû, bêdeng simên wê kerê terişandin û mevred kirin û çar nalên stûr bi wan ve kutandin. Gundî jî ji navbenda xwe aqçeyek derxist û da destê nalbend. Nalbend jî aqçe di nav tiliyên xwe de firkandin û sûretê li ser mihand û gote ê gundî:*

*- Ev aqçeyê te dexel e.*

*Gundîyê behetî, rabû aqçeyekî din derxist û da destê wî. Ew jî wisa bû. û bi wî rengî nalbend çend aqçe bê sûret hiştin û heyfa xwe jê hilanî û gotê:*

*- Eger ji te re gotibin tu dikarî bi nalbendan bikenî ji bîr bike. Em nalbendin bavo heyran. Em dikarin kevjalan jî nal bikin.*"[234]

---

[233]Jan Dost,*Mîrname*, r. 175.

Malê helal:"*Dibêjin nalbendek di zemanê Şahsiwarê pisyanî de li Bazîdê hebû pirr jîr bû. pereyên wî jî zehf bûn lê tu kesî nizanîbû ew wan di ku de vedişêre.*
*Wî ku heqê nalkirina xwe ji siwarekî yan kesekî din digirt, di kurtanekî kevnî kerê xwe de vedişart lê çavên tu kesî pê nediketin. Bi wî awayî û bi salan gelek pere di kurtanê kerê de kombûbûn. Rojekê ew ne li nalxaneyê bû û kurê xwe li şûna xwe danîbû. Koçerek hat û çav li wî kurtanî ket. Ji kurik re got:*
*- Ma tu vî kurtanî nafroşî!!*
*Kêfa lêwik hat û got erê çawa nafroşim. Bi çi ne bi çi? Dawiyê li hev kirin û ê gundî him kera xwe nal kir û him jî kurtanê tijî pere bi xwe re bir.*
*Çawa bavê wî hat dît ku kurtan ne li cihê xwe ye. Kuro ka kurtan! Wî bi kerb ji kurik pirsî.*
*Kurik jî di fikra wî de tiştekî baş kiriye, bi kêf gote bavê xwe:*
*- Wîîîî bavo! Min ji bîr kir bibêjim, ma ne min ew firot û em jê xelas bûn.*
*Bavê wî kire hawar û bi ser de qêrîya:*
*- Wey kerê ji keran, wey agir bi cilê te ketî qantirê bê nal! Ma ne divê ez te li dewsa keran nal bikim ha!! Te keda minî bi salan bertelef kir.*
*Û bi tepan bi serê xwe ket û hat ku kurê xwe bi simteraşê bikuje.*
*Lê çi bike, weke dibêjin tiştê çû nede dû! Wî çiqasî da dû jî, tiştek hasil nekir. Keda wî ya salan ku aqçe li ser aqçeyê datanî, hemî di kêlîkekê de û ji ber kerîtiya kurê wî badihewa çû.*
*Nalbendê reben ji bêgavî stûyê xwe xwar kir û vegeriya karê xwe. Û dîsa çend sal çûn heta rojekê ji rojan siwarek derbasî ba wî bû û piştî silavê gotê:*
*- Min berî çend salekî ev kurtan ji ba we kirî, ew yê kera ye, niha ez bûme xwedî hesp û haceta min pê nema ye, ma ez dikarim vegerînim?*
*Nalbend ji kêfan re firîya û hat ewê koçer hemêz kir û ramûsand û gotê:*
*- Wey malava çawa nikarî? Were ez kurê xwe li şûna vî kurtanî bidim te!*
*Ê koçer qeherî û got:*
*- Na bavo na, çî min û kurê te! Deh kurê min hene xwedê wan bihêle têra min û jiyê min hemûyî dikin. Zîneke hespan li ba te hebe li şûnê bide min.*
*Nalbend ji guhê xwe bawer nekir û bi lez rabû zîna hespa xwe anî û dayê û got:*
*- Malê helal naçe, malê helal naçe.*

---

[234]Jan Dost,*Mîrname*, r. 175-176.

*Wê şevê nalbend neket xew. Kurtanê wî li ber serê wî bû û pereyên xwe dihejmartin. Mîna zikrê sofîyan her digot:*
*- Malê helal nçe , malê helal naçe. Û ji wê rojê de ew kurtan bû palgeha bin serê wî.*"[235]

Nalbend û Sedrê Eizem: *"Li Stenbolê, Stenbola qesr û serayên mezin sadriazemek hebû kêfa wî gelekî ji lîstika şetrencê re dihat. Ew zêde şareza bû û şev nediçû bêyî ku di qesra mezin de bi xundkar re bilîze. Şevê destek du dest bi sultanê mezin re dilîstin. Carekê sultan çûbû herba Mecerisatnê û ew ji bo tedbîra memleketê li şûna xwe hiştibû. Şevekê weke ku jê re bûbû kurm û adet dîsa xwest bilîze, lê kesek nebû. Hema qûlekî xwe şande ba nalbend û meyterê xwe û ew anî li ber xwe danî. Ewwil jê pirsî:*
*- Ma tu bi hespan dizanî!!*
*Meyterê reben ku nû ji xew rabûbû bi tirs got:*
*- Erê cenabê sadriazem ma ne ez nalbendê hespên cenabê te me!!*
*- Kuro ne hespên hesp! Ez çê li hespên şetrencê dikim, tu bi şetrencê dizanî?*
*Nalbendê ku piçekî zanîbû bilîsta gotê:*
*- Erê efendim dizanim.*
*Û dest pêkirin lîstin. Sadriazem mîna ku jê re bûye adet xwest yê himber wî bilîze, rabû ji wî re got:*
*- Padşahim kerem bikin hûn dest pê bikin.*
*Devê nalbendê reben çû pişt guhê wî û ji guhê xwe bawer nekir. Di dilê xwe de got: ev wezîr dîn bûye. yan jî henek û laqirdiyan dike.*
*Wî nema zanîbû çi bike û kîjan kevirî bileqîne. Hema peyadeyek da pêş û dîsa bêdeng, lê tirsiyayî ma. Wezîrê mezin jî peyadeyekî xwe danî pêşiya peyadeyê wî û li hêvîya wî me. Nalbendê kercilî ku êdî bala wî ne li ser lîstikê bû, bûbû xifşekî xezalan ku nema zanîbû çawa ji wê fetrakê derkeve. Wî qet di xewnan de jî nedîtibû ku solên sadrîazam li ber lingê wî rast dike. Rûmeta wî ya herî mezin ew bû simên hespan bixeritîne û wan nal bike. Îcar tew li himber wî li ser doşekên tijî perîkê quling û qazan rûne û şetrencê bilîze, bi ser de jî jê re Padşahim bête gotin!! Ew heyirî bû. Hema çavên wî di çarkoşeya belek ya bi hesp û fîl û ferzîn û peyadeyên ji dur û yaqûtên zîvkirî xemilandî de dinêrî û newêrîbû çavên xwe hilde jor*

---
[235] Jan Dost, *Mîrname*, r. 176-177.

*û li rûyê sadrîazem binêre. Qederekî bêdeng ma. Dixwest kêlîkekê berî kêlîkekê Sedriazam şahê wî kiş bike û gotina Mat bibêje. Lê dîsa sadriazem bi stûxarî gotê:*

*- Padşahê min! ez xulam eger dilê cenabê we û lîstikê nîne ez rakim!!*

*Vê carê nalbendê tirsiyayî hinekî dilê xwe xurt kir û got:*

*- Ez….ez….ez xulam. Ez bendeyê we û sayis û nalbendê hespên cenabê we me. Ez xizmetkarê hespanim. Ez ne padşahim ezxulam. Ez axa bin nigê te û padşahim.*

*Îca sadriazam serê xwe rakir û kenîya û got:*

*- Ez jî dizanim, lê ji ber ku lîstika min tim bi padşah re ye, divê ez fêrî navê wî tenê bibim, divê tenê xitaba wî bi hurmet bikim. Bêedebiya di huzûra padşahan de buhayê wê serê mirovane ha!* "[236]

Têhelkêşkirina dastanê di romanê de: Vebêjer mînaka dastana Keleha Dimdimê ji me re vedibêje û têhelkêşî bûyerên romanê dike, bi vî rengî: "*Pir kesan ku nas dikirin navê min Dosto ye, dipirsîn: goya ku navê te, navê Ecemane!! Te ji ku anîye ev nav? Heta carekê rehmetîyê Xanî jî êvarekê pirsî: mamê Dosto! ma ev navê te bav û dêya te li te kirine?*

*Navê min Dostoy e. Ne diya min û ne jî bavê min ev nav li min kirine. Pîrka mina kezebşewitî ev nav li min kir. Ew navê kurê wê bû, yanî navê apê min bû. Li gor ku min ji devê wê bihîst, ew xortekî felît û nûhatî, ciwan û wêrek û xweşmêrekî kela Dimdimê bû. Bi gotina wê, ew weke gurê yekane bû. Hîn beriya ku sipahê Şah Ebbas kelê biruxînin û dest bi qetliama Mukriyan bikin, apê min Dosto keçek ji kelê ku navê wê Sînem bû, hebandibû û bi pismamên wê re ketibû şer û kişmekişê. Serencama şerê wî û pismaman kuştina sê heban ji wan bû. Pismamê mezin Şêrkoyê ku di rêya Sînemê de bû, sond xwaribû ku dê ew Dosto li ku bibîne bikuje. Heta ku xwe bi perdeyên Kabeyê ve girtibe û di ser nimêjê de be jî ewê sonda xwe li erdê nexîne!*

*Pîrka min digot: ku ew û kalkê min ê nexweş, piştî kuştina hersê pismaman û windabûna kurê wê yê bi tenê Dosto, ji tirsa tolhilanînê bi şev ji kelê revîyan û berê xwe dane bakur heta ku pêrgî kurê xwe bûn.*

*Ji serma kalkê min mir û zarokek di zikê pîrka min a ku nêzîka çil û pênc salan kiribû de hişt.*

---

[236]Jan Dost,*Mîrname*, r. 178-179.

*Pîrka min hercarê ku têr girîyê xwe dikir, bi hûçikên xwe firmêskên xwe dimaliştin, dikenîya û digot: berxikê min! te dît bê bapîrê te çi mêr bû!! di zikê pîreke weke min de zaroka xwe çand û çû.*

*Dema ku eceman êrîşî kelê kirin, apê min Dosto xatir ji diya xwe xwest û berê xwe da hêşetê û tev li siwarên xanê Lepzêrîn şerê eceman kir.*

*Di nava agirê şer de apê min û pismamê Sînemê yê mezin Şêrkoyê birayê hersê kuştiyan di halekî xirab de çav li Dosto dikeve. Rimbazekî eceman erd li apê min teng kiribû û dixwest wî bikuje, lê Şêrko ji xîret û te`essuba ´eşîrî dibe piştevanê apê min û di ber wî de tê kuştin. Apê min jî li rex wî bi rima wî rimbazê eceman ji ser hespa xwe tê xwarê û ew jî tê kuştin.*

*Dema pîrka min ev serpêhatî digot, bi dengekî şewat û giriyekî tehl weke ku herdu li ber çavên wê hatibin kuştin, digot.*

*Pîrka min piştî demekê ku bihîstibû kes ji kelê nemaye berê xwe dabû wir û termê kurê xwe, yanî apê min Dosto û termê Şêrko di hembêza hev de dîtibûn.*

*Ew tirsiyabû ku wan hevdu kuştibin, lê kalemêrekî Biradostî ji bermayên şûr ku ji qetliamê filitîbû, jê re gotibû ku herdu jî bi rima yekî ji eceman hatine kuştin.*

*Piştî şikestina Mîrxanê Lepzêrîn ê ku qizilbaşên sitemkar navê wî kiribûn Emîrxanê Çolaq û kuştina bi hezaran şênî û çekdarên kelavanî, şah dest bi qetliameke mezin kir. Xan û mîr û mezinên mukriyan dawetî ba xwe li nêzîkî kela Gawdolê kirin û ew dane ber şûrê kîna xwe û hemî di seraperdeya xwe de bi destê Qizilbaşên kînewer kuştin. Di wan heyaman de bavê min çêbû û diya min navê Mîrxan lê kir. Wê dixwest navê kurê xwe Dosto lê bike, lê ji tirsa ku qedera wî jî weke ya birayê wî be navê wî Mîrxan danî û di nava Mukrîyan de bi navê Mîrxanê pîrê hate naskirin.*

*Pîrka mina kezebşewitî û dilperitî vegeriyabû nêzîkî kelê, gora kurê xwe nîşan kiribû û sûretê xencerekê li ser kêlegora wî û ya Şêrko rewêjtibû.*

*Ew digirîya û wê dibiland: berxê min, ez çendî li gora Sînemê jî geriyam min şopa wê nedît. Nizanim bi ku de çûbû! Min dixwest şehekî û kildankekê li ser kêla serê wê bi rewîjekê bineqişînim lê ax ji wan qizilbaşên dirrinde û dilreş re, heta afretên me yên kuştî jî ji wan û bênamûsiya wan xelas nebûbûn. Ma wê ahên me ji wan re bimînin qey?*

*Şah Ebbas zalim bû lawo. Sitemkarekî zemanê xwe bû, heta zarokên wî jî ji zulm û zora wî nefilitîn. Kurekî xwe kuşt û çavên du kurên xwe jî rijandin. Heramazade û bêîmanek bû, Esfehan*
*kiribû kerxaneyeke mezin û bi hezaran rûspêyên gurcî û ermenî servekirî di kolanan re diçûn û dihatin, lê keç û bûkên me xwe bi saxî nedane dest wan bêbav û rezîlan. Hemiyan ji ser dîwarên kelê xwe avêtin gelîyên kûr, hinan jehr xwarin û hinan jî bi xencer û şûrên mêr û birayên xwe yên kuştî, xwe jî kuştin. Çi ji te re bibêjim û çi nebêjim berxê min. tiştê ku hate serê mukrîyan, neyê serê gurê çiyan.*"[237]

Têhelkêşkirina helbestê di romanê de:Mîrza Sebrî di beşê vegotina xwe de, gilî li Ehmedê Xanî dike, bi wê yekê ku Mîr ê me ev hemû qencî bi Xanî kiriye, lê Xanî bêwefa û nankor bû û di kitêba xwe Mem û Zînde bi şiîrê mîrê me yê berê şûştiye, di vî warî de gotiye:

"*Lewra ku ewî nekir pesende*
*B`esl û neseba xwe ew Rewend e!!*"[238]

Herwiha Recebê Terzî di beşê vegotina xwe de behsa nasîna kurekî kor ê Burseyî dike, ku çawa carcaran hinekî ji kitêba Mesnewî Mewlana Romî ji wan re dixwendin, amaje dide şiîreke Mewlanayê Romî û dibêje:

"*Sehli şîrî dan ki sefha bişkined*
*Şîri an est, an ki xodra bişkined*"[239]

Têhelkêşkirina ayetan di romanê de: Hacî Zuhdiyê Bazirgan behsa hejariya Ehmedê Xanî dike û bawer dike ku Xanî pere nedixwestin û dibêje: ew benîademekî dijminê rizqê xwe bû û tew wê dema ku nivîskarê dîwana Mîr bû, guh nedida malê dinyayê û tiştek jê kom nedikir, êdî ez çawa keça xwe bidim mirovekî dîn û eger yek pereyên wî nebin, ne hêjayî tiştekî ye, îcar bila hemû zanista dinyayê di sînga wî de be, kê keça xwe dide mirovekî hejar? Li vir vebêjer bi nerasterast di dema axaftina xwe de amaje dide ayeteke Xwedayê mezin û dibêje Xwedayê mezin gotiye: Mal zîneta heyatê ye, mebesta vebêjer ev ayeta Xwedayê mezin e ku dibêje "*el-Malû wel benûn zînet el heyat el dunya*"[240] Raveya metinê bi vî rengî ye "*Mal û*

[237]Jan Dost, *Mîrname*, r. 91-93.
[238]Jan Dost, *Mîrname*, r. 81.
[239]Jan Dost,*Mîrname*, r. 110.
[240]*el-Qran el-Kerîm.*

*saman û zarok ciwanî û xemleke demkî ya dinyayê ne, lewra xwe zêde bi wan ve mijûl nekin*."[241]

Têhelkêşkirina pendan di romanê de:Buharî di nav vegotina xwe de amaje dide pendekê û dibêje Tiriyê li rezî, kesî nediziye, ev pend bo kesekî dibe ku bi ked û westana xwe tiştekî berhem bîne, ji kesî nedizîbe, dibêjin ew tişt yê wî kesî ye û bi keda xwe bidest xistiye jixwe tirî ji rezê kesî nediziye.

Herwiha dema kesek bixwaze ji cihekî biçûk sefer bike bo bajarekî mezin û berfireh, êdî li bajarê mezin jî bela jî zêdetir dibin Recebê Terzî piştî ku ji Bayezîdê bo Stenbolê sefer dike, tûşî bela û kambaxiyên zêde dibe, amaje dide pendekêû dibêje: "*Li bajarên mezin, belayên ku têne serê mirovan jî mezinin*"[242]

Têhelkêşkirina name di romanê de: Nameya Xanî bo Mîr bi roleke girîng radibe li ser rêveçûna bûyerên romanê bi taybetî binyata bûyerên romanê kiriye bazineyê vekirî, gava Mela Îsmaîlê Bayezîd nameya Xanî dixwîne, amaje dide wê yekê ku çawa bêhna hesretekê ji dilê Xanî diza, çawa xêzên xwe bilez û hêrs nivîsiye, çawa her tîpeke nameya wî nalînek jê dihat. Herwiha di nava wê nameyê de çend nihêniyên mezin hene derbarê plana kuştina Xanî tê de amaje bi mirekeb û jehr û navê karakterên kujerên Xanî wek Mîrza Sebrî û mirovê rûgirtî û behsa wê yekê dike ku jehrdarkirina min nexin stûyê kesî, ewê jehr ji min re danî naskirî ye, û wê yekê eşkere dike ku çend saetan berî mirina xwe ew name nivîsiye, tew dîroka nivîsandina nameyê jî. Têhelkêşkirina van regezên din ên edebî bo nav romana Mîrname, wiha li romanê kiriye ku rengîniyekê bide û xwîner ji xwendina romanê bêtaqet nebe.

### 4.2.5. Binyata Bazineyî

Yeke din e ji binyatên vegotina bûyerê ku, derketina wê di romanê de vedigere destpêka sedsala bîstan. Ev binyat pêk tê ji "*bûyer ji xalekê dest pê dikin û di dawî de jî vedigerin ser heman xala destpêkirinê, yan ji dawî ve dest pê dike û ber bi destpêkê tê û piştre*

[241]el-Mehdî, ‘Ebidallrezaq, *(Tefsîr el-Qirtbî)* Lî Ebî Ebidalle Mehemed Bin Ehmad el-Ensar el-Qirtbî, Dar el-Kîtab el-‘Erbî, Beyrut – Lubinan, Cld 9, 2008, r. 358.
[242]Jan Dost,*Mîrname*, r. 100.

*cardin diçe dawî.*"[243]"*Hokara navkirina wê bi bazineyî vedigere wê yekê ku binyata bûyeran bi şêweya bazineyî ye û herwiha xala dawî û destpêkê heman tişt e.*"[244]

Her çîrokek an romanek destpêk û dawiya wê heye, di bikaranîna vê binyatê de romannivîs ji me re behsa destpêka bûyerê dike heta digihe dawî, lê divê vegere destpêka bûyerê, çimkî eger tenê bi destpêkê dest pê kir û bi dawî dawî lê anî bêyî vegera bo destpêkê wê çaxê ev binyat dirust nabe, binyat dibe zincîreyî. Di bikaranîna vê binyatê de, ne merc e ku romannivîs tenê ji destpêkê ve dest pê bike, dibe ku di romanê de dawiya her bûyerekê destpêka vegotinê be, yanî romannivîs ji dawî ve dest pê bike û hino hino vedigere paş û piştre vedigere dawî. Ev cureya binyatê "*bêhtir di romanên polîsî û hîkayetên gelêrî de berçav dikevin, em dibînin her ji destpêka romanê ve, em rûbirûyî tawaneke kuştinê yan diziyeke mezin an her tawaneke din dibin, êdî ligel vebêjer an qehremanê romanê, em beşdarî lêgerîna li cîbicîkerê tawanê dibin. Tew ew hokar jî ji me re eşkere dibin ku li pişt pêkanîna tawanên ne.*"[245] Ango "*Yekem car encama kar tê nîşandan, dûre hokara rûdanê tê destnîşankirin. Vegotin vedigere xala destpêkê.*"[246]Bi baweriya lêkolînvanan "*Binyata bazineyî hingê delaleta xwe werdigre ku her bûyerek di romanê de di yek demê de destpêk û dawiya romanê pêk tîne bi wateyeke din, bûyereke diyarkirî di çarçoveya zincîreya bûyeran de pêwist e, ku di dawiya romanê de be, lê belê em dibînin di destpêkê de hatiye behskirin.*"[247] Bi baweriya piraniya rexnegiran, di bingeh de ev binyat her binyata zincîreyî ye, lê dariştina bûyerên wê bi şêweya bazineyî ye neku hêleke rast ji destpêkê heta dawî, ango "*ew bûyera ku divê di dawî de rû bide, di destpêkê de tê behskirin.*"[248]

Wek me berê behs kir, romana *Mîrname* di pileya yekem de binyateke têkilîhev e, rêjeya bikaranîna binyata bazineyî di romanê de di pileya duyem de ye, gava piraniya vebêjeran piştî veşartina Xanî û piştî barîna mirekebê hibirê dest bi axaftinê dikin, dûre vedigerin rabirdû û îcar têne ser heman xala destpêkirina bûyeran. Ev binyat bi eşkereyî li ba

[243]Mistefa, *Binyata Cureyên Bûyerê*, r. 138.
[244]el-Xefacî Ehmed Xelîl, *el-Mesteleh es-Serdî Fî en-Neqd el-Edebî el-'Erebî el-Hedîs*, Rîsale Macistîr, Camî'e Babil, Kliye et-Terbiye, Qism el-Luxe el-'Erebiye, 2003
, r. 264.
[245]Se'îd, *Teknîka Vegotinê*, r. 23.
[246]Muftî, *Vegotin Di Çîrokên (Ehmed Mihemed Îsmaîl) de*, r. 80.
[247]Mistefa, *Binyata Cureyên Bûyerê*, r. 138.
[248]Muftî, *Vegotin Di Çîrokên (Ehmed Mihemed Îsmaîl) de*, r. 81.

piraniya vebêjeran diyar e. Emê jî çend mînakan bînin, wek mînak vebêjer Buharî Şaîr bi vê yekê dest bi vegoyinê dike û dibêje: "*Dema ku min bihîst mele Ehmed miriye, berê min li dikana Selaheddînê sehhaf bû. Kitêba min Şêtê Bazîdî di destê min de bû û min dixwest ku Selaheddîn wê ji min re nesix bike da ku ez ji xwe re belav bikim û bifiroşim. Xelqê ew kitêba min ji destên hev revandibûn û êdî daneyek jî ji bo dermanan nedihate dîtin.*"[249]

Vebêjer di vê destpêkê de behsa mirina Xanî ji me re dike û îcar ji wir ve vebêjer vedigere paş û behsa xwe û Xanî dike û hin mijarên din vedibêje, di dawî de piştî axaftineke zêde di rabirdû de vedigere heman xala destpêkirinê ku roja mirina Xanî û barîna mirekebê hibirê ye û dibêje: "*Dema ku Xanî defin kirin û şêx Seyfeddînê cubbeşîn dest pê kir telqîna wî xwend, ez hinekî li dûr sekinî bûm û min li kitêba xwe dinêrî da ku ji xelqê we be ez quranê li ser ruhê rehmetî dixwînim!!*

*Lê bi qêrîna Teymûrê fasiq re ku hibr dibare, tirsa heft dizan bi hev re dawerivî dilê min û ez ziravqetî bûm.*

*Ji xwe berî wê, mele Salihê Cizîrî jî hatibû nik min û ez ji baranê tirsandibûm û di pey re bi rûyekî tehl ji ba min çûbû. Ez ditirsiyam ku Xanî berî mirina xwe jê re yan ji kesekî din re behsa hibra xwe ya windayî kiribe.*

*Dema min gotê : kitêba min ne bi hibrê hatiye nivîsandin.*

*Awireke xeşimgîn di min veda û berê xwe da darbesta ku di bin baranê de berî li gorê bû.*

*Ji roja ku min murekkebdank dizîbû , min xewnên tarî û reş didîtin. Te digot qey ew hibr hemû bi ser mejiyê min de rijiyaye û xewnên min reş kiriye. Bi rojan aveke reş bi devê min diket. Herçendî min av di devê xwe werdida û dişûşt jî, çare nebû. Min çi kir bêhavil bû. Min ji bêgavî berê xwe da zinarekî bilind li jora medreseya Muradiye û ew şûşe di kevirekî de lêxist. Hibra ku jê pekîya bû peşkên enberê û li ser wan zinar û beran herikî. Di gel ku bîna miskê jê difûrîya jî, dilê min xeliya û ez vereşiyam û hibr ji hinavê min derket. Min nediwêrîbû ji kesî re jî vê macerayê bibêjim. Ma wê kê ji min bawer bikira!! Ku bawer bikirana jî dê ji bo min hetîketî bûya. Min dixwest herim hinda hekîm Zuhrabê ermenî, lê ditirsiyam ku dawî kifş bibim, hema min xwe ragirt û bi wê hibra ku her çendakî ji devê min nola verîşandineke reş derdiket xursend û razî bûm.*

[249] Jan Dost, *Mîrname*, r. 61.

*Heta vê gavê jî ez ji tama hibrê ya di bin zimanê xwe de reha nebûme. Ew hibreke ku li min bûye bela. Tama wê di bin zimanê min de fenanî tama ziravê fêrîkekê ku bi ser kezebê de herikî be tehl û tirş û tev li hev bû. Hibreke efsûnger û cadûkar bû, ne min tiştekî hêja pê nivîsî û ne jî karim xwe jê bişom.*"[250]

Herwiha Mela Ferîd di beşê vegotina xwe de, bi wê yekê dest pê dike ku çawa wê roja ku Xanî miriye, baraneke reş bariyaye, lê tevî vê yekê jî kefenê Ehmedê Xanî her bi zuhayî maye û terr nedibû û dibêje: "*Barana reş ya ku bi ser kefenê Ehmedê Xanî de dibarîya, dibû kelebox û kefen her zuwa dima. Hîn nû me ew ji camîyê derxistibû min bala xwe dabûyê lê min nedigot. Wisa jî min, berî ku Teymûrê fasiq biqîre û bibêje: hey bavo hibr dibare, bala xwe dabû rengê wê baranê yê tarî. Min zanîbû ku ev ne tenê barane û di temamê jîyê xwe de min tiştekî wisa nedîtibû.* "[251]

Îcar vebêjer piştî vê mijarê vedigere rabirdû û behsa Ehmedê Xanî û rewşenbîrî û têkiliya xwe bi Xanî re dike, dûre bo bidawîanîna beşê xwe vedigere heman xala destpêkirinê ku dema mirina Xanî ye û dibêje: "*Bi zatê xwedayê mezin. Li mala min jî mûm sê caran vemirî. Xelqê digot çiraxa ber serê Xanî sê caran vemirî bû berî ku wefat bike. Li her maleke Bazîdê jî wisa bûbû. Qendîl û mûmên li camiyan jî geşkirî bûn ji bo pêrgîna remezanê ew jî sê caran vemirîbûn. Ma ku ew ne zatekî mezin bûya xwedê ev keramet didayê?*"[252]

Herwiha vebêjerekî din Mela Îsmaîlê Bayezîdî di destpêka vegotina xwe de ji me re behsa roja veşartina Xanî û wê nameyê dike ku Bengînê Dergevandaye destê wî û dibêje: "*di nava wê xirecirê de, di nava wê xemgîniya ku ji baranê bêtir bi ser dilê me de dibariya, dergevanê mîr Bengînê Mamzêdî hate nêzîkî min û nameya ku Xanî ji mîr re nivîsî bû da destê min. wî xwest ku kesek wî nebîne û bi destekî lerizî û rûyekî kerribî name dirêjî min kir û bi çavin şil pişta xwe da min.*"[253]

Êdî ew jî wek hemû vebêjerên din axaftina xwe berdewam dike û vedigere rabirdû û behsa xwe û Xanî ji me re dike, di dawiya vegotina xwe de vedigere heman xala destpêkirina

---

[250]Jan Dost,*Mîrname*, r. 70-71.
[251]Jan Dost,*Mîrname*, r. 73.
[252]Jan Dost, *Mîrname*, r. 80.
[253]Jan Dost, *Mîrname*, r. 215.

vegotinê û dibêje: "*Ku em ji definkirinê vegeriyan. Hîn em di meclisa şînê de bûn min xwest yekser nameya ku Xanî ji mîr re nivîsî bû bixwînim. Lê min ew nedît! Min kir û nekir ku bînim bîra xwe dergevanê mîr Bengînê Mamzêdî ew li ku daye min, lê bê mufa bû. Wê barana reş êdî vedabû û rojeke xemgîn dikete pişt çiyan. Min destûra cemaetê xwest û berê xwe da mal. Hespa xwe ya tewilandî ji axurê derxist û lê siwar bûm û di cih de çûme jor. Min hespa xwe mîna xortekî cengî û bengî bi zixtan dîn kir û berî ku roj di dergûşa rojava de binive gihame wir. Çavên min li çend kaxezan ketin bela wela bûbûn û ji şilbûnê giran bûbûn û bi erdê ve zeliqî bûn. hin ji wan bûbûn mîna hevîr û êdî tiştek di wan de nema bû. Li ser hin kaxezan jî şopa nigê matemîyan û simên hesp û qantiran hebû. Min ew kaxez yek bi yek û bi lez berhev kirin û dîsa li bayê bezê rişma hespa xwe dagerand û daketim jêr.*


*Wê êvarê, piştî ku ji meclisa şînê vegeriyame mal min li ber ronahiya çiraxekê ku Xanî ew diyarî min kiribû, kaxez vekirin û li ber agirdankê zuwa kirin. Dilê min hate hêran. Nameya Xanî ya ku wê baranê lêkiribû mihiyabû. Tenê her kaxezekê çend xêz jê mabûn. Hêsirên min bi ser wan xêzikên mayî de hatin xwarê. Xêzikin ku bi lez û engirîn hatibûn nivîsandin lê bi nazikîya ku bêhna tiliyên Xanî jê dihat. Li ber çavên min dibû xumam. Ji her kelimeyekê bêhna hesretên Xanî difûriya, ji her herfekê nalîneke wî dihat û di her xêzekê de kesereke wî bi hibrê û hêsrên min re diherikî.*

*Min çavên xwe yên şil bi kutkutandina çend caran re zuwa kirin û dîsa bermaya wê nameyê xwend. Dema ku gihiştim setrên dawî, mîna ku ejdehayek bi min vede ez çeng bûm û rabûme ser piyan û qêriyam:*

*- na , ne mumkine ! ne mumkineeeeeeeeeeeeee.*"[254]


Bi vê şêweyê destpêkirina vegotinê di xalekê de piştre vegera bo heman xala destpêkirinê binyata bazineyî dirust dike. Binyata bazineyî jî şêweya wêneyeke bazineyî ji vê şêweyê werdigre, Ku ev der hem xala destpêkirinê be û hem dawiya vegotinê

[254]Jan Dost,*Mîrname*, r. 221-222.




Ez dixwazim amaje bidim ku nameya Xanî bo Mîr ku dûre bi rêya Bengîn bo Mela Îsmaîlê Bayezîd tê şandin, bi rêya Bengîn gava Mela Îsmaîl wek vebêjerê dawî behsa nameyê dike û dibêje: Dema me Xanî vedişart Bengînê Dergevan nameya Xanî ji min re anî, lê nizanim çawa ji paşila min ket ser erdê, piştî ku ez vegeriyam malê min xwest derxim û bixwînim, name di paşila min de nemabû, êdî bilez çûme goristanê, li wir li ber baran û ber piyê xelkê û piyê hespan beşekî zêde ji hevok û peyvên nameyê mihabûn, di dawî de jî amaje bi hevok û peyvên mihandî yên nameyê hatiye kirin heta niha jî nehatiye zanîn ew peyv û hevokên ku mihabûn çi bûn, mihandina van peyvan û hawara Mela Îsmaîl di dawiya xwendina nameyê de, binyata wê ya bazineyî kiriye bazineyê vekirî, bi vê rêyê jî wiha li xwîner dike beşdar be di bîrkirin û dariştina nameyê careke din.

Em dikarin bi giştî binyata bûyerên romana Mîrname bişibînin gulekê wek vê wêneyê bi şêweyekê ku: bejna gulê destpêka romanê ye ku bi şêweya zincîreyî ji hêla vebêjerê hertiştzan ve tê vegotin. Ev bejn jî dibe destpêk bo vegotinê li ba hemû vebêjeran û dibe xala vegerê jî di vegotinê de. Ew pelkên gulên li dora bejnê ne vebêjer in ku heryek ji wan bi dora vê bejnê de bi şêweya bazineyî bûyeran vedibêjin, lê di nav proseya bazineyekê de binyata têkilîhev bikar aniye bi şêweyekê ku her yek ji vebêjeran dema niha radigrin û vedigerin rabirdû.


Xala Dawiya binyata zincîreyî û xala dstpêka binyata
bazineyî û xala dawiya binyata bazineyê
Binyata Bazineyî
Binyata têkilîhev di nav
proseya binyata bazineyî
Binyata zincîreyî
Xala destpêkirina destpêkê

**ENCAM**

1. Mîrname yek ji romanên serkeftî ye ku bi Kurmancî hatiye nivîsandin. Romannivîs kariye bi awayekî serkeftî piraniya binyatên nû yên romana hevçax tê de şênber bike.

2. Beşekî zêde yê bûyerên romana Mîrname dîrokî ne, lê bi saya nerîngeha taybet a nivîskar di afirandina vê romanê de, wiha kiriye ev roman ji tomarkirina karesateke dîrokî ya abstrakt derkeve.

3. Di temamiya romana Mîrname de, nivîskar wek karakterekî romanê pir kêm amade ye. Romannivîs di niha de rawestiyaye û li rabirdû dinere û dixwaze helwesta karakteran ên girêdayî bûyeran ji me re nîşan bide, mebesta nivîskar avêtina ronahiyê li ser karakteran bo bûyeran e, lewra em dibînin bêhtir ji senaryoyekê bo bûyeran hatiye afirandin, wek mînak mirina Ehmedê Xanî, bo vê jî erkê xwîner girantir kiriye, da zêdetir hûr bibe bo dîtina bûyera rasteqîn.

4. Bi awayekî giştî şêwaza vegotinê di romana Mîrname de şêwazeke xweyî ya serdest e bi ser de û vebêjer wek beşdarbûyekî nav bûyeran li gor nerîngeha xwe li bûyeran dinerin û bi rêya vebêjerê hemantiştzan bûyeran vedibêjin.

5. Di romana Mîrname de, romannivîs bêhtir dema dîrokî bikar aniye li gor dema derûnî, herçiqasî piraniya karakteran di rewşeke derûnî ya xirab de dijîn, û herwiha dema derûnî pêşketîtir e û romanên nû bêhtir guhdanê bi dema derûnî dikin.

6. Di bikaranîna demê di warê rabirdû, niha, dahatû de, romannivîs bêhtir teknîka vegerandinê bikar aniye û herçi teknîka pêşxistinê ye kêmtir bikar aniye, bêhtir ew bûyer hatine pêşxistin ku meraqa xwendinê bo xwîner dirust dike.

7. Di Mîrname de, vebêjer lezgîniya vegotinê teknîkên rakirin û kurtkirinê di warê rêjeyê de nêzîk ji hev bikar aniye, bo sistiya vegotinê jî bêhtir bi aliyê wesfê de çûye bêhtir ji dîmen.

8. Binyata bûyerê di romana Mîrname de di rêza yekem de binyateke têkilîhev e û di rêza duyem de jî binyata bazineyî ye, ev ji bilî bikaranîna binayetên wek têhelkêş, zincîreyî û hevterîb.

**JÊDER**

**Kitêbên Kurdî**


1. AMÊDÎ, Beyan Ehmed Hisên, *Nerîngeh Di Romanên Sebrî Silêvanî de*, Çapxaneya Şehab, Ç. 1, Hewlêr 2013.
2. ARISTOTLE, *Hunera Şiîrê Şiîrnasî*, Wergera ji Îngilîzî Ezîz Gerdî, Weşanxaneya Rênima, Silêmanî 2004.
3. CAF, Hesen, *Çîroka Kurdî ya Nû*, Çapxaneya Alaa, Bexda 1985.
4. ELÎ, Hisên Sabir*, Rengdana Realîzma Sihrî di Romanên Kakemem Botanî de*, Çapxaneya Lerya, Silêmanî 2012.
5. ELWENÎ, Necm*, Lêkolîna Rexneya Şîrovekarî Derbarê Romana Kurdî*, Dezgeha Çap û Belavkirinê ya Aras, Ç. 1, Hewlêr 2011.
6. ELWENÎ, Necmedîn Xalid Necmedîn*, Bînaya Demê Di Sê Nimûneyên Romanên Kurdî de Jana Gel, Şar, Raz*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî 2004.
7. HACÎ, Senger Qadir Şêx Mihemed, *Binyata Vegotinê Di Dastana (Memûzîn)a Ehmedê Xanî û Romana Bajarê Muzîkvanên Spî ya Bextiyar Elî de*, Çapxaneya Xanî, Ç.1, Dihok 2009.
8. HESEN, Hemese‘îd*, Hizr û Şêwaz Di Çîroka Kurdî de*, Çapxaneya Aras, Ç. 1, Hewlêr 2005.
9. JAN DOST*, Mîrname*, Weşanxaneya Avesta, Ç. 2, Stenbol 2011.
10. JÛF, Vansan*, Peotîka Romanê*, Wergerandina: Mihemed Rehîm Ehmedî, Çapxaneya Aras, Ç. 1, Hewlêr 2011.
11. KESNEZANÎ, Buşra, *Plot Di Çîroka Kurdî de Sala 1995-2005*, Çapxaneya Lerya, Silêmanî 2012.
12. LIOSA, Mario Vargas, *12 Name Bo Romannivîsekî Ciwan*, Wergerandin: Şîrîn. K., Çapxaneya Bînayî, 2008.
13. MENSÛR, Ehlam*, Bînaya Bunerî Di Kurteçîroka Kurdî de (1970-1980)*, Çapxaneya Tîşk, Silêmanî 1999.
14. MENTIK, Heme, *Teknîka Pirdengiyê Di Romana Kurdî ya Kurmanciya Jêrîn de (2000-2010),* Çapxaneya Lerya, Silêmanî 2013.

15. MIHEMED, Mîran Celal, *Binyata Bûyerê Di romana Kurdî de*, Çapxaneya Renc, Ç. 1, Silêmanî 2009.
16. MIHEMED, Tenya Es‘eid, *Bînaya Cih Di Du Nimûneyên Romanên Kurdî de Hêlane, Ejdeha*, Weşanxaneya Serdem, Ç. 1, Silêmanî 2011.
17. MISTEFA, Rêzan ‘Osman, *Binyata Cureyên Bûyerê Di Romana Kurdî ya Başûrê Kurdistanê de 1985-1990*, Ç. 1, Hewlêr 2010.
18. MUFTÎ, Perî Salih, *Vegotin Di Çîrokên Ehmed Mihemed Îsmaîl de*, Weşanên Akademya Kurdî, Çapxaneya Hacî Haşim, Hewlêr 2012.
19. MUKIRYANÎ, Hejar, *Ferhenga Kurdî-Farsî*, Çapxaneya Tehran, Ç. 5, 1385.
20. ROJBEYANÎ, Zahir, *Çîroka Hunera Kurdî Şêwe û Şêwaz û Bunyad*, Çapxaneya Xanî, Ç. 2, Dihok 2008.
21. SABIR, Perêz, *Bînaya Hunera Çîroka Kurdî Ji Destpêkê Heta Dawiya Cenga Duyem a Cîhanî*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî 2001.
22. SERAC, Ebdulla*, Ber Bi istana Romanan û Nerîngehên Wan*, Weşanxaneya Serdem, Ç. 1, Silêmanî 2007.
23. WEBSTER, Roger, *Vekolîna Teroiya Edebî*, W.‘Ebdilxaliq Ye‘qûbî, Çapxaneya Wezareta Perwerdê, Ç. 1, 2006.
24. XEYAT, Arî ‘Osman*, Bînaya Bûyerê Di Romana Paşayan Kuşt a Xusrew Caf û Pêş Ewey Waşeke Bifirrêt a ‘Ebdilxaliq Rikabî de*, Çapxaneya Narîn, Ç. 1, 2011.
25. XIDR, Rêzan Rehman, *Teknîka Vegotinê Di Romanên Ebdulla Serac de*, Çapxaneya Rojhelat, Ç. 1, Hewlêr 2012.
**26.** XIRWATANÎ, Mistefa Salih Mistefa, *Teknîka Nerîngehê Di Romanên Bextiyar Elî de*, Çapxaneya Şehab, Ç. 1, Hewlêr 2013.
27. YA‘QÛBÎ, ‘Ebdilxaliq, *Dengê Bilûrînî yê Metinê*, Rêveberiya Çap û Belavkirina Silêmaniyê, 2005.
28. YÛNISÎ, Îbrahîm, *Guldesteyek Ji Hunera Çîroknivîsandinê*, W. Nebez Cihangîrpur, Çapxaneya Çarçira, Ç. 1, Silêmanî 2005.

**Kitêbên Erebî**


29. *el-Qran el-Kerîm*.
30. BURNIS, Cêrald, *el-Misteleh es-Serdî Mu'cem el-Mistelehat*, Ter. 'Abid el-xiznedar, el-Meclîs el-E'la Lîlseqafe, 2003.
31. BURINUF, Rolan û EWILIYE, Riyal*, 'Alem er-Rîwaye*, Ter. et-Tekerlî, Mirace'e : Fuad et-Tekerlî û D.Muhsîn el-Musewî, Dar eş-Şiwn es-Seqafîye el-'Ame, T. 1, Bexdad 1991.
32. CINDARÎ, Îbrahîm, *el-Feza' er-Rîwayî 'Însde Cebra Îbrahîm Cebra*, Dar eş-Şiwn es-Seqafîye el-'Ame, Bexdad 2001.
33. EBIDALLE, 'Edinan Xalîd, *en-Neqd et-Tetbîqî et-Tehlîlî*, Dar eş-Şun es-Seqafiye el-'Ame, T. 1, Bexdad 1986.
34. EBU NAZIR, Mirîs, *el-Elesnîye we en-Neqid el-Edebî Fî en-Nezeriye we el-Mumarese*, Dar en-Nehar Lîlneşir, Beyrut 1979.
35. EL-'ANÎ, Şuca' Muslîm, *el-Bîna' el-Fenî Fî er-Rîwaye el-'Erebîye Fî el-'Iraq*, Dar el-Şun el-Seqafîye el-'Ame, Bexdad 1994.
36. EL-KSASBE, Ebidalle Mslîm, *Tecrebe Silêman el-Qewabî'e er-Rîwaye*, Dar el-Yazurî el-'Îlmiye, Lîneşr we et-Tewzî', et-Tabi'e : el-'Erbiye, 'Oman – el-Erden 2006 .
37. EL-MEHDÎ, 'Ebidallrezaq, *Tefsîr el-Qirtbî* Lî Ebî Ebidalle Mehemed Bin Ehmad el-Ensar el-Qirtbî, Dar el-Kîtab el-'Erbî, Beyrut – Lubinan, Cld 9, 2008.
38. EL-MERZUQÎ, Semîr û ŞAKIR, Cemîl, *Medxel Îla Nezriye el-Qîset Tehlîl we Tetbîq*, Dar eş-Şun es-Seqafiye el-'Ame , Bexdad 1986.
39. EL-QEZAT, Mehemed Ehmed, *et-Teşkîl er-Rîwayî, 'Înde Necîb Mehfuz Dîrase Fî Tecliyat el-Murus*, el-Musse el-'Erbiye Lîdrasat û en-Neşir, T. 1, Beyrut 2000.
40. ET-TELAWÎ, mehemed en-Necîb, *Wichet en-Nezer Fî Rîwayat el-Eswat el-'Erebiye*, Mîn , Menşurat Îtîhad el-Kîtab al-'Ereb, 2010.
41. FEZIL, Salh, *Asalîb es-Serdî Fî er-Rîwaye el-'Erbiye*, Dar el-Medî Lîseqafiye we en-Neşir, T.1, Dîmeşq 2003.

42. CÎNÎT, Cîrar, *Xetab el-Hîkaye – Behis Fî el-Menhec*, Ter. Mehemed Mu'tesîm û 'Ebid el-Celîl el-Ezdî û 'Omer el-Helî, el-Meclîs el-E'la Lîlseqafe, Meşru' el-Qewmî Lîlterceme, T. 2, 2000.
43. KRÎYE, Alin Rub, *El-Cin wa el-Mtaheme, lîqa'at Îcraha Me'e Şakr Nurî*, Dar eş-Şun es-Seqafiye, Bexdad 1990.
44. ÎBRAHÎM, Ebidalle, *es-Serdiye al-'Erebiye, Behis Fî el-Bunye as-Serdiye Lîlmewrus el-Hîkaya el-'Erebî*, el-Merekz es-Seqafî el-'Erebî, Dar el-Beyza, T. 1, Beyrut.
45. YUSA, Mariyu Barxas, *Rîsalet Rewayî eş-Şab*, Ter. Salh 'Elmanî, Dar el-Meda Lîseqafiye we en-Neşir, T. 1, Dîmaşq 2005.
46. LUBUK, Bîrsî'*Sin'et er-Rîwaye*, Ter : D.'Ebidllstar Cewad, Dar Mecdelawî Lîneşir, T. 2, 'Oman 2000.
47. QASM, Sîza, *Bîna' er-Rîwaye Dîrase Miqarene Fî Selasiye Necîb Mehfuz*, Dar et-Tenwîr Lîtabî'e we en-Neşir, T. 1, Beyrut – Lubinan 1985.
48. SWÎDAN, Samî, *Ebhas Fî en-Nes er-Rîwayî el-'Erebî*, T. 1, beyrut, 1986.
49. WARREN, Austin û WELLEK, Rene, *Nezeriye el-Edeb*, Ter. mhî ed-Dîn Subhî, Mirace'e: D.Hsam ed-Dîn el-Xetîb, el-Maclîs el-E'la Lîrî'aye el-Fnun we el-Edeb lî'îlm el-Îctîma'ye, Metbe'e Xalîd et-Trabîşî, Dîmeşq 1977.
50. WEHBE, Mecdî û EL-MUHENDÎS, Kamîl, *Mu'cem el-Mustelehat el-Edebiye Fî el-Luxe we el-Edeb*, Mektebe Lubnan, Beyrut 1979.
51. YEQTÎN, se'îd, *'En Tehlîl el-Xîtabe er-Rîwaye ez-Zemen – es-Serd – at-Tetbîr*, el-Merkez es-Seqafî el-'Erabî, T. 4, Beyrut- Lubinan 2005.
52. YUSIF, Emine, *Teqeniyat es-Serd Fî en-Nezeriye wa et-Tetbîq*, Dar el-Hîwar, Suriye, el-Lazqiye 1997.


**Kovar û Rojnameyên Kurdî**


53. 'ARIF, Hisên, "Şêweyên Teknîkî Di Çîrokên Salên Piştî 70 de", *Kovara Rewşenbîrî Niwê*, Hejmara 63, Îlon û Tişrîna Yekem 1970 de.
54. BEKIR, Hîmdad Hisên – SEBRÎ, Razaw Reşîd, "Têgeh û Regezên Çîrokên Zarokan Di Edebiyata Kurdî de 1991-2005", *Kovara Akademya Kurdî*, Hejmar 7, 2008.

55. CEMŞÎR, Yadgar Letîf, “Aktîviya vebêjer bi rêya binyata zemanî di romana el-Huzin el-Wesîm a Tehsîn Germiyanî de” , Koleja Zimanan, Beşê Zimanê Erebî-Zanîngeha Selahedîn, *Kovara Zanko Bo Zanistên Mirovî*, Bergê 18, Hejmar 5, 2014.
56. GERMIYANÎ, Adil, “Gelo Serdema Romanê Di Nemanê de ye?”*Kovara Karwan*, hejmar 131, 1991.
57. ÎSMA‘ÎL, Rêbîn Resûl, “Razbêjî û monolojî ya hundirîn, di romana Metamorfos de”, *Kovara Karwan*, hejmar 157, 2001.

**Kovar û Rojnameyên Erebî**

58. BUBÎŞ, ‘Îze ed-Dîn, “Fî Nezeriye es-Serd we Tehlîl al-Xetabe”, m.*el-Meuqîf el-Edebî*, dîmeşq, ‘Eded (380), 2002, www.awn_dam.org/mokifadabiy/380/mokf380-002.htm.Lênêrîn 17-1-2016.

**Têzênên Kurdî**

59. MISTEFA, Rêzan ‘Osman, *Binyata Cureyên Bûyerê Di Romana Kurdî ya Başûrê Kurdistanê de 1985-1990*, Nameya Masterê, Zanîngeha Selahedîn, 1999.
60. SE‘ÎD, Celal Enwer, *Teknîka Vegotinê Di Romana Êvara Perwaneyê ya Bextiyar Elî de,* Nameya Masterê, Koleja Perwerdê ya Ibn Ruşd, Zanîngeha Bexdayê, 2006.

**Têzênên Erebî**

61. ‘EBIDAN, Întîsar Cwîd, *el-Bunyet es-Serdiye Fî Şî‘ir Nizar Qebanî*, Rîsale Macstîr, Kliye et-Tirbiye Lîbinat, Camî‘e Bexdad, 2002.
62. EN-NI‘ÊMÎ, feysel Xazî, *el-‘Elame Fî Sealasye Erz es-Sewad Lî‘ebidllrehman Munîf*, Etruhe Dktura’, Camî‘e el-Musil, Kliye et-Terbiye, 2005.
63. EL-XEFACÎ, Ehmed Xelîl, *el-Mesteleh es-Serdî Fî en-Neqd el-Edebî el-‘Erebî el-Hedîs*, Rîsale Macistîr, Camî‘e Babil, Kliye et-Terbiye, Qism el-Luxe el-‘Erebiye, 2003.
64. FETHULLA, Şaho Se‘îd, *el-Bu‘d el-Felsefî Lîtetbîr er-Rîwayî* – Dîraset Zehratiye Fî Tecrebet Selîm Berekat, Etruhe Dktura’, Kliye el-luxat, Camî‘e es-Suleymaniye, Kanun el-Ewel 2006.

65. ÎBRAHÎM, Ebidalle, *el-Bîna' el-Fenî Fî Rîwaye el-Herb el-'Erebiye Fî el-'Iraq (1980-1985)*, Rîsale Macistîr, Kliye el-Edeb, Camî'e Bexdad 1987.

66. SABR, Mehdî Ceber, *Bîna' er-Rîwaye el-'Erebîye Fî el-Kwêt (1962-1988)*, Rîsale Macstîr, Kliye el-Adab, Camî'e el-Bera, 1989.

**Dersên Xwendina Bilind**

67. GERMIYANÎ, 'Adil, *Dersên Xwendina Bilind Di Warê Hunera Nivîsandina Çîrok û Romanê de*, qonax: Mastera Edebiyata kurdî, Sala Xwendinê 2014-2015, Bo Xwendekarên Xwendina Bilind Li Zanîngehên Germiyan, Çermo û Raperîn.

**ÖZET**

Araştırmamız, anlatım üzerine teorik bir giriş ve üç esas bölümden oluşmaktadır.

Teorik olan giriş bölümünde, anlatı terimini ve tamımlamasını aydınlatmaya çalıştık, anlatının önemi ve anlatının oluşumunu açıklamaya çalıştık, anlatının oluşumu bölümünde anlatıcı, anlatılan metin ve anlatılan kişiden bahs ettik.

Tezin birinci bölümünde, anlatı çeşitlerinden ve anlatıcının bakış açısından bahs ettik. Başlangıçta anlatı stillerini açıklamaya çalıştık ki bu stiller, konu/olay anlatma stili ve kendini anlatma stillerinden oluşmaktadır. Sonra da anlatıcı bakışaçılarını açıklamaya çalıştık ki onlar da, herşeyi bilen bakış açısı, aynı şeyi bilen bakış açısı ve az bilen bakış açılarından oluşmaktadır.

İkinci bölümde, anlatı zamanını açıkladık, daha çok bu kavramın başat yönleriyle ilgilendik ve burada anlatı zamanının çeşitlerinden bahsettik ki bunlar tarihi an, psikolojik an ve efsanevî andan oluşmaktadır. Aynı zamanda başka bir altbölümde zamanı anlatı yönüyle açıklamaya çalıştık, yani acelecilik ve rahatlık/gevşeklik, ve bunları kısaltma, kaldırma, fotograflandırma ve nitelendirme teknikleri olarak açıklayabiliriz. Bu bölümün sonunda zamanı, tekrar etme ilişkileri bakımından açıklamaya çalıştık.

Son bölümü olayın anlatımı olarak adlandırdık. Bu bölümde başlangıçta, başlangıç kavramını ve tanımını vermeye çalıştık. Daha sonra, başka bir kısımda, olayın temellerini açıklamaya çalıştık ki bunlar zincirleme olay, kompleks olay, paralel/hemaheng olay, alımlama olay ve dairesel olaydan oluşmaktadır. Bu konuda her birisine örnek olarak romandan çeşitli örnekler verdik.

Sonuç bölümünde ulaştığımız en önemli sonuçlar, birkaç noktadan gösterilmiştir.

**PUXTE**

Lêkolîna me bi awayekî sereke ji destpêkeke teorîk li ser vegotinê û sê beşên sereke pêk tê.

Di destpêka teorîk de, me ronahî avêtiye ser têgeh û pênaseya vegotinê, girîngiya vegotinê, pêkhateyên vegotinê, di pêkhateyên vegotinê de me behsa vebêjer, vegotî, jê re vegotî kiriye.

Di beşê yekem ê têzê de me behsa şêwazên vegotinê û nerîngeha vebêjer kiriye. Di destpêkê de me behsa şêwazên vegotinê kiriye ku pêk tê ji şêwaza vegotina babetî û şêwaza vegotina xweyî, piştre jî me behsa nerîngehên vebêjer kiriye ku ew jî her yek ji nerîngehênhertiştzan, hemantiştzan û kêmtiştzan digre.

Di beşê duyem de, me behsa dema vegotinê kiriye, bêhtir em bi aliyê sereke yê vê têgehê de çûne û me tê de behsa  cureyên dema vegotinê kiriye ku pêk tê ji dema dîrokî, dema derûnî, dema xurafî, herwiha me behsa demê di warê rabirdû, niha û dahatû de kiriye, bi rêya teknîkên vegerandin û pêşxistinê. Herwiha di birreke din de, me behsa demê di aliyê lezgînî û sistiyavegotinê de kiriye, bi rêya teknîkên kurtkirin, rakirin, dîmen, wesf, her di vî beşî û di dawî de me behsa demê di warê pêwendiyên dubarekirinê de kiriye

Di beşê sêyem de, bi navê vegotina bûyerê, di destpêkê de me têgeh û pênaseya bûyerê kiriye, piştre di birreke din de me behsa binyatên bûyerê kiriye ku pêk tê ji binyata zincîreyî, binyata têkilîhev, binyata hevterîb paralel, binyata têhelkêşû binyata bazineyî, ligel anîna mînakên romanê li ser her yekê ji wan.Di dawî de jî, girîngtirîn encamên ku em gihîştine wan, di çend xalan de hatine nîşandan.

**ABSTRACT**

This research project mainly consists of three main parts and a theoretical introductory about narrating.

the definition and concept of narrating , the importance of narrating , the structure of narrating have been focused on in the theoretical introductory and in the structure of narrating narrator , narrated , listener the person who the novel has been narrated to have been explained.

In the first part of this study, the forms of narrating and narrator's point of view have been elucidated , first , the narrating form has been explicated which consists of subjective narrating form and objective narrating form , then the narrator's pint of view has been focused on which includes the narrator's point of view who knows everything , the same thing , a few things .

In the second part , the narrating time has been illustrated, and it talks about the main part of the concept in which the types of narrating time have been explained that includes historical time , psychological time , legendary time , also time by the technical ways of flash back , prediction has been illustrated according topresent , past , future , in another section time has been elucidated according to fast , slow of narrating by the technical ways of reducing , cutting , sight , description , and in this part and at the end time has been explicated according to the repetition communications.

In the third part in the name of narrating event the definition and concept of event has been illustrated, after that in another section the fundamentals of event fundamental of consequence , fundamental of implication , fundamental of parallel , fundamental of circular , with giving example for each of them from the novel. In the end , the most important results have been explained.